



K.T

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zîndî li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

RENGVEDANA EDEBÊ FOLKLORÎ DI ŞÎÎRÊN MELA XELÎL MIŞEXTÎ DA

BAYAR AHMED HAJI ABOZAID

14711006

Şêwirmend

Dr.Öğr.Üyesi. Necat Keskin

Mêrdîn 2018

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Rengvedana Edebê Folklorî di Şîrên Mela Xelîl Mişextî da” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.


- ☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

....../....../.....


Öğrencinin Adı Soyadı

KABUL VE ONAY

BAYAR AHMED HAJI ABOZAID tarafından hazırlanan “Rengvedana Edebê Folklorî di Şiîrên Mela Xelîl Mişextî da” adındaki çalışma, 14 / 05 /2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kùltürü Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.



Dr. Öğr. Üyesi, Mustafa ASLAN (Başkan)



Dr. Öğr. Üyesi, Hemin ÖMAR AHMAD

Dr. Öğr. Üyesi, Necat KESKİN



DIYARÎ BO

Mamoste û rêberê rêya rastiya jiyana min, bavê min ê xweştirî. Hezar silav li giyanê wî bin,

Dayîka min a xweştirî,

Hemû xwişk û birayên min ên xweştirî,

Her kesê ku xizmeta folklora Kurdî kiriye.



PÊŞGOTIN

Mela Xelîl Mişextî yek ji wan şaîran e ku rengvedana edebe folklorî di şîrên wî da bi rêjeyeke berebelav hatiye bikarînan û hemî beşên edebe folklorî din av şîrên Mişextî hatine bercestekirin.

Ev lêkolîne li jêr navûnîşanên “Rengvedana Edebî Folklorî di Şîrên Mela Xelîl Mişextî da” hatiye nivîsîn. Lêkolîn ji destpêk, sê beşên sereke, encam û pêvekan pêk dihêt. Kurtiya lêkolînê bi zimanê kurdî, tirkî û îngilîzî hatiye dayîn. Herwesa çendîn pêvekên ku ji wêne û destnivîsên şaîrî pêkdihên jî hatine dayîn. Beşa yekem ya taybet e bi edebê folklorî û curên wê ve ku têda edebê folklorî hatiye nasandin û curên wê hatîne diyarkirin digel nasandina van curan. Di beşa duyem da ev babete hatîne behiskirin: Yek; peywendiya edebê folklorî bi edebê nivîsî ve. Du; hokarên wergirtina edebê folklorî di nav edebê nivîsî da. Sê; rengvedana edebê folklorî di edebê nivîsê yê kurdî da (teori û pratîkî). Beşa dumahîkê beşa seyem e li dûv siruştê vê lêkolînê û peywendiya jiyanî şaîrî bi şîrê ve. Bi pêdivî hatiye zanîn ku kurtasî yek li ser jiyanî şaîrî û layenên wî yê rewşenbîrî û edebî hatiye behskirin, paşan praktîzekirina karîgerî û rengvedana edebê folklorî li ser şîrên navbirî hatiye encamdan ku têda rengvedana her yek ji curên edebê folklorî li ser şîrên navbirî hatiye diyarkirin. Li dawiyê jî girîngtirîn encam û ew çavkanî yê mifa jê hatîne wergirtin hatîne rêzkin.

Ev xebat bi alîkariya gelek kesan hatiye encam dan. Liv ê derê dixwazim spasîyên xwe peşkeş wan bikim. Di serî da spasîyên dilgerm ji bo şêwirmendê min Dr. Necat KESKÎN ku rêberiya min kir ji bo nivîsîna vê teze. Spas bo Har. Prof. Dr. Muhsin Arif SALIH ji bo harîkariya wî ya berdewam. Spas ji bo hemû kesên harîkariya min kirin min a Cotyar Ismaîl, Şivan CERCÎS, Şehmuz KURT, Kenan SUBAŞI, Ebdulrehman BAMERNÎ, Dilvîn, Cemîl ŞÊLAZÎ, Rêber Husên EBO, û Barzan SALIH.

KURTE

Ev xebat li jêr navûnîşanê *Rengvedana Edebê Folklorî Di Şîrên Mela Xelîl Mişextî Da* hatiye encamdan. Edebê folklorî ew edeb e ku bi şêweyê serzarî dihête veguhaztin. Edebê folklorî ji layê civakî û peywendîyan hem jî ji layê hizir û bîr û bawerîyan ve berhemê têgehiştina mirovî ye ji bo jiyane. Herwesan edebê folklorî kariye gelek erkên girîng di jiyana civakî da bigêrît, mîna erkê îdeolojî, felsefî, ayînî, perwerdeyî, siyasî, fêrkirin, rewşenbîrî û dîrokî. Lewra wek çavkaniya her zanist û zanînekê dihête nasîn.

Edebê folklorî bi awayekî giştî binax û keresteyekê serekî û xav e ji bo edebê kurdî yê nivîsî. Heta niha jî ew karîgeriya edebê folklorî li ser edebî kurdî yê nivîskî maye, wate nivîserên kurd ji bo bihêzkirin û dewlemendikirina berhemên xwe penayê bo edebê folklorî diben.

Edebê folklorî bi şêweyekî berbelav di nav berhemên Mela Xelîl Mişextî da hene, ji ber ku Mişextî yek ji wan şaîrên kurd bûye yê ku di mawê jiyana xwe da keftiye li jêr karîgeriya bûyer û kawdanên cografyaya xwe û rewşenbîriya cografyaya gelên dîtir ên cîhanê. Ev jî bi xaleka girîng bo ezmûna şîra Mişextî dihête hejmartin. Şîra Mişextî şîreka dewlemend e ji herdu aliyên rûxsar û naverokê ve. Girîngiyeka zor bi beşên edebê folklorî di herdu biyavan da heye, bi wê çendê ku edebê folklorî kurdî bûye, hokareke kara ye ji bo pêşvebirin û azrandina berhemên Mişextî yê edebî û hunerî.

Bêjeyên Sereke: Edebîyat, Folklor, Edebê Folklorî, Mela Xelîl Mişextî, Şîr.

ÖZET

Bu tez *Mela Xelîl Mişextî'nin Şiirlerinde Halk Edebiyatının Yansıması* başlığıyla çalışılmıştır. Halk edebiyatı sözlü olarak aktarlan edebiyattır. Halk edebiyatı hem toplum ve toplumsal ilişkiler hem de düşünce ve inanışlar açısından insnalar için hayatı anlamlandırma aracıdır. Benzer şekilde halk edebiyatı toplum yaşamında ideoloji, felsefi, dini, eğitim, öğretim, siyasi, fikri ve tarihi birçok görev üstlenmiştir. Böylece bütün bilimlere kaynaklık etmiştir.

Halk edebiyatı genel itibariyle Kürt edebiyatı için başat ve ham bir temel oluşturur. Günümüzde de halk edebiyatının bu etkisi yazılı Kürt edebiyatında görülmektedir, başka bir deyişle Kürt yazarlar serlerini zenginleştirmek için halk edebiyatından yararlanmaktadır.

Halk edebiyatı Mela Xelîlê Mişextî'nin eserlerinde de geniş bir yer tutmaktadır, çünkü Mela Xelîl yaşamında yaşadığı coğrafyanın ve diğer coğrafyaların olaylarından ve çalkantılardan etkilenen Kürt şairlerdendir. Bu durum Mişextî'nin şiir tecrübesi için önemli bir dönüm noktası olarak kabul edilmektedir. Meşextî'nin şiiri hem yapı hem de içerik bakımından zengin bir şiirdir. Her iki alanda da halk edebiyatı önemli bir etkiye sahiptir; Kürt halk edebiyatı Mişextî'ni edebi ve sanatsal eserlerinin gelişiminde önemli bir yere sahiptir.

Anahtar Kelimeler: Edebiyat, Folklor, Halk Edebiyatı, Mela Xelîl Mişextî, Şiir.

ABSTRACT

This thesis is studied with name of *Folklore in Molla Khalil Mishekhti's Poetry*. Folk literature is oral literature. Folk literature is a means of meaning-making for people in terms of society and social relations as well as thoughts and beliefs. Similarly, folk literature has undertaken many tasks in ideology, philosophy, religion, education, education, politics, intellectual and history in society. So that it has been a source of all science.

Folk literature constitutes a dominant and crude basis for Kurdish literature in general. Today, this effect of folk literature is seen in written Kurdish literature, in other words, Kurdish writers make use of folk literature to enrich their works.

Folk literature also has a large place in the works of Molla Khalil Mishekhti, as Mela Khalil is a Kurdish poet influenced by the events and the turbulence of the geography inhabited in and other geographies. This is considered an important milestone for Mishekhti's poetry experience. Mishekhti's poem is rich in both structure and content. In both fields folk literature has a positive influence; Kurdish folk literature has an important place in the development of his literary and artistic works.

Key Words: Literature, Folklore, Folk Literature, Molla Khalil Mishekhti, Poetry

NAVEROK

PÊŞGOTIN	IV
KURTE	V
ÖZET	VI
ABSTRACT.....	VII
NAVEROK	VIII
KURTEBÊJE	X
DESTPÊK.....	1
1. Mijara Lêkolînê	1
2. Armanca û Girîngiya Lêkolînê	1
3. Sînora û Çarçoveya Lêkolînê	2
4. Rêbaza û Teknîkên Lêkolînê	2
5. Pirsgerêkên Lêkolînê	2
BEŞA YEKEM	3
EDEBÊ FOLKLOR (PÊNASE, TAYBETMENDÎ Û CURE).....	3
1.1. Edebê Folklorî.....	3
1.1.1. Taybetmendiya Edebê Folklorî.....	7
1.2. Beşên Edebê Folklorî	8
1.2.1. Efsane	8
1.2.2. Destan	11
1.2.3. Çîrok	14
1.2.4. Stran.....	16
1.2.5. Gotinên Mezinan.....	18
1.2.6. Biwêj.....	21
1.2.7. Metel (Metelok)	23
1.2.8. Pêkenok (Galte û Gep).....	26
BEŞA DUYEM.....	29
PEYWENDIYA EDEBÊ FOLKLORÎ BI EDEBÊ NIVÎSÎ VE.....	29
2.1. Edebê Nivîsî û Edebê Folklorî.....	29
2.2. Hokerên Wergirtina Edebê Folklorî di Nav Edebê Nivîsî da	31
2.2.1. Hokerên Hunerî û Ciwankariyê	31
2.2.2. Hokerên Cîvîkî û Siyasî	32
2.2.3. Hokerên Rewşenbîrî.....	32
2.2.4. Hokerên Derûnî.....	33
2.3. Rengvedana Edebê Folklor di Nav Edebê Nivîsî yê Kurdî da	34
2.3.1. Di Nav Şîrê da	35
2.3.1.1. Di Şîra Klasîk da.....	35

2.3.1.2.	Di Şîra Nû da	39
2.3.2.	Di Pexşana Hunerî da.....	43
2.3.2.1.	Di Çîroka Hunerî da.....	44
2.3.3.	Di Romanê da.....	47
BEŞA SÊYEM.....		52
RENGVEDANA EDEBÊ FOLKLORÎ DI ŞÎRÊN MELA XELÎL MIŞEXTÎ DA		52
3.1.	Kurteyek li dor Jiyana Mela Xelîl Mişextî.....	52
3.2.	Karîgerî û Rengvedana Edebê Folklorî di Şîrên Mişextî da	55
3.2.1.	Efsane	55
3.2.1.1.	Kesayetiye Efsaneyî	56
3.2.1.2.	Giyandarên Efsaneyî	60
3.2.1.3.	Giyanewerên Efsaneyî.....	64
3.2.1.4.	Kerestên Efsaneyî.....	67
3.2.1.5.	Jimareyên Efsaneyî.....	69
3.2.2.	Destan	73
3.2.3.	Çîroka Folklorî.....	75
3.2.4.	Stran	79
3.2.5.	Gotinên Mezinan	82
3.2.6.	Biwêj.....	88
3.2.7.	Metel	92
3.2.8.	Pêkenok.....	94
ENCAM		97
ÇAVKANÎ		99
PÊVEK.....		113

KURTEBÊJE

T.C	Türkiye Cumhuriyeti
K.T.	Komara Tirkîyeyê
h.b.	Heman berhem
h.c.	Heman bih
h.h.	Heman hevpeyvîn
Wer.	Wergêr
Ç.	Çap
j.	Jimare

DESTPÊK

Edebê folklorî bi şêweyekî giştî edebekî xwedan rûxsareke xwemalî û resen e, anku ev edeb berhemê gel e, ji encamê hebûna ezmûnan di biyavê zanîn û serborên jiyânê da bi dest keftiye. Berhemê neteweyî ye, ji ber vê çendê bi nasnameya gelan dihête hejmartin û ev gelên he bi vî edebî dihêne nasîn çunkî ev edebe ji berebabekî bo berebabekî dîtir dihête parastin û veguhaztin û ezmûna jiyana wan e. Ev jî take rêyeke ku bikarin vî edebî bi ciwantirîn şêwe rabigirin û mêjû û ziman kultûr û şaristanîyeta miletan bo miletên dîtir bidete diyarkirin.

1. Mijara Lêkolînê

Ev vekolîne li jêr navûnîşanê “Rengvedana Edebê Folklorî di Şiîrên Mela Xelîl Mişextî da” hatiye encamdan. Di vekolînê de em dê lê gerîn ka edebê folklorî di şîîrên navbirî da çawa derbas bûyîne û çi kartêkirin li şîîra wî kirine.

Mela Xelîl Mişextî yek ji wan şaîran e ku di şîîrên xwe da piştbestineka zêde li ser edebê folklorî kiriye. Piraniya beşên edebê folklorî bi awayên ciyawaz di şîîrên wî da dihêne dîtin û bi çavkaniyeka girîng zaniye, ev çende jî ji encamê wê çendê bûye, ku şaîr berdewam li dûv zanist û zanîne gerîyay. Ew girîngîya karlêkirina edebê folklorî li ser edebê nivîsî bûye palderek ku em vî babetî hibijêrîn. Herwesan şaîr mela bûye û li çendîn deverên welatê xwe û Îranê geryaye, ev çende jî bûye eger ku navbirî aşinayê edebê folklorê bi giştî bi bet û şarazayek li cem wî peyda bibe. Lewra me bi fer dît ku bi rêya vê vekolînê karîgerbûna şîîrên Mişextî bi edebê folklorî bideyne diyarkirin.

2. Armanca û Girîngiya Lêkolînê

Armanca me ji encamdana vê vekolînê ew e ku bizaveke ji bo diyarkirina karîgerî û curên edebê folklorî di şîîrên Mişextî da. Herwesan ka çend şîîrên navbirî keftîne jêr karîgeriya vî edebî. Girîngiya vekolînê ya di wê çendê da ku di navbera edebê folklorî û edebê nivîsî da kar diket. Ji layekî ve sîma û edgarên edebê folklorî didete xuyakirin û ji

layekê dî ve derkeftina wan e ji çarçovê serzarî û têkelbûna wan li gel xeyal û ezmûna şaiîrî berceste diket.

3. Sînor û Çarçoveya Lêkolînê

Ev vekolîne ya girêdayî û taybete bi edebê folklorî di şîrên Mişextî da, her çende gelek karên teorî di biyavî edebê folklorî hatîne encamdan jî, belê di vê vekolînê da zêdetir hewl hatiye dan ku karekê zanistî bi herdu şeweyên teorî û pratîkî li dor edebê folklorî di şîra Mişextî da bihête encamdan. Ji *Dîwana Mela Xelîl Berge Yekê*, *Bihara Dila*, *Mewlûdname*, destnivîsên Mişextî yê hatine parastin ku nêzikî 3-4 bergên dîwanê ne.

4. Rêbaza û Teknîkên Lêkolînê

Ev vekolîne bi şeweyekê giştî li dûv rêbaza *wesfî/ saloxdan û şîrovekarê* hatiye encamdan. Ji ber ku saloxdan û şîrovekirina edebê folklorî di nav edebê nivîsî û şîrên Mişextî da hatiye kirin. Di vê teze de devoka Behdînanê ya Kurdî hatiye emilandin da ku hevgerîyek hebe di navbera zimanê teze û naveroka wê da.

5. Pirsgirêkên Lêkolînê

Çi kar û vekolîn bê asteng nagehêne çî armanc û encaman, ji girîngitîrîn astengên vekolînê ev bû ku jimareka berçav ji şîrên Mişextî hêşta nehatîne çapkirin û mîna destnivîsan hatîne parastin, bidestxistna van destnivîsan û xwendina wan karekê zehmet bû. Çunkî herwesa ew şîrên di berhemên Mişextî da, *Dîwana Mela Xelîl Berge Yekê*, *Bihara Dila*, *Mewlûdname* yê hatine çapkirin bi şeweyekî akademîk ji destnivîsan cudakirin.

BEŞA YEKEM

EDEBÊ FOLKLOR (PÊNASE, TAYBETMENDÎ Û CURE)

1.1. Edebê Folklorî

Edebê folklorî edebekê zarekî ye, ev berhem bi rêya bîrdankê û bi şêwazê serzarî dihête veguhaztin. Li gel guherîna civakî ev berheme dihête guherîn, belê resentiya xwe ji dest nadet. Ji layê zaravî ve di edebiyata cîhanî da zaravên cuda cuda ji bo vî edebî dihêne bikaranîn. Bo nimûne di zimanê îngilîzî da zaravê “Folk Literature”¹; di zimanê erebî da “eledib elş'bî, el-edib elîşfahî, elfin elqulî, eledib xîr elimdîn, eledib elşab”²; di zimanê tirkî da “Halk Edebîyatî”³; di zimanê farsî da “firhing mirdmî, edebiyat tude, edbiyat 'amyane”⁴ dihêne bikaranîn. Di zimanê kurdî da çendîn zarav ji bo edebê folklortên bikaranîn, bo mînak li herêma Kurdistanê peyva edebê folklor dihête bikaranîn*, li cem kurdên Tirkîyeyê peyva edebê gelêrî dihête bikaranîn**, li cem kurdên Ermenistanê ji bo vê yekê zargotin dihête bikaranîn***, di vê vekolînê da peyva edebê folklor me bi kar anîye. Ji ber ku ev peyv li Herêma Başûrê Kurdistanê standart û fermî bûye.

¹ Yori Sokolof, *el-Folklor Qezayah Wetarîxeho*, Wer. Hilmî Şe'rayî we Abdulahemid Hewaz, el-Heye el-Misirî ye, el-Ame liltelif we el-neşir-Qahîre- 1971. r.65.

el-ame lil-telif wel-neşir-Qahîre- 1971, r.61.

² Ahmed Elî Mirsî, *Miqedime fî el-Folklor*, Dar el-Saqafe lilteba'e we el-neşir, Qahîre, 1975, r.97.

³ Sait Evliyaoğlu & Şerif Baykurt, *Türk Halkbilimi*, Ofset Reprodüksiyon Matbaacılık, Ankara, 1988, r. 99.

⁴ Ferîd Şerîfî, *Ferhengî Zarawekanî Felsefe û Zanîste Komelayetîyekan*, weş. Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, 2007, r.164.

* Bo pitir pêzanînan binêre: Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, ç. Çar el-cahîz, Bexda, 1970.

** Bo pitir pêzanînan binêre: Ramazan Pertev, *Edebîyata Kurdî ya Gelêrî*, Weşanên Avesta, Stenbol 2015.

*** Bo pitir pêzanînan binêre: Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda-Gotinê Mezina*, Wergêran ji tîpên latînî Bedirxan Sindî, Weşanên Enstîtûta Kelepôrî Kurdî, Dihok 2009.

Edebê folklor bo wan beşên edebî dihête gotin ewên nehatîne nivîsîn û bi şêwazê zarekî dihêne vegêran ku xwedanên wan ne diyar û aşkira ne. Di vî biyavî da derbarê edebê folklorî wesa hatiye gotin “edebekê veguhaztiyê ser zarekî yê.”⁵ Ev boçûne wê çendê didete diyarkirin ku edebê folklorî, edebekê zarekî ye û bi şêweyekî ji dest bo destê hatiye veguhaztin. Caydu derbareyê edebê folklorî dibêjît: “ew rewşenbîriya giştî ye, ya bi şêwê devokî dihête veguhaztin.”⁶ Navbirî edebê folklor bi rewşenbîriya giştî didete diyarkirin, wate ew danûstandin, kar û kiriyar, hizir û nerêtên civakî ... Ku hemî pêk ve dibine rewşenbîriya giştî û ev rewşenbîriya giştî jî dibine pênasayek ji bo lihev cudakirina kultur û rewşenbîriya gelan ya ku girêdayî folklorê ye. Herwesan amajê bi wê çendê didet ku bi şêwazê devokî dihête veguhaztin. Herwesan di ferhenga folklorî da weha pênasaya edebê folklorî hatiye kirin “têgehekê nû ye, wateya derbirînê ji hunerê veguhaztî û bi rêya peyvê dihête encamdan.”⁷ Di heman ferhengê da dirêjîyê didete pênasaya edebê folklorî, wesan diyar diket ku “ew edeb wê derbirînê ji wijdana komî di jîngeh û qonaxeka mêjûya diyarkirîda diket.”⁸ Di pênasayeka dîtir da edebê folklorê weha hatiye pênasakirin “hunerî wîtinî rasterastî ye, em hunere (resen û konewe) û piştawpişt û dema û dem hatûwe û erwa û bende be nerît û xwoyî komelayetî ew komelgeyewe.”⁹ Wate ev pênasê dakokiyê li ser nerîtekî komelî di nav civakekê diyarkirî da dike. Herwesan di pênasê dîtir da edebê folklor “awêneyekî pîrşingdarî rabirdû û êstay mîlete, ke tiyayda pend û goranî û qisey nesteq û destan û efsanew serbirdey qehremanêti û azayeti û siwarçakî û mîwanperwerî be aşkira le têkstî ciwan da berceste bûwe.”¹⁰ Ev pênasê dakokiyê li ser nerîtekî komelayetî dike. Ji van pênasayan dîyar dibît ku edebê folklor, edebê jiyane ye, digel dest pêka wê peyda bûye, ta ku nihe jî karîgeriya wê ya berdewam e, bi zimanekê giştî yê yek gel hatiye danan, hemî texên civakî xwendewar, nexwendewar, rewşenebîr hwd. bi asayî têdigejin.

Sebareet polînkirin û dabeşkirina beşên edebê folklorî gelek boçûn û nêrînên hemecure û ciyawaz hene. Ev çende jî bo wan vekolînan vedigere yên li ser vî beşê edebiyatê hatîne encamdan. Her pisporekî folklor li dûv hizir û rewşenbîriya xwe dabeş kiriye, anku rêkeftineka diyar li ser polînkirin nîne, belê digel vê çendê em dê hewil

⁵ Eyke Holtikranis, *Qamos Mistelihat el-Esnolocîya we Folklor*, Wer. Muhemed el-Cewherî we Hesên el-Samî, Dar el-Me’arif Bimîsir, 1972, r.284.

⁶ Eyke Holtikranis, *h.b.* r. 283.

⁷ Abdulhemid Yunis, *Mu’cem el-Folklor me Serd încilîzî-erebî*, el- Heye el-misiriye el-ame lil-kîtab, Qahîre, 2009, r.49.

⁸ Abdulhemid Yunis, *h.c.*

⁹ Kameran Mukirî, *Edebî Folklorî Kurdî*, Beşî Yekem, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 1984, r.21.

¹⁰ Idrîs Ebdullah, *Edebî Mîlîy û Folklorîy*, Berg Yekem, Weşanên Akadîmyay Kurdî, Hewlêr, 2014, r. 36.

bidin ku amajê bi hindek boçûnan di vî biyavî da bidin. Bo nimûne nivîsera ereb ya bi nav û deng Nebîle Îbrahîm di biyavê folklorî da di pirtûka xwe da ya binavê “*Aşkal altabîr fî aladeb alşa'bi*” beşên edebê folklorî bi vî şêweyî dabeş kirîne: efsane, hîkayet, metel, pêkenok.¹¹ Di vê pirtûkê da beşên edebê folklorî hemî nehatîne behiskirin, em dizanin ku beşên edebê folklorî pitir in ji van beşên nivîsera navbirî diyar kirîn. Di edebiyata kurdî da çendîn dabeşkirinên ji bo vî edebî hatîne kirin; nivîserê kurd Îzedîn Mistefa Resul edebê folklorî bi vî şêweyî dabeş dike: “efsane, îposiya, ke hendê cureyî le kurdî da pêy dewtirê (beyt), emîş ebê be dû beşewe, beytî qehremanî gêranewe û beytî beserhatî dildarî û evîn gêranewe, wek çîrok, wate (hîkayet), ke le hendê la (neqil û metelok) îşî pê elên, we honrawî. Lîrîk, ke hemû beşekanî goranî egirêtewe, wek lay layey mindal û lawanneweş egirêtewe. Herwek edebî folklorî kurdî gencîneyekî dewlemendî pendî pêşyan û qisey nesteq û galte gep û metelîşî heye.”¹² Herwesan nivîser Kamran Mukirî di pirtûka xwe ya bi navê *Edebî Folklorî Kurdî* da bi vî şêweyî dabeş kirîne:

1. Efsane.
2. Destan ke birêtî ye le:
 - a. Qehremanêtî.
 - b. Dildarî
3. Serguzeşte (çîrok) ke birêtî ye le:
 - a. Çîrokî pir û pûç
 - b. Çîrokî asayî (komelayetî, dildarî, aynî hwd.)
4. Goranî
5. Pendî pêşyan û qisey nesteq
6. Galte û gep
7. Metel¹³

Di pirtûka *Folklorî Kurdî ji Destpêkê Heta Niha* da ku ji layê komeka mamosteyan li zankoya Mardîn Artuklu Beşê Ziman û Çanda Kurdî hatiye berhevkirin, beşên edebê folklorî bi vî şêweyî hatine dabeşkirîn:

1. Destan
2. Menqîbeyên dînî û tesewûfî

¹¹ Nebîle Îbrahîm, *Aşkal el-te'bir fî el-edeb el-şe'bi*, Dar-nehze, ç.2., Qahîre, 1974, r.4.

¹² Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkoînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Dar El-cahiz, Bexda, 1970. r.11.

¹³ Kameran Mukirî, *Edebî Folklorîyê Kurdî*, Beşî Yekem, r.38.

3. Dengbêjî
4. Çîrokên gelêrî
5. Çîrçîrok / xeberoşk
6. Pêkenokên gelêrî
7. Gotinên pêşîyan û biwêj
8. Kilam û stranên gelêrî
9. Qewlerk/dûrik
10. Mamik/ tiştanok
11. Zûgotinok/ çîvanok
12. Lawik, zêmar
13. Lorîk
14. Stranên zarokan
15. Keresteyên ziman (argu, zimanê qetenîyan an zimanê girde gewran)
16. Nîfir, niyaz, dia hwd.
17. Lîstikên temaşeyî yên gelêrî
18. Lîstikên şahî û werzişê
19. Şanoya gelêrî
20. Lîstikên zarokan¹⁴

Di vê pirtûkê da yarî û lîstikên werzişî û zarokan mîna beşek ji edebê folklorî hatîne nasandin, ku ev beşekê folklorî ne, ne tenê beşên edebê folklorî, herwesan beşên stranê jî mîna beşên serbixwe yên edebê folklorî dayîne diyarkirin.

Piştî me boçûnên çendîn nivîser û rixnegiran li ser dabeşkirina edebê folklorî wergirtin, derencamê wan boçûnan em dikarin beşên edebê folklorî dabeşî van beşên li xwarê bikin:

1. Efsane
2. Destan
3. Çîrok
4. Stran
5. Gotinên mezinan
6. Biwêj
7. Metelok

¹⁴ Kadri Yildirim û Hindekên Dî, *Ji Destipêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanên Zanîngeha Mardin Artuklu, Istanbul, 2013, r.143-144.

8. Pêkenok (galte û gep)

1.1.1. Taybetmendiyên Edebê Folklorî

Her cureyekî edebî sîma û saloxetên xwe hene, ev sîma û saloxet van cureyên edebî ji cureyên di cuda dike. Di vî warî da edebê folklorê çend saloxet û sîmayên xwe hene, ew bi van sîma û saloxetan ji edebê nivîsî dihêne cudakirin:

1. Edebê folklor binyat û binaxe ye bo edebê nivîsî, herweku Gorkî dibêjît “bingehê torî ji torê folklorî ye. Folklor keresatê xavê mezin e, serûkanî ye ji bo hemî nivîsevan û torevanan.”¹⁵ Bi vê çendê weha xuya dibe ku edebê folklorî kevintirîn cureyê edebî ye.
2. Xwedanê edebê folklorî diyar nîne, lewra bi milkê hemî xelkî dihête hejmartin, belê “eve wê çendê nagehînît ku xwedan nîne, belku li despêkê ji layê kesekî hatiye gotin û paşan ji encamê nenivîsînê û belav bûnê li ser zarê çendîn mirovan hatiye gotin û veguhaztin, xwedanê wê berzebûye.”¹⁶ Heta ku zêdetir sîmayekê komî pê ve diyar bûyî.
3. Zimanê edebê folklor zimanekê ron û sade ye, hemî çînen xelkî têdigihin “be şêwey zar û binzarewe berhem dêt û edebî zarekî be hîç şêweyek zimani yekgirtûy niye.”¹⁷
4. Şêwazê derbirîna edebê folklorî hemûy her yek şêwaz nîye, belku şêwazêke hemû hunerekanî belaxet û derbirînî karîgerî tê dekwê. Mîna şêwazê asayî, xwaze, lêkçiwandin, xwestin, kinaye, rasterast, nerasterast, hewal, pirsîyar, şêwazê xweyî.¹⁸
5. Di nav edebê folklorî da hemî regezên edebî hene, mîna bîroke, soz, xeyal, wêne, wişe û derbirîn, derbirîn.¹⁹
6. Edebê folklorî di nav her civakekî da dikare çendîn erkên here girîng bi cih bînin, mîna erkê “siyasî, perwerdeyî, zanyarî û mêjûyî, ciwankarî, xweşî û çêj wergirtin.”²⁰

¹⁵ Sadiq Bihadîn Amêdî, *Ji Folklorê Kurdî*, Wezaretê Perwerdê, Hewlêr 2002. r.5.

¹⁶ Ebdulmîr Ce'fer, *el-Exiniye el-Folkloriye fi el-Îraq Nisus*, el-Ebaricî, Bexda 1975, r.15.

¹⁷ Şehle Kerîm Husên, *Karîgerî Edebî Folklor le Şîrekanî Medihet Bêxew da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankuy Selaheddîn, Koleja Ziman, Hewlêr 2015. r.7.

¹⁸ Idrîs Ebdullah, *Edebî Mîlîy û Folklorîy*, Berg Yekem. Weşanên Akadîmyay Kurdî, Hewlêr 2014. rr.37-42.

¹⁹ Idrîs Ebdullah, *h.b.* rr.49-56.

²⁰ Ahmed Qenşube, *el-Şair el-Fiz Qirat fi Şîr el-cezayîrî*, Dar el-ferabî, Beyrut 2008. r.56.

7. Edebê folklorê hilgirê hizr û bîrên mezin e, wate “le astî bîrî da zorêkî têkstekanî edebî folklor xawen bîrî berzin û girîngitirin le zorêkî berhemekanî edebiyatî modêrin e.”²¹
8. Babetên wê cur bi cur in, piraniya babetên wê perwerde, rewîştî, fêrkirin, exlaqî, dadwerî, ezmûn û serborî ne.
9. Edebê folklorî rengvedana jiyana civakê ye, lewra “folklor cur û babete jiyaneke dernabirê ke gelege xwey ney diwe û beserî ne hatûwe û bew qonaxeda tê ne perîwe.”²²
10. Edebî folklorî zû di nav xelkî da belav dibe û dihête wergirtin, sinorekî berifreh di nav xelkî da vedigirî, gelek caran ji sinorê neteweyekê derbas dibe bo sinorê neteweyên di, herweku hebûna çîrok û efsaneyên hevbeş di navbera gelan da belge ye li ser vê gotinê. Mîna efsana Newrozê û destana Leyla û Mecnûn, Şêxê Sen'aniyan hwd.
11. Vegêran di beşên edebê folklorî da ji serdemekî bo serdemekî, ji kesekî bo kesekî di dihête guherîn. Bo nimûne ew kesê têkstekê folklorî vedigêrî dişê kurtkirin yan zêdekirinê di vegêrana têkstî da biket, ji ber ku têkstekê nivîsî nîne. Lewra vegêrana têkstê folklorî ji kesekî bo kesekê di bi hokarê cudahiya derbirîna kesî ya cuda ye.

1.2. Beşên Edebê Folklorî

Edebê folklor ji çendîn beşan pêk dihê. Nivîser û rexengiran derbarê van beşan çendîn nêrînên x we hene. Her yek ji van beşên edebe folklorî xwedan çendîn taybetmendiyên e. Em dê bi kurtî li ser her yek ji van beşan rawestin.

1.2.1. Efsane

Efsane karekê hizrî yê mirovî ye, beramber diyardeyên siruştî, anku mirov “le yekem rojî dirustibûnewey penay bo efsane birdûwe.”²³ Têgehiştina destpêkî ya mirovî û li dûv wan pêzanînên heyîn bo xweparastin ji hereşeyên siruştî beramberî jiyaneke dihatin, bûne egerê peydabûna efsaneyê, lewra “pitirîya vekoleran wê boçûnê pesend

²¹ Idrîs Ebdullah, *Edebî Mîlîy û Folklorîy*, Berg Yekem. r.45.

²² Xalid Dilêr, *Hendê Wutar û Çawpêkewtinî Wêjeyî*, Bergî Yekem, El-huadaz, Bexda 1985. r.30.

²³ Idrîs Ebdullah, *Edebî Mîlîy û Folklorîy*, Berg Sêyem. Weşanên Akadîmyay Kurdî, Hewlêr 2014. r.59.

diken ku efsaneyê ji bo faktorên siruştî vedigerênît. Çunkî mirov li wî demî mabû mendeşiş beramber van diyardeyan û taradekê mezin kartêkirin li ser jiyana wî hebû. Car bi başî û car bi xirabî, ev çende di nav pitirya gelên kevin da dihête dîtin û mirovî viyaye di rastiya wan diyardan bigehît, ew ên kartêkirin li ser wî dikir û serederî li gel van diyardan, wekî leşekê giyandar, anku xwedawend kiriye.”²⁴ Wate hokarê serhildana efsaneyê vedigere bo “tirs, nezanîn û pêwîstî her sêkyan pêkewe hoyek bûn bo bîrkirdinewew bekarhênanî hizir û geran be ceste û be fikir, emeş bo xwey seretay hizir û zanistêk bû ke detwanîn nawî binêyn zansitî efsaneyî.”²⁵

Bêguman “le nêw hemû mîletanî dinya efsane bûnî heye.”²⁶ Her gelekî li goreyî zimanê xwe, zaravek ji bo efsaneyê danaye, di zimanê îngilîzî da *legend* bi wateya efsaneyê û *myth* ji bo efsana xwedawendan tê bikaranîn.²⁷ Bi zimanê erebî *al-usture*²⁸, bi zimanê farsî *afsanê*²⁹ ji heman têgehê tê bikaranîn.

Berifirehiya babetên efsaneyî bû egerê hindê ku ji gelek layenan ve vekolîn li ser bihêne kirin û çendîn nêrînên ciyawaz li ser efsaneyê peyda bibin, wate “efsane ketwarekê rewşenbîriyê aloze, mirov dikarît babetên wê bi nêrînên curbicur werbigirît û şirove biket.”³⁰ Nivîserê kurd Eladîn Secadî derbarê efsaneyê dibîjît: “guya ademîzadî zor kon neytiwanîwe le heqîqetî şitîkî weku û roj ya hêzêkî tirî tebîî biga, le tirsana persitûyetî û hênawye be çîrok û efsane razandûyetewe.”³¹ Çunkî efsane “hewlî mirov bo ewey le gerdûn û diyardekanî bikat, ya xud birîtî ye le lêgdanewey mirov derbarey ew diyardane bêguman berhemêke zadey xeyal, legel ewejda le çemkekî diyarkirawe û felsefeyekî seretayî yewe peydabûwe, wate ew felsefeyeke lewe û zansit û felsefe geşey kirduwe û gurawe.”³² Wate efsane ew hewildanên destpêkê yên mirovîn e li beramber diyardeyên gerdûnî bi felsefeyeka seretayî ku ji bo zansitên gerdûnî geşe kir û çendîn guherîn bi xwe ve girtin. Di pênaseyeka dîtir da efsane bi vî şêweyî hatiye diyarkirin ku

²⁴ Şivan Cîrcîs Ebdilrehman. *Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanên Devera Behdînan da (Vekolîneka Wesfî-Şîrovekarî)*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Koleja Adabê, Dihok 2012. r.16.

²⁵ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Pêkhatay Efsaneyê Kurdî*, Renc, Silêmanî 2007. r.171.

²⁶ Pîrdawid Mexmûrî, “Ferhengî Efsane Cihanîyekan”, *Asoy Folklor*, j.48, Hewlêr 2010. r.24.

²⁷ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Geran be Dwayî Nemirîyê da*, Araz, Hewlêr 2002. r.16.

²⁸ Tofîq Kerîm, *Karîgerîyê Îslam le ser Keltûrî Kurd (efsane)*, bergî dûyem, Rojhelat, Hewlêr 2015. r.15.

²⁹ Rêbîn Xelîl Qadîr, “Remzî Efsaneyî le Şîrekanî Hêmin da”, *Raman*, j.159, Hewlêr 2010. r.88.

³⁰ Xalid el-Xerîbî, *fi Qezaya el-Nes we el-Şîrî el-Erebî el-Hedis Miqaribat Nezerîye we Tehlîlîye- Edînos*, el-Beyatî, Hicazî, el-Siyab, Abdusebur, Qirtac Lilneşîr we El-wesî, Sîfaqîz, 2007. r.204.

³¹ Eladîn Seccadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weşanên Kurdistan, Sine 1391. r.121.

³² Kameran Mukirî, *Edebî Folklorîyê Kurdî*, Beşî Yekem. r.39.

“çîrokeye ke danerekey diyariniye û le nêw komelanî xelk da degêrdîrêwewe.”³³ Wate efsane bi çîrokeka xwedan nediyar di nav komelgehê da belav bûye. Efsane bê binema û ramanan nîne, belku mîna “qepîlkêke mirovî seretayî têrwanîni xwey bo gerdûn rijandote nawî û ravey bûnî pêkirdûwe û le rêgey ewewe peywendî be siruştewe kirduwe.”³⁴ Efsane li dev gelên kevin “rastiyeke pîroz bû, li vêrê têgehekê mêjûyî bûye, her ji bervê çendê bi yek ji jêdêrên mêjûyî dihête li qelemdan.”³⁵ Herwesan bi jêdereke here baş ji bo xwendina civak û gelan sebarêt dîtin û şîrovekirina wan li dor gerdûnî û civakê mirovayetiye bi giştî.³⁶

Bi şêweyekê giştî efsane hilgira çendîn taybetmendiyan e û hindek ji wan girîngtirîn taybetmendiyan li xwarê ne:

1. Efsane ji rûyê şewazî ve “cureyêke le curekanî edeb, herwek çîrok, regezekanî plot û girê milimilanêy kesekanî têdaye.”³⁷ Anku “heqayet, çîrok û rîwayete.”³⁸
2. Cih di nav efsaneyê da yek ji regezên here girîng e; “şiwênêkî asayî nîye, belku Dorgey Waqwaq, yan Binî Dinya yan her şiwênêkî tire, ke eqlî mirov natiwanêt peyan pê bibat, qebulyan bikat.”³⁹ Wate ew ji mentîqa mirovî dûr in.
3. Rûdan di nav efsane da ta radeyekî ciyawaz e ji rûdanên siruştî, wate rûdan ya “asayî nîne, belku sîmayekî efsunawî werdigirêt û bexêrayî berewpêş deçêt.”⁴⁰
4. Dem di efsaneyê da demekê asayî nîne, anku “katekîy rasteqîne nîye, ew şew û roje asayye nîye ke mirov deyanzanêt, belku deşet katjimêrêk be qed sed sal, yan ziyatir le nêw efsane da dirêjbêt.”⁴¹
5. Babetên efsaneyê pêkdihên ji “milimilanêy xwakane, xway tarîkî û rûnakî. Çake û xirape, ciwanî û naşîrînî.”⁴² Anku bi giştî hevîrê ye di navbera xêr û şerîda.
6. Kesayetî û saxletên wan di efsaneyê da, xwedan hêzeka mezin in, di zorbeya caran da nimûneyne, bilindtir in ji ketwarî û hindek caran jî bilindtirin ji tiştê mentîqî. Bi gelek sîmayên curbicur dihêne dîtin, hindek ji wan hilgîrên saxletên

³³ Şîrîn Hemedemîn Hesên, “Çawpêdaxşanêk be Efsane û Destanî Kurdî, Beşî Sêyem” Asoy Folklor, j.28. Hewlêr 2007. r.33.

³⁴ Necim Elwenî, *Efsane û Pendî Komî dî Galtey Amêzî Kurdî*, Dara, Hewlêr 2007. r.33.

³⁵ Fezîle Ebdulrehim Huseyin, *Fikire el- Usture we Kitab el-Tarix*, Dar Yazurî, Uman, 2001. r.30.

³⁶ Muhemed E'cîne, *Mewsu'e Esatir el-Ereb en el-Cahiliye*, Dar fîrabî, Beyrut 2005. r.13.

³⁷ Lihon Qadir Ebdulrehman, *Dualîzimî Dijiyek le Honrawe Lîrikîyekanî Mewlanay Romî û Mewlewî Tawegozî da*, Weşanên Nawendî û Roşenbîrî û Hunerîy Endêşe, Tehran 2014. r.110.

³⁸ Bîrnard Klavîl, *Efsanekanî Deriya (I)*, Wer: Behîzad Hewêzî, Roşnibîrî, Hewlêr 2013. r.32.

³⁹ Idrîs Ebdullah, *Edebî Milîy û Folklorîy*, Berg Sêyem. r.58.

⁴⁰ Selam Nawxoş û hindekên dî. *Kurdolojî*, ç.14. Hêvî, Hewlêr 2015. r.133.

⁴¹ Idrîs Ebdullah, h.c.

⁴² Lihon Qadir Ebdulrehman, h.c.

başiyê ne û hindekên dîtir yê xirabîyê ne.⁴³ Belê “palewanekanîş merc nîye xwedawen dibin hindê car kesanî asayî bûyne.”⁴⁴ Belê xwedan hêzeka radebeder in.

7. Di efsaneyê da hindek jimare hene ku bi jimareyên efsaneyî dihêne danan, ji wan jî: “1, 2, 3, 7, 9, 12, 14, 40” pitir tene dîtin.⁴⁵
8. Amûr û keresteyên efsaneyê, çendîn amûr û keresteyên curbicur û ciyawaz hene, hindek ji wan keresteyan asayî ne û hindekên dî seyr in û mêşkê mirovî bawerî pê nîne. Hindek ji wan keresteyên efsaneyê ne mîna *engustîle, klawî sexrecin, bermalî firîn, ava heyatê, 'ebayê sihri, murka xewê, camî cem* hwd. Ev kereste û amûre xwedan hêzêkî mezin in.⁴⁶

1.2.2. Destan

Destan yek ji beşên herî girîng e di edebê folklorî da. Eger temaşeyî şaristaniyên kevin bikin, dê bînin ku di nav hindek ji van şaristaniyan da ev cure edebe hebûye. Bo nimûne “kevintirîn şaristanî li dinyayê şaristaniya Sûmeriyan e, wan destanek bi navê *Gilgamêş* hebûye. Herwesan di şaristaniya Hindiyan da du destanên bi nav û deng hene; *Mihabarata* û *Ramayan*, di şaristaniya Grekîyan da *Îlyada* û *Oddise* hene û li dev Romaniyan *Enyade*, herwesan Farisan *Şahname* hebûne.”⁴⁷ Wate ev destan bi destanên folklorî dihêne nasîn. Di nav edebê folklorî ya kurdî da ev cure destan hene; mîna destana *Memê Alan* û *Kela Dim Dim* hwd. Renge destpêka edebê cîhanî ji destanê destpêkiribe, çunkî hindek boçûn wesan didene xuya kirin ku “destan ke beseretay edebî cîhanî dejmêrrêt, ke paşan bû be binaxey peresendinî çîrok û roman, çunkî hemû edigarekanî çîrokî têdaye.”⁴⁸

Destan rengvedana wan yadigariyan e yê di nav xelkî da peyda bûn û paşmayê wan berhemên serzarî ye ku di jiyan, milmilanê û peywendiyên civakî da hene. Wê qehremanî û dildariya di wî serdemî da heyî aşkira dike ku bi zimanekê sade ji berebabekî boyekê dî hatiye veguhaztin û li ser binemayê vegêranê hatiye avakirin. Destana folklorî girêdayî arîşeyên giştî yê mirovayetî ye di nav jiyana gel û neteweyan

⁴³ Karim Mehmed Ezîz, *Esatîr el-Tewrat el-Kubra we Tiras el-Şerîq el-Edina el-Qedîm*, Dar el-Hesad lil-neşir we el-Tewzî, Surîya, 1999. r.22.

⁴⁴ Pîrdawid Mexmûrî, “Ferhengî Efsane Cîhanîyekan”, Asoy Folklor, j.48, Hewlêr 2010. r.73.

⁴⁵ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexşkênî*, Weşanên Dezgay Serdem, Silêmanî 2000. r. 310.

⁴⁶ Mewlud Îbrahîm Hesên, *h.b.* rr.56-83.

⁴⁷ Telal Herib, *Ewlewiye el-Nas Nezarat fî el-Neqit we el-Qisse we el-Ustore wel-Edeb el-Şebî*, el-Mûessese el-Camî'îye lil-neşir we el-Tewzî, Beyrut 1999.r. 167.

⁴⁸ Newzed Ehmed Usman, *Regezekanî Çîrok le Destanî Mem û Zînî Xanî da*, Nameya Doktorayê ya Çapnekirî, Zankoya Bexda, Koleja Perwerdeyê (Îbin El-rişd), 1999. r.9.

da “wek awênêy xasîyetekanî gel waye û guzarşit lew palwanêtîy û dildarîyane dekat ke lehenawî mêjûy gelêkewe helqûlawe. Le ber eme, ke geşesendinî mêjûy destanekanîş be geşesendinî mêjûy geleme bestirawe.”⁴⁹ Di texên civakî da destan cureyekê edebê folklorî ye herweku di vê pênaseyê da hatiye gotin; “cureyekê edebî ye û çîrokeka qehremanî ye ku bi şîrî dihête vegêran, ji kiriyarên entîke pêkhatiye, pitirîya caran behsê rûdanên seyr û mezin dike.”⁵⁰ Herwesan derbareyê pênasekirina destanê Îzedîn Mistefa Resul dibêjît: “berhemêkî çîrokamêz e, le formî wêne da, barî jiyan û bûnî gel û pêwendîy komelayetî û nexşey berewpêş çûnî mêjûyî derexa.”⁵¹ Di pênaseyeka dîtir da û bi boçûnêka dî bi vî rengî hatiye pênasekirin; “destan heqayetêkî yan çîrokêkî şîrî xeyalî le asabedere yan karêkî palwanî mezin û karîgerîyekî zorî beser jiyanî mîletewe heye.”⁵² Nivîserê kurd Samî Hêzil di pirtûka xwe bi navê Wêje - Lêkolîn da ji bo çêbûna destanan sê qonaxan destnîşan dike; “destpêkê bûyer diqewime û hin leheng di vê bûyerêde cih digirin. Piştî bûyer di nav gel de bi şêweyên cuda û bi naverokeke dewlemend û bi hûrgilî tê vegotin û belav dibe. Di qonaxa dawî da jî ew vegotin ji hêla berhevkarên ve tê qeydkirin û derbasî ser kaxezê dibe.”⁵³ Piştî van boçûnên çendîn nivîser û rexnegiran derbareyê destanê da, em dikarin ji bo destanê wesa bêjin: Destan berhemê çîrokeka mezine û qehremanî rolekî serekî û girîng digêrît, rûdanên wê seyr û entîkene, ser binemayê vegêranê bi şîrî û pexşan ji layê kesên şarezave hatiye vegêran, têda rewşa jiyan, hebûn û peywendiyên civakî û mîlmilana çînayetî û berev pêşveçûna mêjûyî berçav dike.

Destan mîna beşekî edebê folklorî ji layê dabeşkirinê ve bûye cihê girîngpêdana nivîser û pisporan, ji ber vê yekê çendîn dabeşkirinên curbicur bo hatîne kirin, yek ji wan dabeşkirinên berbelav, dabeşkirina destanê ji layê dirustbûnê ve ye, her weku Şukriye Resul kirîne du cur; Yekem destanî tebîî (xwekird): ew destanên di nav civakî da serhildayîn, ew bi xwe hebûne û kesê ew dirust nekirîne, belku şairan di qalibekê şîrî da darşitîne, mîna destana *Ilyade* û *Odessaya Homerosî* û *Şahnameya Fîrdewsî*. Duyem: Destanî destkird, ew destan ji layê şairan ve hatîne afirandin, xeyaleka mezin didene pal, mîna destana *Enyadeya Fircîlî*.⁵⁴ Ji wan dabeşkirinên dî yên hatînekirin bo

⁴⁹ Karwan Usman Xeyat, *Destanî Gurg û Rêwî*, Weşanên Berêwberayeti Çap û Belawkirdinewey Slêmanî, Silêmanî 2013. r.7.

⁵⁰ Muhemed Xenîmî Hîlal, *el-Edeb el-Miqarin*, (bê cih), (bê çapxane), 1972. r. 124.

⁵¹ Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, r. 24.

⁵² Hîmdad Husên, *Derwazeyek bo Rexney Edebîy Kurdî*, Weşanên Dezgay Wêjînewe û Belawkirdinewey Mukirîyanî, Dihok 2007. rr.37-38.

⁵³ Samî Hêzil, *Kurte Wêjeya Kurdî*, Weşanên Sîtav, Van, 2015. r.15.

⁵⁴ Şukriye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, Weşanên Zankoya Selahdîn, Hewlêr 1989. r.90.

destanê, dabeşkirina destanê ji layê babetê yan naverokê ve ye, ew jî du boçûnên nêzîkî yekin. Di boçûnekê da kiriye du cur (destanî qehremanî û destanî dildarî û evîndarî)*. Di boçûneka dîtîr da destan ji layê naverokê ve kiriye sê cur, “destanî qehremanêtî, destanî ayînî û sofîgerî, destanî evînî û dildarî.”⁵⁵ Wate curek li ser hatiye zêdekirin.

Ji girîngitirîn saloxetên destanê ewe “çîroke ji bo qonaxa zarokîniya gelan vedigerît, di vî berhemî da mêjû, efsane, xeyal, têkelî hev dibin.”⁵⁶ Herwesan ji sîmayeke dîtîr a destanê “çîroke şîreka dirêje.”⁵⁷ Anku şeweyeke şîrî ya dirêj heye, lewra ji layê vehandinê ve “pêwîste kêşêkî zor dirêj û qurs nebê û şaîr bitwanê be asanî sewday le gelda bikat.”⁵⁸ Her çende bara pitir ya destanan bi şewazê şîrî dihêne vegêran, ev wê çendê nagehînît ku bi tinê bi şewazê şîrî dihêne vegêran, belku “dibe destan pexşan weku jiyannameya 'Enterî.’”⁵⁹ Çunkî destan berhemeke civakî ya giştî ye, wate “ew hizra taybet ya afrînerê takekes nîne, çunkî ew derbirîne ji hizra gelemperî (giştî) re.”⁶⁰ Zimanê destanê zimanekê sade û asan û nawçe ye û nêzîkî zimanê axiftina rojane dibe û dûr dikevît ji aloziyan da ku pitirîya xelkî têbigihin, li “peyrewkirdinî hunerekanî rewanbêjî nabêt bibête hokarî ewey zimanî destan zimanêkî qurs bêt.”⁶¹ Demê destanê demekê destînîşankirî nîne, ya “berniyas e ku zor xwe bi demî ve girê nadet daku zor bminî û nehête taybetkirin bi serdemekê bi tinê ve, herwesan rehaya demî di destanê da wekiriye ku destanê hevpîşk di nav mletan da peyda bibin.”⁶² Ew demê di destanê da dihête bikaranîn “hemîşe rabirdûwe.”⁶³ Rûdan di destanê da rol û girîngiyeka mezin heye, çunkî binyatê destanê li ser rûdanê mezin dihête avakirin, wate “behra pitir yek rûdana serekî dihête berçavkirin, û yên di hemî rûdanê lawekî ne, çunkî vegêrana pitir ji rûdaneka serekî hebe, anku vegêrana pitir ji demekê bo destanê.”⁶⁴ Qehremanê destanê rolekî serekî di encamdan û pêşvebirina rûdanê da digêrît “palwanî destanîş

* Bo pitir pêzanîn binêre: Şukirîye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, r.90. Îbrahîm Ehmed Simo, *Karîgerîy Kelepûrî Kurdî le Şanoy Kurdî da*, Weşanên Dezgay Çap û Belawkirdinewey Mukiryanî, Dihok 2001. r.36.

⁵⁵ Keyfî Ehmed Ebdulqadir, *Binyatî Hunerîy Destan le Edebî Folklorî Kurdî da*, Nameya Doktorayê ya çapenekirî, Zankoy Koye, Kolejî Ziman, Koye 2016. rr.109-122.

⁵⁶ Nur el-Huda Loşin, *Wefqeho me' el-Edeb*, el-Milhemî, Mekteb el-Camiyî el-Hedîse, Camie' el-Şariqe 2011, r. 17.

⁵⁷ Elî el-Cizîrî, *el-Edeb el-Şefahî el-Kurdî*, el- ciz el-Saniye, Xanî, Dihok 2008. r.18.

⁵⁸ Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî, *Binyatî Géranewe le Dastanî Mem û Zînî Ehmedî Xanî û Şarî Mosîqare Spîyekani Bextyar Elî da*, r.55.

⁵⁹ Telal Herib, Ewlewiye el-Nas, r.177.

⁶⁰ Mihemed Ebdilefî Ebdilrehîm û Bavê Nazê, *Dîroka Edeba Biyanî (edeba serdema navîn û vejînê)*, Parêzgeha Dihok, Dihok 2013. r.19.

⁶¹ Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî, *h.b.* r. 87.

⁶² Nîmetilla Hamid Nihêlî, *Deravek ji Rexnê*, Weşanên Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok 2010. r.12.

⁶³ Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî, *h.b.* r.112.

⁶⁴ Nîmetilla Hamid Nihêlî, *h.b.* r.15.

kesanêkî efsaneyî xelkî nîştman yan destebijêrî palwananî aynîykanin.”⁶⁵ Wate hindek qehremanên mêjûyî û rasteqînî ne, ji layê xelkê ve hatîne naskirin bi rêya rûdanên mezinên mêjûyî; belê hindek ji wan qehremanan xeyalî û efsaneyî ne ji bo encamdana hindek kiryarên xeyalî di nav rûdanên destanê da peyda dibin.

1.2.3. Çîrok

Çîrok cureyekî kevin ê edebê folklorî ye, ji bo serdemên yekcar kevin dizivirît. Ev cureyê edebê folklorî di kevin da bi taybetî li demê şevên dirêj da li cihekî ji layê çîrokbêjî ve dihate vegêran, bi merema serborwergirtin û demborandin û çêjwergirtinê.

Çîroka folklorî yek ji cureyên herî girîng e di nav edebê folklorî da, ji layê çendîn nivîser û vekoleran ve hatiye pênasekirin, mîna Paul Dolaru dibêjît: “heqayet birîtîye le gêraneweyekî zarekî zor rêkupêk.”⁶⁶ Zanayê rusî Vlademir Propp di pirtûka xwe ya binavê *Çîroka Rusî* de amajê bi pênaseya Nîkîver dike ku derbareyê çîrokê dibêjît: “hikayet ew çîrokên serzarî (devokî ne) û di berbelav in di nav xelkî da bi armanca keyifxweşiyê û dem borandinê dihêne vegêran û naveroka wê, rûdanên seyr (fentazî, seyr û dorhêlî) bi xwe ve hembêz diken û bi binyatekê şêwazgerî – terkîbiyê taybet dihête saloxdan.”⁶⁷ Anku armanc ji çîroka folklorî demborandineka xweşe û rûdan bi saloxetên fentazî û seyr di nav da hene. Herwesan Şukriye Resul derbareyê çîroka folklorî dadibêjît: “Birîtî ye le gêranewey çend rûdawêkî yek le diway yek, ke be ser çend kesêkî ciyawaz da dên û têdeperin le şiwênnewarêkî diyarî kiraw da.”⁶⁸ Li dûv vê pênaseyê bo me diyar dibe ku çîroka folklorî vegêrana çend rûdanekên li dûv yek in ku bi ser çend kesên cuda dihên û derbas dibin li cihekî destnîşankirî.

Di edebê folklorî kurdî da çendîn zarav bo çîroka folklorî tên bikaranîn, li dûv zaravî dihêne guhartin, bo nimûne “neqil-hîkayet, serguzeşte.”⁶⁹ Çîroka folklorî ya kurdî ji “efsane û destanên kevin dest pê kiriye.”⁷⁰ Hindek beşên edebê folklor ji layê rûxsar û dariştinê ve mîna yek in, ji encamê borîna demî, çendîn guherîn bi ser hindek ji wan beşan da dihên û dibine egerê peydabûna beşekê dîtirê edebê folklor her weku dirustbûna çîroka folklorî ku “çîrok, berew pêş çûnêkî mêjûyî efsaneyê û le rûy form û

⁶⁵ Mukerem Reşîd Talebanî, “Aya Serdemî Destan Beser Çûwe”, Karan, j.248, Hewlêr 2010. r.76.

⁶⁶ Muhsîn Ehmed Umer, *Ferhengî Edebî*, Hemdî, Silêmanî 2012. r.283.

⁶⁷ Rêjîn Cemîl Xelîl, *Hunerê Çîroknivêsinê li Cem Nuredîn Zazayî –Vekolîneka Wesfî-Şîrovekarî*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Sikola Adabê, Dihok 2014. r.130.

⁶⁸ Şukriye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekî Edebî*, r.150.

⁶⁹ Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî*, r.18.

⁷⁰ Mes'ud Cemîl Reşîd, *Pexşan û Hunerên Wê*, Weşanên Kitebxana Cizîrî, Dihok 2016. r.89.

dariştinewe lew eçêt. Herçende le rûy nawerokewe hendê ciyawazîyan heye, keresey efsane le xeyal û pir û pûçewe wergîrawe, belam keresey çîrok le jiyanewe weregîrê. Keresey çîrokî kurdî her giyanleber e, îtir yan ajele, ya mel û balindeye û, beşî gewrey kereşekêş ademîzad xweyetî.”⁷¹

Ji layê avahî ve “le hîkayet da karakter û kat û şîwên û rûdaw, sereta û nawend û kotayî heye.”⁷² Wate avahiyê çîroka folklorî ji kesayetî, dem, cih, rûdan, destpêk, navend û dûmahiyê pêkdihêt. Kurtî û dirêjiya qebareyê çîroka folkloriya cêgîrnîne, çunkî vegêrana çîrokê ji çîrokbêjekî bo yekê dîtir cudaye. Ji ber ku deqekê nivîsariyê nîne, ev çîrokbêje hindê ji têkstê çîrokê kêrmanî yan zêde diken, ku “çîrokbêjî pê xweş bûye hindê navên cihan û navên mirovan, ji nik xwe bikete di wê vegêranê da, bi tinê ji bo xweşiyeka zêdetir bidetê, ev jî bi rewanbêjî û bi lîmetiya çîrokbêjî ve girêdayî ye û her ji ber hindê jî hindê kesan ji hindêkên di pitir nav û dengên xwe di vî derbarî da hebûye û peyda kirîne.”⁷³ Anku çîrokbêj ji bo merema hindê pitir kartêkirinê li ser guhdariyê biket, hindê navên mirovan û cihên balkêş li dûv şîyanên rewanbêjiya xwe di nav çîrokê da diguherît. Lewra “dê bîni ew çîroka li deverekê, bo nimûne bi nivî demjimêrê dihête gotin, heman çîrok bi demjimêrekê li devereka di hate gotin.”⁷⁴ Anku di şîyanên çîrokbêjî da heye demê çîrokê kurt û dirêjbiket.

Çîroka folklorî bi şeweyê pexşanê û bi zimanekê sade dihête gotin, rûdanên çîroka folklorî di sadene û girêdayê yek in û bi awayekê zincîreyî dihête gotin û “li dûv yek dihen bêt ku çîrokbêj çî teknîkeke mîna montaj, flashback hwd. bikar bîne.”⁷⁵ Herwesan “rûdanên vî curî pitir cextiyê li ser rûdanekê yan qehremanekî dike, dibe ev serhatiye civakî yan siyasî yan derûnî be.”⁷⁶ Kesayetî di çîroka folklorî da kesayetiyeka bê kêmasî û xwedan çendîn taybetmendiyên rewiştî ye. Layenê veşartî yê derûnê kesayetî nahête diyarkirin, wate “perdeladan le derûnî karakter nakate amanc. Be wurdîş wesfî karakter nakat; emêş ewe nageyenêt ke layenî derûnî be yekcarî piştigwê xirawe!”⁷⁷ Herwesan kesayetî di çîroka folklorî da kesayetiyeka berhev e, “herweku xwe dimîni û pêşve naçît. Dîsan kesayetiyeka nenas û bê nave, bitinê bi rêya sîmayekê,

⁷¹ Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî*, r.18.

⁷² Îbrahîm Qadir Mihemed, *Lêkolînewey Kurte Çîrokî Kurdî le Kurdistanî Başûr da*, Nameya Doktorayê ya Çapnekirî, Zankoy Selahedîn, Kolejî Adab, Hewlêr 1997. r.2.

⁷³ Ebdilrehman Bamernî, *Şevên Çileyî*, Kemal, Silêmanî 2011. r.9.

⁷⁴ Ebdilrehman Bamernî, *h.c.*

⁷⁵ Rêjîn Cemîl Xelîl, *Hunerê Çîroknivêsinê li Cem Nuredîn Zazayî*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Skola Adabê, Dihok 2014, r.137.

⁷⁶ Telal Herib, *Ewlewiye el-Nas*, r.122.

⁷⁷ Îbrahîm Qadir Mihemed, *h.c.*

mîna başî, xirabî, zîrekî, tembelî, merdî, bexilî hwd. di çarçovekîda, mîna çarçovê desthilatdariyê mîna paşa, wezîr, kurê paşayî, kiça paşayî hwd. yan çarçovê pîşeyî, wek bazirgan, nêçîrvan hwd. yan çarçovê civakî wekî kesekê hejar, zilamekê zengîn, kiçeka êtîm û sêwî hwd. Dihêt niyasîn.”⁷⁸ Demê çîrokê demekê asayî ye, kurtikirin têda dihêtekirin, belê teknîkên mîna montaj, flashback (zivîn) hwd. têda nahêne bikaranîn.

Çîroka folklorî çendîn sîmayên taybet hene, ji destpêk û naverok û dûmahîkê pêk dihêt, li destpêkê vegêr bi şewazekê ciwan û serinc rakêş çîroka xwe bi hindek deste wajeyên heta radeyekî neguherîn destpê dike, mîna “carekê ji cara, rehme li deyûbabêt guhdara. Yan carekê ji cara, diravek havête ser malêt maldara, malêt maldara, havête ser feqîra û jara, feqîr û jara çi nebû, kerhimbankek hebû, ew jî havête der gor babê xwedanî, li dîkil û mirîşka bû erzanî.”⁷⁹ Yan “hebû nebû, kes ji xwedê mezintir nebû, kes ji beniya direwintir nebû.”⁸⁰ Di naverokê da qehreman rolekê berçav digêrît û hewla çareserkirina hemî girê û arêşeyan dike û ber bi dûmahîkê diçît. Dûmahîkê çîrokbêj bi awayekê rêkûpêk û ciwan derbas dibe, di zorbeya caran da berev dûmahîkanîna çîrokê bi keyfxweşî xilas dibin û kêr caran jî trajedî ne. Herwesan bi destewajeyên cuda cuda çîrok bi dûmahîk dihên wekî “ez hatimeve çi neda min” yan “ez hatimeve rehme li deyûbabêt hazir û guhdara” yan “çîroka min çû deştê, dayûbabêt min çûne behşîtê.”

1.2.4. Stran

Stran cureyekî edebiyata folklorî ye û ji layê mêjûyî ve kevna e. Şukirye Resul di vî warî da dibêjît: “serhêldanî goranî bo ew kate degerêtewe ke mirov hestî be xweşî û naxweşî û azarekanî kirdûwe, legel rewî berew pêş çûnî da tewanîwyetî wutekan bikat be goranî û denge ciyawazîyekanî siruştîş hoyekî ew karî gerîye bûwe ke tewanîwyane awaz bo guranyekan dirust biken.”⁸¹ Li dûv vê boçûnê, mêjûyê stranê vedigerête wî serdemê mirovî hest bi xweşî û nexweşiyê kirî û bi borîna demî mirov karîne çawanî û şewazê dirustbûna stranê diyar biken.

Ev cureyê edebî ne bi tinê bi rêya peyvê dihête gotin, belku li gel peyvê awazeka ciwan û serinc rakêş dihête bikaranîn. Zêdetir ev cure ji layê gelî ve dihête wergirtin, parastin û veguhaztin bi rêyeka zarekî. Sebareta strana folklorî, muzîkjenê hungarî Bîla

⁷⁸ Rêjîn Cemîl Xelîl, *Hunerê Çîroknivêsinê li Cem Nuredîn Zazayî*, r.135.

⁷⁹ Hecî Cehfer, *Hindek Vekolîn li dor Folklorê Kurdî*, Weşanên Yekêtîy Nûseranî Kurd, Hewlêr 2013. r.186.

⁸⁰ Hecî Cehfer, *h.c.*

⁸¹ Şukirye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, r.87.

Bartuk dibêjît: “guranî folklor birîtiye lew guraney keke nêw komelêkî zorî xelk da bûnî heye û bo maweyekî zor zorewindîş le nêwanyan da demênêtewe.”⁸²

Di edebê folklorê kurdî da strana folklorî ya kurdî bi kevintirîn pişka torê folklorî dihête hejmartin.⁸³ Mebest ji strana folklorî “le helbestêk awazî bo danrabê, belam ne helbesteke dezanîn kê daynawe û ne awazekeyş, lenaw komelêkî nexwêndewarda serî heldawe û Leser demêkî konda em goraniye berdewam bekarhatûwe.”⁸⁴ Danerê wê yê berze ye û nediyare û bi şêweyekê berbelav di nav xelkî da heye û hemî xelk bi milkê xwe dizanin. Herwesan strana folklorî “ew parçe şîr in ku barapitir bi hevkarîya muzîkê dihêne gotin û di nav texên xelkî da bi rêya vegêrana serzarî dihête veguhaztin.”⁸⁵ Wate stran li destpêkê têkstekê şîrî ye û bi hevkarîya awaz û muzîkê dihête gotin û dibe e stran. Wate “emane şîr in, le folklor da pêyan degotirêt goranî.”⁸⁶ Lewra “hemû şîrê be awaz we ya xwed be şêwey awaz bigotirê goranî pê delen.”⁸⁷ Strana folklorî ya kurdî li ser “kêşa xwemalî ke be jimarey birgekan û westanî nawerastî letedêr diyardekirê û her le konewe sirûd û goranî û beyt û serapay şîrî folklorî bew kêşe darjawe.”⁸⁸

Stranê peywendiyeka bi hêz û mukim heye digel mirovî, mirov “le rêgey goranîyewe hest û nestî xweyan derbirîwe beramber be jiyan û siruşt naxî dilî xweyan le rêgey goranîyewe gwastotewe ser laperrey jiyanî waqaî.”⁸⁹ Lewra “çi helkeft nînin kumirovî têda bîr û rayên xwe bi stran dernebiribin.”⁹⁰ Anku di xweşî û nexweşîyên jiyanê da cihê xwe di nav civakî da digêrît û dihête gotin. Her cure helkeftekê şêwazê xwe yê taybet ê strangotinê heye, bo nimûne stranên dîlan û şahîyan cûda ne ji stranên pêgotinê yan jî stranên karî hwd. Ji wê çenda borî diyar dibe ku stran berbelavtirîn û mezintirîn cureyê edebê folklorî ye. Stran take rêya derbirînê ye ji zehmetiya barê jiyanê û sozdariyê, ji ber hinde demê mirov stranê dibihîzît yan dibêjît hest bi aramîyeka derûnî diket ji ber ku gelek caran bi stranên xemgîn jî dil û derûnî mirovan dêxîte di nav rewşeka aram da.

⁸² Es'di Mihemed Elî, *Goranî Folklorî*, Wer: Amanc Xazî, Minare, Hewlêr 2010. rr.23-24.

⁸³ Kamîran Berwarî, *Stranê Folklorî (perwa çiya)*, Seqafe Şibab, Bexdad 1986. r.6.

⁸⁴ Wuriya Ehmed, “Goranîy folklorî çî ye?” Karwan, j.3., Bexdad 1982. r.38.

⁸⁵ Ahmed Faruq Mustafa, *el-Mewalid Dîrase lil-Adat we el-Teqalid el-şe'bîye fî Misir*, Heye el-Misirîye el-ame lil-kîtab, (bê cih), 1980. r.151.

⁸⁶ Selam Nawxeş û hindekên dî, *Kurdolojî*, r.141.

⁸⁷ Mihemed Mukirî, *Goranîya Tiranehay Kurdî*, Wer: Şukiriye Resul, , Wezareti Roşenbîrî, Hewlêr 1999. r.21.

⁸⁸ Ezîz Gerdî, *Kêşî Şîrî Klasîkîy Kurdî*, Wezareti Roşenbîrî, Hewlêr 1999. r.94.

⁸⁹ Mizefer Mistefa Îsma'îl, “Curekanî Goranî le Folklorî Kurdî da”, *Asoy Folklor*, j.29, Hewlêr 2007. r.6.

⁹⁰ Telal Herib, *Ewlewiye el-Nas*, r.162.

Sebarec cureyên strana folklorî gelek boçûn û polînkirinên cuda cuda hene. Belê bi şêweyekê giştî em dişên bi vî şêweyîcureyên wê polînbikin:

1. Stranên Civakî: Ev stran girêdayî jiyana civakê ne û li demê helkeft û bûn û bîrewerîyan dihêne gotin, mîna dawet, şahî û aheng hwd.
2. Stranên Evînê: Ev stran li ser hesretên dilên kur û keçên evîndar hatiye avakirin, babetên wê hemî girêdayî hezjêkirin û evîna kur û keça ne. Di folklorî kurdî da heyranok girîngitirîn strana evînîyê ye ku bi şêweyê diyalogê di navbera keç û kuranda dihête gotin.
3. Stranên Karî: Ev stran girêdayî prosêsa karî ne û demê mirov karekî encam didet van stranan dibêjît. Mîna stranên çûna karwanî, stranên dirûnê, stranên hêrana destarî, stranên maziçînînê, stranên conîqûtanê, stranên cotkirinê, stranên çûna nêçîrê, stranên şivanetiyê û stranên meşkkênê hwd. Her yek ji wan stranan li gorî selîqa karî dihêne gotin bi merema sivikîrîna bargiraniya ser milên xwe.
4. Stranên Şerî: Ev stran girêdayî mêrxasî, qehremanî, xweragîrî, şer û cengan in
5. Stranên Ayînî: Ev stran girêdayî rêûresmên ayînî ne, mîna wan sirûdên derbareyê jiyana û karên pêxemberî, hevalên wî û mirovên çakên aynî dihêne gotin.
6. Stranên Pêgotinê: Ev stran li ser mirina kesekî dihêne gotin û têda bi şêwazekê xemgînî pesna kesê mirî dihête kirin.
7. Stranên Ramyarî û Şoreşgêrî: Ev stran girêdayî zulim û zordariya dijminan in, li ser ciyawaziya çîneyetî tene gotin.
8. Stranên Zarokan: Ev stran girêdayî qonaxa zarokînyê ne, mîna *stranên berlandikê û stranên nivandina zarokan, pêgotin û saloxdana zarokan* in.*

1.2.5. Gotinên Mezinan

Her gelekî pend û gotinên xwe yên taybet hene, ev gotin û pend derbirînê ji dab û nerît û serborên wî gelî diken. Gotinên mezinan jî beşeke ji edebê folklorî ne. Nivîserê îngilîz A.Taylor derbareyê evê cureyê edebê folklorî dibêjît: “qisey pêşînan risteyêkî rêkûpêk û ciwan darriştirawe. Wek wuteyêkî be tiwêklir û pir mana lenaw xelkda belaw botewe.”⁹¹ Wate gotinên mezinan jî hevokeka rêkûpêk û ciwan pêk dihêt, hilgira wateyên kûr û berifreh e, di nav xelkî da û belav bûye. Gotinên mezinan jî encamê

* Bo pitir pêzanîna binêre: Cotyar Îsmail Nebî, *Naveoka Heyranoka Kurdî – Vekolîna Wesfî Şîrovekarî*, rr.20-31.; İbrahim Hesen Hemed, *Rengdanewey Kelepûr le Romanî Kurdî da (Başurî Kurdistan 1985-1991)*, Weşanên Yekêtiyê Nûseranî Kurd-Melbendî Giştî, Hewlêr 2012. rr.37-41; Kamîran Berwarî, *Stranê Folklorî (perwa çiya)*. rr.12-13.

⁹¹ Kerîm Şareza, *Pendî berawirdikarî le nêwanî îngilîzî – erebî - kurdî*, Semîr amîs, Bexda 1983. r.7.

serborên jiyanê peyda bûyîne, bi vî şêweyî hatine pênasekirin: “axivtineka kurt e, lê ew bi xwe ya pîrî raman û berbelav e.”⁹² Anku gotin li dev her gelekî “qodîkeka rohne, rengvedana dab û nerît, jiyan, bîrubawer û reftarên wî gelî dike.”⁹³ Gotinên mezinan yek ji wan cureyên herî girîng e di nav edebê folklorê kurdî da, “kurd le layen pendî pêşînanewe edebêkî berzî heye.”⁹⁴ Lewra di vekolînên edebê folklorî da girîngiyeka zor pê hatiye dan, herwesan ew bûne cihê putepêdana folklornasên kurd, bo mînak Îzedîn Mistefa Resul derbarey gotinên mezinan dibêjît: “pendî pêşînan birîtiye le berhemêkî zor konî xelk. Em pende hemîşe le lay gelanî seretayî û sade felsefey rasteqîne û le karî rewşit û xwewew, hemû rastîyek, hemû rûdawêkî jiyanî ademîzad, hemû kirdarêk, çak yan xirap, hemû geyîştine encamêk ke mîlet geyîştêbêtî, derbarey herçîyek bêt eçête terazûy pendî pêşînananewe.”⁹⁵ Di vê pênaseyê da diyar dibe ku gotinên mezinan ji layê mêjûyî ve berhemekê kevnar e, herwesan kirdar, rûdan û serborên jiyana mirovî bûyîne egerê dariştina gotinên mezinan. Dîsan di pênaseyeka dîtir da Umer Şêxella Deşteki derbareyêgotinên mezinan da dibêjît: le risteyekî kurtî sade weya lêkdirawî ser zarî remekî merdim weya pexşanêkî razawe weya yek dû honrawen çemk û wateyekî gewre deden bedestewe, le boteyekî ciwanî kurdî da darêjrawin.”⁹⁶ Ev pênase behis li kurtî û ciwaniya darêştina gotinên mezinan dike, ku bi herdu şêweyên pexşan û şîrî dihêne darêştin û hilgira wateyên kûr û berifreh e. Herwesan nivîser Ebdulqadir Bîngol dibêjît: “gotinên pêşîyan peyvên kurt û wecîz in ku ji aliyê wate û naverokê ve gelemperiyê dîkin (anku îdiyayekê tînin ser zimanî) ji nava gel derketine. Ji ber ku dem di ser da derbas bûye jêderka wan hatiye jibîrkirin, ew bûne malê gel, kê mî zêde ji aliyê herkesi ve têne zanîn û di zimanê rojane de têne bikaranîn.”⁹⁷ Ev pênaseye jî cextê li ser qebareyê kurtegotinên mezinan dike, naverokeka watedar, herwesan jêderê peydabûna wan. Girîngiya gotinên mezinan ya di wê çendê da ye “ku her gotinek piştî ezmûnekê û serborekê peyda bûye, anku her gotinek wateyeka ciwan berçav dike û hemî biyavên jiyanî bi xweve girît, bi merema wê çendê her kesek mifay jê wergirît.”⁹⁸

Gotinên mezinan mîna her cureyekê edebê folklorî saloxet û rûxsariyên xwe yên taybet hene ku dihêne cudakirin ji cureyên dî:

⁹² Telal Herib, *Ewlewiye el-Nas*, r.146.

⁹³ Telal Herib, *h.b.* r.142.

⁹⁴ Eladîn Seccadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, r.139.

⁹⁵ Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, r.78.

⁹⁶ Umer Şêxella Deşteki, *Pendî Kurdî*, Bergî yekem, Kurdistan, Hewlêr 1972. r.4.

⁹⁷ Abdulkadîr Bîngol, *Gotinên Pêşîyan û Biwêj*, Weşanên Na, Îzmîr 2014. r.5.

⁹⁸ Mihsin Arif Salih û Ebdilrehman Şivan Cercîs, *Rengvedana Kesayetiya Mirovê Kurd di Gotinên Mezinan da*, Zankoya Dihok, j.18. Berbend 2, Dihok 2015. r.268.

1. Gotinên mezinan mîna cureyekê edebê folklorî di nav xelkî da di kevnar û berbelav in, xwedanên wan ne diyar in, lewra wek milkê hemî xelkî dihêne hejmartin.
2. Bi zimanekî sakar û sade dihêne gotin û negirêdayî çî çînen taybet in, belku hemî çînen civakî bi asanî têdigihin.
3. Şewazê darêştina wan yê curbicur e, wate bi “pexşan, çîrokamêz, şîr”⁹⁹ dihêne dariştin û gotin.
4. Ji layê qebareyê ve gelek di kurt in û piraniya wan bi kêş û serwan e, da ku hêsan bin ji bo jiberkirin û belavbûnê di nav xelkî da. Wate “le risteyekî manadarî kurt zorbey kêş û serwa dare, le rûy zorîy mana û zorîy bekarhênanewe, tewanayekî zorî bo razandinewey qise heye.”¹⁰⁰
5. Ji layê naverokê ve gelek dewlemend in û hilgirên wateyên kûr û berifreh in.
6. Çendîn erkan di nav civakê da digêrît bo nimûne “erkê rewşenbîrkerinê, perwerdekerinê, gehandinê, rawiştî û parastinê.”¹⁰¹ Herwesan ji bo hişyarkirin û xwe dûrxistin ji karên nedirust dihêne gotin, bo nimûne eger serborî ya şaş be pêdivî ye dubare neket û xwe dûr bêxît jê. Herwesan ji bo bi hêzkirina axiftinê ne çunkî gelek caran ji bo ku axêverpitir baweriyê bo guhdarî peydabiket, gotinên mezinan bikardînit û cure hêzekê didete axiftina xwe.¹⁰²
7. Di gotinên mezinan da “regezekanî rewanbêjî weku ronbêjî û ciwanbêjî û lêkçûn û dirke û hendêk tuxmî edebîtir weku hecû, şanazî, mubalexekirin”¹⁰³, rolekî girîng digêrin.
8. Jêderê peydabûna gotinê di nav civakî da girêdayî çî tex û çînen taybet nînin, belku di nav hemî tex û çînen civakî da berbelave, çunkî gotin mîna “felsefeya jiyan, dengî taqî kirdinewey cîhan û berî rewan bêjîy (belaxe) rewan bêjan (belîxan) e, ke baw û bapîran le ... becê hêştuyn, tabyankeyn be awêney balanima bo xweman.”¹⁰⁴

⁹⁹ Herdewêl Kakeyî, *Pend û Qisey Nesteqî Maço*, Giştûkal, Hewlêr 2006. r.10.

¹⁰⁰ Şukiriye Resul, *Ziman û Edebî Kurdî (pexşan)*, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr 1987. rr.20-21.

¹⁰¹ Mihsin Arif Salih û Ebdilrehman Şivan Cercîs, *Rengvedana Kesayetiya Mirovê Kurd di Gotinên Mezinan da*, rr.266-268.

¹⁰² Xalde Sedîq Ehmed, *Rengvedana Gotinên Mezinan di Rûxsar û Naveroka Hozanên Nalbendî da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Skola Adab, Dihok 2013, r.18.

¹⁰³ Necim Xalid Necmeddin, *Lêkolîneweyekî Pend û Qisey Nesteqî Kurdîy Şarî Xaneqîn*, Nameya Mastererê ya Çapnekirî, Zankoy Selaheddîn, Kolejî Adab, Hewlêr 1992. r. 92.

¹⁰⁴ Şêx Mihemedî Xal, *Pendî Pêşînan*, ç.3, Weşanên Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî 2000. r.7.

9. Wateya gotinên mezinan di zorbeya caran da bi şêweyekê yekser diyar nabe, anku xwedan wateyeka veşartî ye, lewra “piranyek gewre bi mecazî hatine gotin.”¹⁰⁵

1.2.6. Biwêj

Biwêj wek cureyekî edebê folklorî di nav hemî gelan da heye, gelê kurd jî ji vê cureyê edebê folklorî yê bêpar nebûye. Ev cure di zimanê îngilîzî da wek (idiom), di zimanê erebî da (kînaye) tê binavkirin û di zimanê kurdî da jî bo wê peyvên îdyom, biwêj, frêzyolojî, pejin, dirke, kinaye tên bikaranîn. Biwêj wek beşek ji edebê folklorî dihête hejmartin, ji ber ku hindêk ji biwêjan li ser “efsane û çîroke efsaneyekan danrawe gelêk kelk le ser guzûştew çîroke folklorîyekan wergîrawe.”¹⁰⁶ Yan dibe hindêk caran “îdyomeke le binçîne da pende, beşêk le pendeke, ke kirrokî pendekeye werdegîrêt.”¹⁰⁷ Lewra “bahra pitir ya îdyomên kurdî hêşta her di axaftin û folklorî da dihêne dîtin û bi seda ji ew in ewên di nivîsînê da nehatîne bikaranîn û pişka zora wan îdyoman keftîne di nav nivîsînê jî da ewin di axiftinêda gelek di çalak. Îdyom edebî dixemlînin.”¹⁰⁸ Wate her yek ji efsane û gotinên mezinan jêderê dirustibûna biwêjê ne. Herwesan biwêjan jêderê xwe ji xelkî û jiyan û serborên wan wergirtîne.

Sebarek pênaseya biwêjê her vekolerekî li dûv nêrîna xwe pênase kiriye, mebest ji biwêjê ew e ku “bekarhênanî çend wişeyeke beşêweyek, ke bibîne amaje bo çemkêkî tir, ciya le watey ferhengîy xweyan, emeş peywendî be taybetî zimanî komelêkî diyarî karwewe heye.”¹⁰⁹ Wate şêwazê biwêjê ramanê ji xwe naket, belku ramaneka dî di nav xwe da hildigirît. Di pênaseyeka zimanvanî da biwêj “birîtî ye lew derbirînaney kele riwalet da danerî rêzimanî, belam le jêrewe zir daney watesazîn leserî rêkewtûn û xweyan le ziman da çespondûwe.”¹¹⁰

Herwesan di pênaseka dîtir da derbarey biwêjê Nesrîn Mihemed Fexrî dibêjît: “îdyom destew wişeyêkî cuda cuda û têkel û serbixwey zimane pêkewe wateyêkî tazew taybetî û ciwan û sift û tîj dirust deken sereray ewey ke zaraweyêkî behêz dênête

¹⁰⁵ Çiya Mazî, Ferhenga *Gotinên Pêşîyan*, Veguhaztin ji elfibêya latînî: Evraz Hisên, Weşanên Dezgay Spîrêz, Hewlêr 2006. r.17.

¹⁰⁶ Celal Mehmed Elî, *Îdyom le Zimanî Kurdî da*, Weşanên Dezgay Roşenbîrî û BiLawkirdinewey Kurdî, Bexda 1982. r.27.

¹⁰⁷ Celal Mehmed Elî, *h.b.*, r.25.

¹⁰⁸ Ebdilwehab Xalid, *Çend Babet û Lêkolînên Zimanî*, Weşanên Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok 2009. rr.186-187.

¹⁰⁹ Şilan Umer Hisên, *Îdyom Çeşn û Pêkhatinî le Zimanî Kurdî da*, Renc, Siêmanî 2009. r.12.

¹¹⁰ Fetah Mame Elî, *Îdiyem le Zimanî Kurdî da*, Nameya masterê ya çepnekirî, Zankoy Selaheddîn, Kolejî Adab, Hewlêr 1998. r.38.

kayewe û deyanxene serbarêkî pesnid û çespaw.”¹¹¹ Wate biwêj ji desteyeka peyvên cuda cuda ên zimanî pêkdihêt, wateyeka nû û zaravekê nû yê bihêz û pesend berhevdike di nav zimanî da. Di pênasayeka dîtîr da wesana biwêj daye diyarkirin ku “qiseyekî nask û ziyatir şaîraneye, be mecaz bekardehê û be giştî xwestin û lêkçewandine, ca be çak yan xirap û teşer amêz û mebestêkî çaksazîyê tê da ye.”¹¹² Biwêj zêdetir dariştineka şairane ye, ji berbikaranîna hunerên rewanbêjiyê, bo derbirîna mebesteka çaksaziyê dihête bikaranîn.

Biwêj hilgira çendîn rûxsariyên taybet e di nav edebî folklorî da, ji layê pêkhateyê ve biwêj “deşet wişeyek bêt yan cote wişe, yan çend wişeyek bêt ke pêkewe guncabêt. Yan risteyek yan çend risteyekî pêkewe bend.”¹¹³ Hilgira du wateyan e “yekemyan rasteqînekeyetî û duwemyan mecazî ême be duwemyan delên îdyom, çunkî bo mebestî selmandinî wateyek mana mecazîyê bekardehênin.”¹¹⁴ Lewra “derbirîneka negore, şewazekê axivtinê ya taybete bi zimanekî diyarkirî, mecaz saxleteka wê ye, nahête wergêran, wek yekeyeka zimanî lêkolîn lê dihête kirine.”¹¹⁵ Herwesana bi “naskitirîn û wirtitirîn hoy rwanbêjiye, gelêk lewe karîgertire ke to rasterast rastîyek aşkira bikeyt û bîlêyt, çunkî em palt pêwe denêt bîr le qiseke bikeytewe.”¹¹⁶ Girîngî û taybemendiya wê “lewedaye ke wêneyekî wa bi mebest û manake dekêşet ke be tewawî û aşkira hestî pê bikeyt û derûnit bihejênêt.”¹¹⁷

Di navbera gotinên mezinan û biwêjê da têkiliyeke mezin heye, hindek layenên wekhev û hindekên cîyawaz hene, belê layenên wekhev pitir in ji layenên cîyawaz. Danana sinorekî di navbera wan da karekê bi zihmete “ew jî egerekê serekî yê hey ku geşe û goran di zimanî da faktorekî girînge ku kartêkirin li komeka gotinên mezinan kiriye ku bibine îdyom û berovajî.”¹¹⁸ Yek ji wan xalên wekhev di navbera wan da ew e ku “ramana wan herduyan ne ji encamê lêkdana ramanan, lê ji pêkhatinên wan peyda dibe, anku ramaneka deqedeq nîne.”¹¹⁹ Çendîn layenên cîyawaz di navbera gotinên

¹¹¹ Nesrîn Mihemed Fexrî, “Hendê Zarawe û Îdiyokî Kurdî”, Kolîcî Edebiyat ya Zanistgay Bexda, j.19, Bexda 1976. r.71.

¹¹² Ararat Ehmed, Qotîy Etar, Qotiy Yekem, Danaz, Silêmanî 2004. r.10.

¹¹³ Celal Mehmed Elî, *Îdyom le Zimanî Kurdî da*, r.22.

¹¹⁴ Husên Xazî Kak Emîn Gelaleyî, *Rewtî Nwêkirdinewey Şîrî Kurdî le Başûrî Kurdistan le Salanî (1980-1991)da*, Weşanên Akadîmyay Kurdî, Hewlêr 2010. r.146.

¹¹⁵ Huda Ebdilqadir Qasim, *Simantîk û Pragmatîka Îdyoman di Zimanê Kurdî da*, Nameya Doktorayê Çapnekirî, Zankoya Dihok, Skola Adabê, Dihok, 2015. r.40.

¹¹⁶ Celal Mehmed Elî, *h.b.*, r.17.

¹¹⁷ Celal Mehmed Elî, *h.c.*

¹¹⁸ Huda Ebdilqadir Qasim, *Simantîk û Pragmatîka Îdyoman di Zimanê Kurdî da*, r. 29.

¹¹⁹ Huda Ebdilqadir Qasim, *h.c.*

mezinan û biwêjên da hene ku ji layê pispore û şarezayên di vî warî da dayne diyarkirin. Yek ji wan xalên ciyawaz di navbera wan da ewe ku ji layê kêş û serwayê ve “pend barapitir bi kêş û serwane, belê kîneyet ne.”¹²⁰ Yek ji xalên di yê ciyawaz ew e ku “îdyom cihê derbirînekê (yek têgeh) digirî, belê gotina mezinan cihê pitir ji têgehekî digirî.”¹²¹ Ciyawaziyeke dîtir ya di navbera wan da ew e ku “deqî pend le gotinda gorranî beserda nayet û deskarî nakirê. Belam îdyom bepêy her baruhalekî rewijgar, yaxwed bepêy kesekanî yekem û duwek û sêyem dekirê û, qiseker boy heye goranî beserda bête û bew çeşne pêwîst dayrrejêtewe.”¹²² Çendîn xalên di yê wekhev û ciyawaz hene.*

1.2.7. Metel (Metelok)

Metel cureyek e ji cureyên dîtir ên edebê folklorî, ev cure di nav edebê folklorî yê hemî gelan da cihekê diyar û girîng heye. Morîs Bloomfield di dete diyarkirin ku “metelî birahmanî ke le kongirî huner û zanîst da le salî 1904 da pêşkeşî kird, elêt: metel lew serdeme dêrîne da peyda bûwe ke 'eqî seretayî meşqî le ser ewe ekird ke xwey legel gerdûn da biguncênê hwd.”¹²³ Bi vê çendê diyar dibe ku mêjûya metelê, mêjûyeka kevnar û dêrî e. Bo wî serdemî dizivirî, demê mirovî hest bi hizirkirin û bîrkirinê kirî, ku ev mêjûye jî mêjûyeka gelek kevnare. Metel bi şeweyê risteka pirsîyarî dihête pêşkêşkirin ji layê kesekî ve bo kesê beramber yan çend kesan di.

Çendîn zarav bo metelê dihêne bikaranîn, bo nimûne di edebê îngilîzî da ev zarave bo dihêne bikaranîn: “puzzle, conundrum, enigma, mystery, riddle, secir”¹²⁴ Di edebe folklorî yê erebî da jî ev zarave ji bo metelê dihêne bikaranîn “lixiz, m'ma, hizore, el-hicye, el-uweys.”¹²⁵ Di edebê folklorî yê kurdî da çendîn zarav ji bo metelê dihêne bikaranîn mîna zaravên “metele, metelok, tiştanok, mamik, qirosele, helêne, meyil, hetele, çewçe, têderxistinok”¹²⁶

Her nivîserekî li dûv şarezaya xwe hewil daye metelê pênase biket, herweku nivîsera ereb Nebîle Îbrahîm derbareyê metelê dibêjît: “metel cureyekê kevnê edebê

¹²⁰ Hecî Cehfer, *Pejn û Gotinê Kurdî*, Weşanên Dezgay Spîrêz, Hewlêr 2006. r.8.

¹²¹ Huda Ebdilqadir Qasim, *Sîmantîk û Pragmatîka Îdyoman di Zimanê Kurdî da*, r.29.

¹²² Ararat Ehmed, *Qotîy Etar - Qotiy Yekem*, r.13.

¹²³ Kameran Mukirî, *Kameran Edebî Folklorîyê Kurdî*, Beşî Yekem, r.102.

* Bo pitir pêzanînan binêre: Huda Ebdilqadir Qasim, *h.b.* r.29. ; Hecî Cehfer, *h.b.*, r.8.

¹²⁴ Sedredîn Nuredîn Ebubekir, *Berkotêkî Metelî Folklorî Kurdî (lêkolînewe û rexne)*, Weşanên Wezareti Roşenbîrî, Hewlêr 2005. r.31.

¹²⁵ Sedredîn Nuredîn Ebubekir, “Metelî Folklorî Kurdî Çi ye” *Asoy Folklor*, j.6, Hewlêr 2004. r.25.

¹²⁶ Kemal Necim Mihemed, “Metel le Edebî Nûsraw da”, *Asoy Folklor*, j.43, Hewlêr 2009. rr.49-50.

folklorî ye, mîna efsaneyê û hîkayetê yê berbelav e, ne bitinê hindek peyvên sersorhêner û pirsiyarin, belku di gewherê xwe da xwestineke, evxwestine ji encamê pêşkeftina mêşkê mirovî peyda bûye.”¹²⁷ Herwesan nivîserê kurd Elaeddîn Secadî di pirtûka *Deqekanî Edebî Kurdî* da, derbarê metelê dibêjît: “le çend wişe û risteyekî kem, yekêk daynawe bo zaxawî mêşk, wate: bîrî le şitêk kirdotewe, em şitey xistute qalbî çend wişeyekewe eprisêtewe le kesanî tir bo ewe wan bîrî xweyan bixene kar bo helhênanî.”¹²⁸ Di pênaseyeka dîtîr da Nesrîn Fexrî derbariyê metelê dibêjît: “awêney rasteqîney hûş û curî bîrkirdinewew lêkdanewew şaristanîyetêtî, belgey jiyan û têgeyiştinî jiyan û mirovî ew jiyaneye, mêjuwe, deriyaye, cîhanêkî seyr û sîhrawîye, bûjaneweye, xem rewêne, hawdem û hawrrêye.”¹²⁹ Wate metel ji layê kesekî dihête danan, bi şewê pirsyar, ji bo bi hêzkirina mêşkê mirovî ye, xweşî û dem borandineke ji bo mirovî. Piştî me boçûnên çendîn nivîsera wergirtî, em dikarî derbareyê metelê wesa bêjîn: Metel ji komeka peyv û zaraveyan di risteyeka çir û pir wate da pêk dihêt, bi şewê pirsyar dihête arastekirin, wateya mebest pê ne ya diyar e, rewanbêjî di wan peyvên da bi şeweyekî diyar û berçav heye, mîna lêkçewandin û dirke hwd.

Her janrek ji curên edebê folklorî, şeweyê taybet ê nivîsînê heye, bi şeweyekê giştî metel bi du şeweyan dihête nivîsîn:

1. Bi şeweyê şîrî:

a. Bi şeweyê kurt bo nimûne:

“Emlay dare, ew lay dare

Le nêwî da du segî hare.”¹³⁰ Bersiv “cencer” e.

b. Bi şeweyê dirêj bo nimune:

“Tîxî tîjî bebirîşte

Hukmî serî toy be mişte

Le ber çawt be hezaran

Zerd û reş û sipî însan

Edate ber dasî direw

Tawê be roj, tawê be şew!

¹²⁷ Nebîle Îbrahim, *Aşkal el-Te'bir fî el-Edeb el-Şe'bî*, r.187.

¹²⁸ Eladîn Seccadî, *Deqekanî Edebî Kurdî*, Weşanên Kurdistan, Sine 1392. r.173.

¹²⁹ Nesrîn Fexrî “Metel Zimanî Palawtin û Zaxawî Mêşk” Asoy Folklor, j.7, Hewlêr 2005. r.54.

¹³⁰ Herdewêl Kakeyî, *Metel le naw Şebek da*, Weşanên Ensîtîtuya Kelepûrê Kurdî, Hewlêr 2008. r.9.

Sezay pakoy em gişt leşe:
Le kîsey xwet parey beşe.”¹³¹ Bersiv “sertiraş” e.

2. Bi şêweyê pexşanî:

a. Şêweyê kurt. Bo nimûne:

“Sêvê heta êvarê nava xwe lê daye, êvarê tê ji bûka malê rinttir e, ew çi ye?.

Bersiv “kêsin” e.¹³²

b. Şêweyê dirêj. Bo nimûne:

“Mirovek li ber sêdarê bû, hakimî mirîşkek kire destî da û gotê ‘tu bi çi rengî vê mirîşkê bikujî em jî dê wesa te kûjî’, vî kabirayî mirîşk wesa kuşt, hakimî neşiya bi wî rengî bikûjîtin. Bersiv “serê mirîşkê kire di devê xwe da û ew xendiqand.”¹³³

Metel mîna her cureyekê dî yê edebê folklorî taybetmendiyên xwe hene, ji girîngitirîn taybetmendiyê metelê evên li xwarê ne:

1. Metel bi şêwazê pirsîyarê û saloxdana tiştê mebestpêkirî dihête pêşkêşkirin. Ji layê kesekî ve ji bo çend kesên beramber bi şîwazê pirsîyarê dihête pêşkêşkirin, armanca wê ew e ku “bîser ecûlînê. Bo çi....? Bo bîr xistinekar bo bîrkirdinewe û geran be şîwên dawakirawekeda, kewa çi nihênîyeke debê bîdozêtewe.”¹³⁴ Herwesan “bizavekê didete mejî û hizrê û bîrê mirovî bikar dêxît û berfireh diket.”¹³⁵
2. Ji layê rûxsarî ve metel bi her du şêwazên pexşanê û şîrê dihête nivîsîn.
3. Ji layê naverokê ve du curin; metelên mebestdar û metelên ji bo zaxawdina mêşkê mirovî dihêne gotin.
4. Regezê rewanbêjîyê di metelê da wek “kurtbirî û dirêjbirî û xweza û xwestin û regezdozî û leyek çiwandin û tîlnîşan û têhilkêş û dijîyek û tewanc poşî û dirke û ...le nêw deqî zor metelan da bedî dekirên.”¹³⁶
5. Metel dizimanê kurdî da “ciwaniya peyker û vehînanan gotinê jî dibînin.”¹³⁷

¹³¹ Ebdulla Goran, *Dîwanî Goran*, Bergê yekem, ç.5, Weşanên Panîz, Tehran 1393 r.387.

¹³² Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, *Ji Zargotîna Kurda-Gulçîn*, Veguhaztin ji tîpên Slavî: Ebdilkerîm Findî Doskî, Weşanên Dezgayî Roşinbirî û Bilawkirdinewey Kurdî 1988. r.48.

¹³³ (Bê nivîskar) *Bêdereke ji Folklorê Devera Behdînan*, Weşanên Ensîtûtuya Kelepûrê Kurdî, Dihok 2014. r.75.

¹³⁴ Xalîd Ebdil, “Xermanêk le metelî kurdî” *Asoy Folklor*, j.16, Hewlêr 2006. r.55.

¹³⁵ Aîşe Mihemed Elî. *Gotin û Civak*, Weşanên Aras, Hewlêr, 2006. r.183.

¹³⁶ Sedredîn Nuredîn Ebubekir, *Berkotêkî Metelî Folklorî Kurdî (lêkolînewe û rexne)*, r.33.

¹³⁷ Ehmed Ebdile Zero, *Mamîkên Kurdî*, Cahiz, Bexda, 1985, r.13.

6. Hêma rolekî serekî di metelê da digêrît, wate zimanê metelê piraniya caran zimanek, hêmayîye.
7. Hebûna vî curî ji valatîyekê nehatiye, belku di nav her gelekî da çendîn erkan digêrît bo nimûne destnîşankirina şîyanên hizirkirinê, dana zanyariyan, demborandin hwd.
8. Parastina peyvên û zengînkirina zimanê: “wişe û zarawekan eparêzin û detwanên ew wişane bo mana û mebestêkî tir bekar bînin û zimanekemanî pê dewlemend bikeyn.”¹³⁸
9. Babetên curbicur in û ji bo zarok û mezinan dihêne gotin û hemî biwarên jiyanê bi xwe ve digirin, anku hilgira babetên curbicure.

1.2.8. Pêkenok (Galte û Gep)

Yek ji pêdawîstiyên serekî yên mirovî di jiyanê da, bi vê çendê dilxweşîyek û arambûnekê bo derûnê mirovî peyda dike, wate “pêkenîn şitêkî bîyolojî û derûnî û 'eqlî û komelayetî ye, emeş yekêke lew şitaney mirov pêwîstî pê yetî wek giriyan.”¹³⁹ Lewra her ji destpêkê da mirovî bizavkirîye di vegêrana rûdan û serborên xwe da cihê bidete layenê pêkenokê. Pêkenok ji wan cureyên edebê folklorî ye ku di nav civakê da girîngiya xwe heye, “bi rêya çend peyvên xweş û pêkenîn, çêj û tam û xweşyekê didete wergirî.”¹⁴⁰ Belê di naveroka xwe da wateyekê hembêz dike ji ber vê yekê manaya wê ji bo her kesî nekifîş e. Têgehiştina wê hinek dijware. Bi awayekî welê li hev hatiye ku mana wê yekcar rast nebe jî dîsan kêfa mirov jêre têt. Ji xwe spehîtiya wê jî di wê de ye.”¹⁴¹ Ev çende jî wê nagehînît ku bitinê mebest ji pêkenokê pêkenîne, belku diyardeyeka rexneye li beramberî hindek diyardeyên civakî û ramyarî hwd. Babetên wê curbicur in û hemî babetên jiyanê bi xweve digirin û zû di nav xelkî da belav dibin.

Di zimanî kurdî da beramberî têgehê pêkenokê, têgehên wekî *nûkte*, *galte û gep*, *pêkenîn* jî dihêne bikaranîn. Pêkenok mîna cureyekî edebê folklorî xwedan mêtîjûyeka kevnare û di vekolîneka zankoya Wiloyrambton ya Birîtanî da hatiye ku “yekemcar le layen firewnekanî mîsr û somerîyekanî başûrî êraq berhem hênrawe, kontirîn nukte

¹³⁸ Îbrahîm Ehmedî, *Ferhengî Metel (Çîstan) û Liçar (m'ma) Kurdî*, Simirix, 1389. r.14.

¹³⁹ Cemal Baban, “Galtey Gep û Qisey Xweş le naw Kurdewarî da” Karwan, j.37, 1985. r.72.

¹⁴⁰ Rêber Hisên Ebo, *Çîroka Gelek Kurt di Edebê Kurdî da li Başûrê Kurdistanê (1991– 2013)*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zanîngeha Mardîn Artuklu – Ensîtîtuya Zimanên Zîndî li Tirkîyeya, Beşê Ziman û Çanda Kurdî, Mardîn 2015. r.42.

¹⁴¹ Hawar, Hemû Hejmar (1-57), j.3. Weşanên Belkî, Stenbol 2012. r.41.

temenî 3900 sal e.”¹⁴² Sebarete pênasikirina pêkenokê, her nivîserek û rexnegirekî li dûv şarezayîya xwe pênasekiriye, herweku nivîser Îzedîn Mistefa Resul dibêjît: “qisey xweş çîrokêkî kurte belam be cureyêkî galte amêz darêjrawe û giyanî pêkenînî kirawe be berda.”¹⁴³ Herwesana Kamîran Mukrî dibêjît: “qisey xweş (nûkte) çîrokêkî yekcar kurt e ke galte amêze û perwerdey giyanî pêkenîn.”¹⁴⁴ Li dûv van pênasayan diyar dibe ku pêkenok çîrokeka kurt e, bi qalibekê pêkenîn û galteamêz, belê ev çende jî wê nagehînît ku pêkenok bi tinê bi şewazê çîrokê ye, belku “le honrawey folklorî û metelî folklorîy kurdîman da be aşkira berçaw dekewê.”¹⁴⁵

Bi giştî qehremanê pêkenokê dibête sê cure:

1. Qehremanê nasiyar.
2. Qehremanê ne nasyar.
3. Qehremanê aşopî.¹⁴⁶

Qehremanê pêkenokê “zorcarîş... tenya hî nawçeyeke, wate le nawçeyek da nasraw û benawbang e, zor car lenaw neteweyek da benawbange zor carîş qehremanêkî (galte û gep) hênde nawbang peyda ekat ke qisey le naw çend neteweyek da bilaw bibênawe”¹⁴⁷ Yan “kesêkî xeyalî ye, xelk dirustî eken, taqî sey bidene pal û be nawî ewe weqise bigêrrine û ew rexne û le barîna hem war û narêkî jiyan bigirin”¹⁴⁸ Ji ber ku “xawenî nukteke xwey le ber hokarî siyasî û derûnî û hîdîke heznekate nawî xwey bixate ser nûktekey.”¹⁴⁹ Wate hindek caran ji ber çendîn hokarên siyasî derûnî hwd. Di pêkenokan da navên nivîseran diyar nabin. Yekji xalên di yên herî girîng ku navê nivîserî nediyar e, di pêkenokan da çunkî ew beşeke ji edebî folklorî û ji sîmayên vî edebî xwedanê berhemî ne diyar e.

Ji layê naverokê ve pêkenok, çendîn babetên curbicur bi xwe ve digirît, mîna “ramyarî, komelayetî, aborî û felsefî ke le waneye be şîwey rexneyekî karîger barî nale

¹⁴² Selam Nawxêş û hindekên di, *Kurdoloji*, r.140.

¹⁴³ Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, r.119.

¹⁴⁴ Kameran Mukrî, *Edebî Folklorîy Kurdî*, Beşî Yekem, r.82.

¹⁴⁵ Hîmdad Husên, *Edebiyatî Folklorî Kurdî (Deq û Lêkolînewe)*, Şehîd Azad Hewramî, Kerkuk 2007. r.202.

¹⁴⁶ Şukiriye Resul, *Silêmanî le Edebî Folklorî* da, Weşanên Înstîtutî Kelepurî Kurd, Silêmanî 2004. r.72.

¹⁴⁷ Îzedîn Mistefa Resul, *h.b.* r.24.

¹⁴⁸ Îzedîn Mistefa Resul, *h.c.*

¹⁴⁹ Idrîs Ebdulla, *Edebî Mîlîy û Folklorîy*, Berg Diwem, Weşanên Ekadimîay Kurdî, Hewlêr 2014, r.200.

barî aborî komelga bixate rû ... Çewsandine wey xelk le layen zordaranewe yan xawen deselatewe.”¹⁵⁰



¹⁵⁰ Şukiriye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, r.167.

BEŞA DUYEM

PEYWENDIYA EDEBÊ FOLKLORÎ BI EDEBÊ NIVÎSÎ VE

Edebê folklorî û edebê nivîsî di peywendiyeka mêjûyî ya hemîşeyî û bê veqetiyên da ne, çunkî “edeb be hemû hunerekanîyewe serçawekey lewê da heldequlê, boye her regezêkî edebî, yan her nûserêk çî lebwarî şîr, yan roman hwd. De bê bîr le samanî dewlemendî netewekey bikatewe, ke ewîş edebî folklore.”¹⁵¹ Eger awirek di mêjûya edebiyatan biden, dê bo me diyarbît ku “peywendî mêjûyî nêwan janrekanî edeb hebûwe, deygot em curaney edeb be rêkewt lexwera peyda nebûyn e, belku weku hemû giyandarêkî ser piştî zemîn her yeke le pizdanî cureyekey pêş xwey çekerey kêşawe û tûy curî paş xwey daçanduwe.”¹⁵²

2.1.Edebê Nivîsî û Edebê Folklorî

Ji encama vê peywendiya di nav edebiyatan da karîgeriya edebî bi çendîn şêwazan li ser hevdu peyda bû, ev karîgeriye dibe “le binyatî ristew derbirînekanî bêt, yan le şêwazî pêşkeşkirdinî babetekey, yan le nawerokey, yan le her ruwêkî dîke.”¹⁵³ Destpêkirin û pêgehiştina edebê nivîsî ji peywendiyeka bineretiya edebê folklorî ye û karîgerbûn bi ewî edebî ve “çunkî ew edebe bûwe be binaxeyekî pitew bo ewey hemû beş û curekanî edebî nûsraw regez û binemakanî xwey le ser binyat binêt, lerûy form û nawerokewe, çunke zorbey zorî regezekanî edebî nûsraw le nêw edebî folklorî da bedî dekirêt û beşêweyekî perepêdiraw bepêy kat û serdemekan sûdî lêwergîrawe, her beser ew binemaye regezî nwêş hatute nêw edebî nûsrawewe.”¹⁵⁴ Belê bercestekirina vî edebî di nav edebê nivîsî da pêdivî ye nivîser dahênerane serederiyê digel da biket, çunkî edebê folklorî herdem pêdivî “beweye wek meydanaêkî geranî felsefî û mîtolojî û felsefî

¹⁵¹ Husên Xazî Kak Emîn Gelaleyî, Rewtî Nwêkirdinewey Şîrî Kurdî le Başûrî Kurdistan le Salanî (1980-1991)da, Weşanên Ekaemyay Kurdî, Hewlêr, 2010, r.117.

¹⁵² Ezîz Gerdî, Edebî Berawirdikarî, Korî Zanyarî Kurdî, Bexdad, 1978. r.37.

¹⁵³ Idrîs Ebdullah, Ferhengî Edeb û Roşnîbîrî Zarawe û Kesayetî, Weşanên el-Tefsîr, Hewlêr 2016, r.425.

¹⁵⁴ Keyfî Ehmed Ebdulqadir, Binyatî Hunerîy Destan le Edebî Folklorî Kurdî da, r.61.

û ciwankarî û zimanwanî û fîkirî bêt, ke taze kirdinewey ew deqane û bayexyan her lewê da debêt ke nûserî dahêner binyat naneweyekî manadarî dahêneraneyan legel da bikat”¹⁵⁵

Edebê folklorî her ji kevin da cihê girîngîdana nivîseran bûye, li dûv pêdiviya berhemên xwe û berçav wergirtina wan babetên bûyîne cihê rezamendiya civakî girîngî pêdaye, çunkî “wize û tuwanay dahêneran qayimtir dekat û beha ciwanekanî rabirdû be newey nwê despêrî.”¹⁵⁶ Herwesana Îdrîs Ebdulla derbareyê girîngiya vî edebî bo nivîseran dibêjît: “karî pêşyan behemû baş û xirabîyekî ... Binaxeyekî tukmew girîng e bo karî edebîman û hemîşe kun debê hewîn û sercawey lêhelêncanî dahênanî nwê û guncaw legel serdem bê, egîna karî bê binaxe temen kurt debê û, serincam ziyânî çend sere dedat”¹⁵⁷ Nivîser bo berhevkirina berhemekê zîndî û nemir û karîger di karît derbirînên nû ji edebê folklorî bixilîqînît, belê ji bo encamdana vî karî pêdivî ye nivîserî şarezayeka baş di vî edebî da hebe û bi hişyarî bi kar bînît. Aşkera ye ku zorbeya nivîserên cîhanî mifa ji vî edebî wergirtiye, bo nimûne “baştirîn nûseranî cîhan, pêşan û êştas, ewaney horî serkewtînyan tomar kirdûwe bo gewretirîn xelatî nawçeyî û nîştimanî (be nobilîşewe) birdotewe, ewanen ke hewîrî şakare şîrînekanyan be xweşawî folklor şêlawe, nimûneş: Markîz, Necîb Mehîfuz, Maksîm Gorkî, Se’dî Şîrazî, Resûlî Hemze Tuf, Goran.”¹⁵⁸ Ya baş ewe ku şêwazê bikaranîna edebê folklorî di nav edebê nivîsî da cure guncandinek di navbera wan da hebe, ji layê hizir û wate û mebest û rûxsarêve.

Derbareyê rengvedana edebê folklor li ser berhemên nivîserên cîhanî dê bi kurtî amajê bi çend nivîseran deyn, ewên berhemên wan keftîne jêr karîgeriya vî edebî. Li ser astê cîhanê “Wîliam Sihkespeare” bi yekem nivîser hatiye diyarkirin ku rengvedana edebê folklorî di nav berhemên wî da hebûye. Bonimûne di şanogeriya Melîk Lîr (King Lear) da, wî mifa ji çîroka folklorî ya “Sendirêla” wergirtiye.¹⁵⁹ Herwesana di edebiyata rusî da nivîserê rusî Yorî Sokolof ew çende daye diyarkirin ku nivîserên mezinên rusî karîne mifayekê baş ji vî edebî werbigirin bo dahînanên xweyên edebî, mîna nivîser Puşkîn, Korolonko, Tolstoy, Gorkî hwd.¹⁶⁰ Di nav têkstên nivîserên ereb da rengvedana

¹⁵⁵ Necat Hemîd Ehmed, “Kelepûr û Xwêndinewe” Asoy Folklor, j.1, Hewlêr 2005. r.18.

¹⁵⁶ Azad Heme Şerîf, *Mihemed Mewlud Memî Şakarnûs*, Weşanên Dezgay Çap û Belawkirdinewey Mukiryanî, Hewlêr, 2009, r.269.

¹⁵⁷ Îdrîs Ebdullah, “Folklor le Şîre Kurdîyekani Hacı Qadirî Koyî da”, Asoy Folklor, j.3, Hewlêr 2001, r.77.

¹⁵⁸ Belên Cemal, “Mirov Roley Jîngew Jîwerî Xuyetî” Asoy Folklor, j.36, Hewlêr 2008, r.50.

¹⁵⁹ Cîme Seyîd el-Rîfâî, *el-Mesûrat el-Şebiye, (el-Nezeriye we el-Tevîl)*, (bê tarîx), r. 65.

¹⁶⁰ Yorî Sokolof, *el-Folklor Qezayah Wetarîxeha*, Wer. Hilmî Şe’rayî we Abdulahemîd Hewaz, el-Heze el-Misirî ye, r.33.

edebê folklorî li ser edebê nivîsîyê erebî hebûye, yek ji wan nivîseran “Ehmed Şewqî” bû. Wî çîroka folklorî “Leyla û Mecnûn” yekem car ev çîroke serzarê xelkî komkir û di pirtûkeka serbixwe da bi şêwê şano peşkeşkir.¹⁶¹ Herwesa rengvedana vî edebi li ser nivîserê tirk jî heye. Mîna Yaşar Kemal, ku bi şêweyekî berbelav ev edebe di nav romanên wî de heye.¹⁶² Ev rengvedane li ser têkstên nivîserên fars jî hebû, yek ji wan nivîseran Nîzamî Gencewî bû. Ew damezrênerê çîroka şîra Leyla û Mecnûnê di edebê farsî da. Nîzamî mifa ji folklorê wergirtiye “em çîroke bew rêçkeyda debat ke nêzîke leşewey jiyan û xûruştî xuy lem cîhane da û cure rehayek lenêwan jiyanî xuy û rûdawekanî çîrokeke bedî dekirê”¹⁶³ Ev rengvedane li ser berhemên nivîserên kurd da jî heye, em dê li jêr sere babetekê serbixwe bi dirêjî behs bikin.

2.2. Hekarên Wergirtina Edebê Folklorî di Nav Edebê Nivîsî da

Çend hokarek hene dibine eger ku nivîser bi giştî penayê ji bo bikaranîna edebê folklorî biben di nav berhemên xwe da, girîngitirîn hokar li xwarê ne:

2.2.1. Hekarên Hunerî û Ciwankariyê

Layenê hunerî û ciwankariyê rolekê girîng û serekî di pêkhata edebê nivîsî da digêrin û ewn ciwanî û çêj wergirtinê didene vî edebî, anku her têkstekê edebî layenên hunerî û ciwankarî hene. Edebê folklorî ji layenên hunerî û ciwankarî û edebî ve dewlemd e; “wizew tewanay dahêneran qaymtir dekarat û beha ciwanekanî rabirdû benewey nwê despêrê û peyve sîhir amêzû teşqe efsaneyî û xûrafîyekaniş debîn be hewênî dahênanî ciwan û danisqew leber dilan xweş.”¹⁶⁴ Gelek caran rûdan û kesayetiyên folklorî dibine wêne û hêmayên hunerî û ciwankarî bo edebê nivîsî û ciwanyekê pê dibexşin. Yek ji meremên serekî yê bikaranîna edebê folklorî di nav edebê nivîsî da ji bo ewê çendê ye ku “rehendêkî ciwankariş be deqeke bibexşê, bewey beşêk le remz û amaje efsaneyan bixate nêw pêkhatay deqeke xwey.”¹⁶⁵ Herwesa edebê

¹⁶¹ Şehle, Kerîm Husên. *Karîgerîy Edebî Folklor le Şî'rekanî Medihet Bêxew da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoy Selaheddîn, Kolejî Ziman, Hewlêr 2015, r.31.

¹⁶² Himdad Husên, “Folklor Bincîneyekî Gewre ye, Girîgîpêdanîş Bayexdana bi Mirovatî,” Asoy Folklor, j.29, 2007, r.112.

¹⁶³ Xanzad Elî Qadîr, *Rengdanewey Leyla û Mecnûn le Edebî Kurdî da*, Weşanên Yekêtiya Nûseranî Kurd Melbendî Giştî 7, Hewlêr 2011, r.72.

¹⁶⁴ Sabîr Reşîd, “Mezrandînî Folklor le Romanî ‘Rêga’ ya Mihemed Mewlud Mem da,” Asoy Folklor, j.7., 2005. r. 4.

¹⁶⁵ Hêmin Umer Xweşnaw, *Şî'riyetî Deqî Çîrokî Kurdî*, Weşanên Wezaretî Roşenbîrî û Lawan, Hewlêr 2010, r.323.

folklorî “şîyanên gelek bilind ji layê derbirînê û ladanê û kartêkirinê ve didete şîrê.”¹⁶⁶ Wate nivîser ji bo bercestekirina layenên hunerî û ciwankarî di berhemên xwe da dikarît mifayekê baş ji edebê folklorî werbigirît.

2.2.2. Hekarên Civakî û Siyasî

Edeb bi şêweyekî giştî rengvedana civakî ye, wate “edeb guzarşit kirdine le komel.”¹⁶⁷ Lewra edeb û civak di peywendiyeka berdewamda ne, çunkî “serûkanîya tevaya edebiyatan civake. Edeb di nav civakê da ji bo civakî dihête nivîsîn.”¹⁶⁸ Nivîser rûdan û arêşeyên civakî dikene babet bo hêvênê berhemên xwe ku bi rêya wan berheman dikarin rexnê li hindek diyardeyên civakî û siyasî bigirin. Hebûna edebê folklorî ji bo nivîserî takerêk e bo derbasbûnê ji wê sansûra siyasî û civakî ya ku li ser hatiye sepanandin.¹⁶⁹ Wate nivîser dikarît bi rêya edebê folklorî xwe ji sansûrên civakî û siyasî biparêzît. Ew jî bi rêya bikaranîna hindek peyvên resen, vêca ev peyv çî efsaneyî bin yan kesayetî û rûdanên folklorî bin, evan mîna wêne û hêma di berhemên xwe da bi kar dînin, bi rêya wan peyam û helûyistê xwe radigehînin anku dişê bi şêweyekê nerastewxo rexnê li hindek diyardeyên civakî û siyasî bigirît. Herwesan gelek caran nivîser ji bo parastina ziman û dîrok û samanê hizrî yê netewa xwe, edebê folklorî di berhemên xwe da bi kar dînin û amajê pê didet, yan bo ji nav neçûn û windanebûna vî edebê, herwesan nivîser xwe li edebê folklorî dike xwedan, wan dubare zîndî dikete û dihînin bîra xwendevanî.

2.2.3. Hekarên Rewşenbîrî

Rewşenbîrî yek ji wan pêdiviyan e ku divêt nivîseran bi giştî hebe da ku berhemekê bihêz û karîger binivîsin. Lewra pêdivî ye nivîser ji bilî rewşenbîriya gelê xwe, şarezayî û agehdarî rewşenbîriya hindek netewe û gelên dî jî bin. Derbareyî vê çendê nivîserê kurd Merîwan Wiriya dibêjît: “roşenbîran tenha xwêndewaranî rojgarî xweyan nînin, belku xwêndewar û şitêkî dîkeşin.”¹⁷⁰ Ev çende jî sinorê rewşenbîriyê berfireh diket û

¹⁶⁶ Ehsen Seilîlanî, *Tewzîf el-Tiras fî el-Misreh el-Cezairî*, Nameya Doktorayê ya Çapnekirî, Camî'et Menturî Qîstentîne 2009-2010, r.17.

¹⁶⁷ Nahîde Husênî Ebdilrehman, *Layenî Siyasî û Komelayetî le Çirokên Hesên Qizilcî da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoy Selaheddîn, Kolejî Perwerde, Hewlêr 2010. r.72.

¹⁶⁸ Cihan İsmail Umer, *Şîret û Şîretkarî di Hozana Civakî ya Nalbendî da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Koleja Adabê, Dihok 2011.

¹⁶⁹ El-e'cile Hezîlî, *Tewzîf el-tiras el-şe'bi fî el-mesreh el-helqa el-cezairî mesrehîye el-ferab we el-salhin liweled Ebdulrehman Kaki*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Camî'e el-Mesîle 2009. r.19.

¹⁷⁰ Mihabad Azad Mihemed, *Wêney Roşinbîr le Romanekani Bextiyar Elî da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoy Selaheddîn, Koleja Ziman, Hewlêr 2009. r.83.

bitinê xwendevanî nakete pîver bo rewşenbîriyê. Anku em dişên bêjîn ku pêdivî ye rewşenbîr ne bi tinê şarezayî rojgar û serdemê xwe be, belku pêdivî ye şareza û agahdarê edebê folklorê gel û netewa xwe û neteweyên di yên cîhanê be. Bo nimûne “Gabreal Garcia Marquez, ageh e ji berhemên Kafkayî, James Joyce û Albert Camus, û efsane û çîrokên rojhelatî hebû, ji egerê vê yekê karîgerbû bi van hemî rewşenbîriya, evca wî şîya rêbazeka nû di sedê bîstêda binavê Realîzma Caduyî di nav romanên xwe da peyrew ket.”¹⁷¹ Herwesa Lay Mariyes edebê folklorî wesana didete diyarkirin ku “be watay roşenbîrîyê mîlî û lêkolînewey diyardey roşenbîrîye le komelgey şaristanyetda.”¹⁷² Wate edebê folklorê dibête beşekê girîng di lêkolînên rewşenbîrî da, ku bi rêya ewî em rewşenbîrî û şaristaniya gelan dizanîn. Her di vî warî da nivîser Xefûr Mexmûrî dibêjît: “le rastî da folklor beşêke le jiyanî roşnibîrîman û ta êstaş folklor karîgey xwoy mawe leser jiyanî ferhengîman, êstaş zor şakarî hunerî debînîn û hest dekeyn karîgerî folklorî besereweye, ta ke şakarêkî edebê dexwênînewe debînîn le jêr karîgerî têkstî folklorî nûsrawe, wate folklor berdewam karîgerî xwy heye û beşêke le jînî roşnibîrîman”¹⁷³ Wate edebê folklor dikarî bibête pirek ji bo rewşenbîrîyê di navbera gel û neteweyan da, ku bi rêya ewê nivîser agehdarî berhemên hevdu bin, ku bi vê çendê edebê folklor “şîkirdînewey peywendîy alugure roşnibîrîyekan”¹⁷⁴ di navbera gelan da. Wate edebê folklorî bikar dihinît ji bo pitir agehdarî ji rewşenbîriya gelê xwe û cîhanî be.

2.2.4. Hekarên Derûnî

Hekarên derûnî roleke girîng di pêkhata berhemên edebî da di binin. Wate “edeb û saykîlûjya temamkerên hev dane ji bo afirandina berhemê edebî, lewra gelek caran barê derûnî dibête eger ku hozanvan berhemekê edebî berhem bînît, anku ev barê derûnî cure îlhamekê bo nivîserî bigîştî û hozanvanî bi taybetî peyda dike.”¹⁷⁵ Wate derûnê nivîserî rolekê girîng di pêkhata berhemanda digêrît, nivîser bi rêya edebê folklorî “dikarin derûnê xwe pê aram biken.”¹⁷⁶ Gelek caran dorhêl û arîşeyên jiyanê kartêkirinê li derûnê nivîserî diken ku ji dorhêlî dûr bikevît û birevît, evca nivîser penayê dibete ber edebê folklorî ku têda pitir layenê rastî û zarokîniya xwe dibînît. Herwesan berev hizrên

¹⁷¹ Dariyo Bîyano - X.M Bîniyalîsî, *El-rîwaye el-isipanor el-emrîkiye mîn el-waaiye el-sihriye îla el-simanîyat*, Wer: Muhemed Ebo el-eta mesar, Mecilis el-e’la el-saqafe, (bê cih), 1991. r. 317.

¹⁷² Kesasî Cebâr, *Lêkolîneweyekî Edebî*, Weşanên Endêşe, Silêmanî 2015. r.89.

¹⁷³ Belên Cemal; Xefûr Mexmûrî, “Melbendî Serhildanî Heyran Deştî Qerac û Mexmûr û Kendênawe û Hewlêr”, *Asoy Folklor*, j.45, Hewlêr 2009. r.122.

¹⁷⁴ Kesasî Cebâr, *h.b.* r.92.

¹⁷⁵ Rêber Hisên Ebo, “Diyarda Xem di Hozanên Cegerxwînî da”, *Metîn*, j.202, Dihok 2011. r.176.

¹⁷⁶ El-e’cile Hezîlî, *Tewzîf el-tiras el-şe’bî fî el-mesreh el-helqa el-cezairî mesrehîye el-ferab we el-salhin liweled Ebdulrehman Kakî*, r.19.

efsaney diçît û bi rêya van hizir û hêmayên efsaneyê ew derûnê xwe aram dike. Wate “nûserî deq katêk remzêk, yan ziyatir bekardênî, deyewê rehendêkî derûnî taybet be ezimûnî hest û sozî xwy bidat, ke zorbeyan peywest û peywendîdarin be efsane û heqayete konekan û kesayetî û helwêstekan.”¹⁷⁷ Anku edebî folklorî dikarît bête dergehek bo nivîserî, ku bikarît bi rêya vî edebî derbirîne ji xem, arîşe, asteng û nexweşiyên xwe yên derûnî biket.

2.3. Rengvedana Edebê Folklor di Nav Edebê Nivîsî yê Kurdî da

Peywendiyeka bihêz û mukim di navbera edebê folklorî û edebê nivîsî yê kurdî da heye. Di vî warî da Fetahî Qazî dibêjît: “şair û nûser le bawêşî gel dêneder, folklorîş edebiyatî gel, kewabû folklor Leser şîr, çîrok, roman, rexne karîgerî tewawî heye. Ew aseware le boşayîda natwanin wedî bîn û helquln.”¹⁷⁸ Herwesan edebê folklor “xawenî xesletî hênde ciwane hergîz kon nabêt, û nîrx û behay xwy ledest nadat, her berhemêkî edebî folklorî bigirîn detwanîn çendîn car û lelayen çendîn nûserewe dubare û çendibare sûdî lêwerbigîrêt û, bebê ewey hîçyan le ciwanî ewey dîke kem bikatewe.”¹⁷⁹ Derbarey rengvedana edebê folklorî li ser nivîserên kurd çendîn nivîseran behs li vê rengvedanê kiriye û girîngî bi vê çendê daye. Ji wan nivîseran Îzedîn Mistefa Resûl dibêjît: “Şairî kurd ... Serî kirde ser samanî edebî folklorî û çûwewe naw xelk, bo ewey le ûşe û qisey rojanewe samanêkî gewrey taze peyda bikat û lenaw şîrî kurdî da zîndûyî û ciwanî bew wuşane bibexşêt.”¹⁸⁰ Herwesan Hîmdad Husên Bekir dibêjît: “her le dêrzemanewe edîb û nûseran hewlî eweyan dawê le berhemekanî xweyanda sûd le folklor werbigirin, diyare em sûdwerigirtineşyan le encamî hestkirdinyan bûwe be girîngî folklor wek keresteyek bo dahênanî mezin.”¹⁸¹ Her di vî warî da Eskerê Boyîk dibêjît: “dema mirov jiyan û afrandina helbestvanên kurd, yên here bi nav û deng û mezin re jî dibe nas, dibîne ku ji bo afradina wan çavkanîke here dewlemend zargotina me ya gelêrî ye... Bi hereket û şorta xwe nivîsarên xwe da ew hûr û kûr kirine, hineka jî ji bo afirandina xwe destanên gelêrî kirine bingeh.”¹⁸² Yek ji nivîserên di yên kurd derbareyî çawaniya vê rengvedanê dibêjît: “be remiz û efsanew destan û mêjûwewe bo ewey sûdiyan lêwerbigirin û derbirînî tazeyan Leser binyat binên û be jiyanî emiromaneweyan

¹⁷⁷ Hêmin Umer Xweşnaw, *Şîrîyetî Deqî Çîrokî Kurdî*, r.323.

¹⁷⁸ Şerîf Felah, *Roçneyek bo Edebî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan*, r.318.

¹⁷⁹ Keyfî Ehmed Ebdulqadir, *Binyatî Hunerîy Destan le Edebî Folklorî Kurdî da*, r.60.

¹⁸⁰ Îzedîn Mistefa Resûl, “Şîrî Tazey Kurdî”, *Roşenbîrî Nwê*, j.105, Bexdad 1985, r.200.

¹⁸¹ Umer Îbrahîm Ezîz Petî, *Folklorperweran Dedwên*, Weşanên Însîtîfî Kelepûrî Kurd, Silêmanî 2016. r.109.

¹⁸² Kovan Xankî, *Gotinên Mezinan di Hozana Cegerxwîn da*, Azadî, Dihok 2008. r.109.

bibestîwew mewdayekî ferawantir be berhemekaniman lem rêgayewe bibexşîn.”¹⁸³ Wate nivîserên kurd mîna çîneka rewşenbîr di nav civakî da di hemî serdemanda karîne mifay ji edebê folklorî bi hemî beşan ve werbigirin. Şengistê edebê nivîsî yê kurdî ji edebê folklorî ye, ev edebe bûye çavkanî bo nivîserên kurd. Di vêrê da dê vê rengvedanê li ser her yek ji şîra klasîk, nû û nûxaz û pexşana hunerî (çîroka hunerî, roman) ya kurdî bi çendîn nimûneyanve bideyne diyarkirin.

2.3.1. Di Nav Şîrê da

Şîr hêztirîn û karîgertirîn derbirîna mirovî bûye ku bi rêya wê mirovî hest û sozên xwe pê derbirîne. Wate “şîrî legel jiyan da be hemû mewdaw firawanî û qulîyekyewe le peywendiyekî diyalîkê da ye.”¹⁸⁴ Ta niha şîrê çî pênasên yekgirtî nîn, lewra her xwendegeheke edebî pênaseya xwe bo şîrî heye. Şairê kurd Şêx Nurî Şêx Salih bi vî şêwey hunerê şîrê didete nasîn û dibêjît: “dêbirîna hest giyanê kartêkirîyê hozanivanî ye... Pêdivî ye ew derbirîn bi xeyal û regezên rewanbêjiyê bihête tam dan.”¹⁸⁵ Her ji kevin da pitir girîngî bi nivîsîna şîrê dihat dan ji cureyên dîtirên edebî, lewra dê bînin ku peywendîyeka bihêz di navbera şîrê û beşên edebê folklorî da heye. Di vî warî da nivîser Roland Barthes dibêjît: “şîrî xwey birîtiye le dariştinewey efsane, yan berhemhênanî efsaney nûwê ye.”¹⁸⁶ Herwesan gelek ji beşên edebê folklor bi kêş û serwa dihatine gotin, lewra ev şêwaze pitir yê harîkar bû ku têkstên folklorî bi sanahî ji layê xelkî ve bihête ji ber kirin û belav kirin.

Niha jî dê hewil biden ku karîgeriya edebê folklorî li ser her sê qonaxên şîrî, anku yên klasîk û nû û nûxwaz a kurdî bi nimûneve bideyne diyarkirin.

2.3.1.1. Di Şîra Klasîk da

Şairên klasîk sererayê yasa û destûrên şîra klasîk, xwe ji edebê folklorî dûr nexistîne û di şîrên xwe da çendîn beşên edebê folklorî yên mîna efsane, destan, gotinên mezinan hwd. berceste kirine. Ev “regez û zarawe û çemke lêkciyakanî folklor, rastewxo û narastewxo le pêkhatey şîrekan da beşdarî deken, rolîkî berçaweş debînin le geyandinî peyamî şaireke da.”¹⁸⁷ Herwesan ji layê rûxsarê ve gelek caran şîra klasîk

¹⁸³ E.E. Şewnim, “Korri Şîrî Nwêy Kurdî”, Beyan, j.79, Bexdad 1982. r.113.

¹⁸⁴ Cemal Hebîbullah Bêdar, *Derwazey Şîrî Nasîn*, Nêrîn, Hewlêr 2013. rr.16-17

¹⁸⁵ Nîmetilla Hamid Nihêlî, *Deravek ji Rexnê*, r.38.

¹⁸⁶ Hawjîn Siliwe Îsa, *Binyatî Wêney Hunerî le Şîrî Şêrko Bêkes da*, Serdem, Silêmanî 2009. r.95.

¹⁸⁷ Idrîs Ebdullah, “Folklor le Şîre Kurdîyekanî Hacî Qadîrî Koyî da”, Asoy Folklor, j.3, Hewlêr 2001. r.76.

nêzikî şîira folklorî bûye û “hokarî em têkelawye, bo birgeybûnî şîirî folklor û beşêk le şîirî klasîkî kurdî degerêtewe. Kêşî zorêk le şîirî folklorî kurdî, debirgeyîn, kêşî beşêkî zorîş le şîirî fermî de birgeye.”¹⁸⁸ Ev çende jî ji egerên serekî bûn ku peywendî di navbera şîira folklorî û şîira klasîk da peyda bibît. Beşên edebî folklorî gelek caran bûyîne keresteyekê xav ji bo berhemên şairên klasîk, lewra eger em berê xwe bidene şairên klasîk ên kurd dê bînîn ku “helbestvanên wek Melayê Bateyî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî bi başî hay jê hebûye ji folklorî kurdî ku ji berhemên wan ên wek Zembîlfiroşî, Dim Dim, Qewlê Hespê Reş, Bersîsê Abid, Mem û Zîn ev yek diyar dibe.”¹⁸⁹ Çend şîirên klasîk ên kurdî kevtîne jê karîgeriya edebî folklorî.

Eger em bînin û bere xwe bidenê dê bo me diyar bît ku her ji kevin da edebî folklor ruhê gelan bûye û jêderê serekî yê edebiyata wan bûye, bo nimûne Ehmedê Xanî demê destana Mem û Zîn nivîsî, çîrokeka folklorî kire di çarçovê destana xwe da, ew çîrok jî ya berbelave bi çîroka Memê Alan, Xanî di vê destanê da hizrûbîr, felsefe û cîhanbînîna xwe tîkelî vê çîrokê kir, herweku şairî bixwe jî amajê bi vê çendê didet û dibêjît:

“Hindek ji fesaneyê di bohtan
Hindek di behane hin di bohtan”¹⁹⁰

“Efsaneyê botan” yanî çirçîroka Memê Alane ku li devera Botan gel digot û guhdarî dikir, “behaneyê Botan” yanî guhartin û li ser zêdekirinên wî ne.”¹⁹¹ Ji layekê dî ve “heke berê xwe bideyne kesên Mem û Zîna Xanî, dê bînîn her ew kesên ku di Mem û Zîna folklorî da hatîn, bitîne Xanî şeş kesê çiqî ku dewrê wan gelekî kême rakirîne, ew jî sê perî, babê Memî, wezîr, Bengîn, Sîfîya xîdam û çawîşê mîrî ne.”¹⁹² Herwesan Xanî her di vê şakara xweya edebî da ji bilî mifa wergirtin ji wê çîrokê, mifa ji çendîn beşên dîtiriyên edebî folklorî wergirtiye, bi şewê amajekirinê bi kar anîye. Bo nimûne dema ku amajê bi kesayetiye efsaneyî Rustemî didet û dibêjît:

“Her mîrekê wan bi bezlê hatem
Her mîrekî wan bi rezimê rustem”¹⁹³

¹⁸⁸ Elî Rezayî Hatemî, *Honrawey Folklorîyê Kelhûrîyê (Nawçeyê Kirmaşan)*, Wer. Fereydun Qenber Weysî, Weşanên Însîtîti Kelepûrî Kurdî, Silêmanî 2014. r.6.

¹⁸⁹ Ramazan Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Weşanên Avesta, Stenbol 2015, r.17.

¹⁹⁰ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Tehsîn Îbrahîm Doskî (amd.), Wezaretê Perwerde, Hewlêr 2005. r.342.

¹⁹¹ Kadri Yildirim û hindekên dî, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorî Kurdî*, r.39.

¹⁹² Hecî Cehfer, *Çend Vekolîn li dor Mem û Zîna Xanî*, Weşanên Aras, Hewlêr 2009. r.172.

¹⁹³ Ehmedê Xanî, *h.b.* r.54.

Dîsan di çend dêrekên dîtir da amajê bi efsaneya Xidirê Zindî didet û dibêjît:

“Naçar ji Xanî ew biderket
Ew da'ye xizir bû bi berket
Ew xizir çi bû? Teşewîqa dil
Ew şewq çi bû? Te'eşşuqa dil”¹⁹⁴

Herwesan di çend dêrekên dîtir da amaje bi herdu destanên Leyla û Mecnûn û Ferhad û Şîrîn didet û dibêjît:

“Leyla tuyî ez ji bo te Mecnûn
Gulgûn ji te ra srişkê purxûn
Ferhad ezim tu bo me Şîrîn
Seyla bi surîşkê cûyê şîrîn”¹⁹⁵

Yek ji şaîrên dîtir yên klasîkên kurd ku bi şêwê rasterast mifa ji çîrok û çîvanok û beşên dî yên edebê folklorî wergirti, Xanay Qubadî ye ku di navbera salên 1704- 1778 jiyaye. Ew di şakara xwe ya bi navê Şîrîn û Xusrew da nivîsiye “le binc û binawanda nawerukî em çîroke le hîkayetî milî netewekanî rojhelat wergîrawe.”¹⁹⁶ Wate Xanay Qubadî ji bo nivîsîna vê şakara edebî mifa yekê baş ji edebê folklorî wergirtiye, herweku di van çend parçe şîran da diyar dibe .

“Benam ew kes Şîrîn ermen
Peyda kerd Ferhad peyş bî bekoken
Her sub ta êwar pay (bêstûn)
Teqqey qulingiş yawa be gerdûn
Neraş çendîn çend cefa berdiş
Axir benakam erwa şiperdiş”¹⁹⁷

Şêweyekê dîtir yê rengvedana edebê folklorî di nav şîra klasîka kurdî da ew e ku şaîran bi tinê amaje bi beşekê vî edebî yan jî bi kesayetiyeka efsaneyî yan destanê hwd. daye. Di nav şîra klasîk ya kurdî da efsaneyên kurdî û biyanî bûyîne cihê bayexdana

¹⁹⁴ Ehemdê Xanî, *Mem û Zîn*, r.220.

¹⁹⁵ Ehemde Xanî, *h.b.*, r.253.

¹⁹⁶ Marûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, b.2., Wezaretî Perwerde, Hewlêr 2002, r.81.

¹⁹⁷ Marûf Xeznedar, *h.b.*, r. 91.

şairan û bi şêwê amajê naveroka berhemên xwe pê dewlemend kirîne. Bo nimûne di vê dêra li xwarê da şairî amaje bi keresteyekê efsaneyî Awî xizir daye, demê dibêjît:

“Siyapoş in le daxî xet û xal û lêw û rû û zulfit
Wenewşe û mîskî çîn û awî xizir û lalew û 'enber”¹⁹⁸

Destan bi şêwê amajedan di nav şîra klasîk da rengvedaye, bo nimûne Eliyê Herîrî (1530- 1600) di parçe şîrekî da amajê bi sê destanan didet, ew jî destana Leyla û Mecnun, Mem û Zîn Yusif û Zuleyxaye, dema ku dibêjît:

“Tu çêtir bûy ji leylayê
Şirîntir bûy ji zuleyxayê
Mem û Zîn herdu yek tayê
Siya zulfê kirim tala”¹⁹⁹

Yek ji şairên di ku çendîn caran amaje bi destanê dayî jî Melayê Cizîrî (1567- 1640) ye. Ew xwedanê yekem diwana şîra klasîk ya kurdî ya birêkûpêk e. Bo nimûne di dêrekê da amajê bi du destanan (Mem û Zîn, Ferhad û Şîrîn) didet û dibêjît:

“Mûyekî ez ji te nadim bi du sed Zîn û Şîrînan
Çi dibit ger tu hisêb kî me bi Ferhad û Memê”²⁰⁰

Şairên klasîk gotinên mezinan bi şêwê rasterast û amajekirinê di şîrên xwe da bi kar anîne, bo nimûne gotineka mezinan ya kurdî ji layê şairî ve bê destkarî û rasterast di vê dêra şîrî ya li xwarê da hatiye bikaranîn, dema şair dibêjît:

“Tenbelî karî hîz û bêxêre
Destî mandî le ser zikî têre”²⁰¹
Gotina mezinan di vê dêra şîra li serî da “destê mandî le ser zikî têre”

Biwêj mîna beşeke edebî folklorî di nav şîra klasîk ya kurdî da girîngî pê hatiye dan, bo nimûne herweku di vê dêra li xwarê da Nalî biwêjek bikaranîye, ew jî biwêjê “serseri” ye:

¹⁹⁸ Mehî, *Dîwanî Mehî*, Mela Ebdulkerîmî Muderîsî û Mihemedî Mela Kerîm (amd.), Weşanên Antîşarat Kurdistan, ç.3., Senendîc 1381. r.131.

¹⁹⁹ Marûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, b.2., r.152.

²⁰⁰ Melayê Cizîrî, *Dîwana Melayê Cizîrî*, Tehsîn Îbrahîm Doskî (amd.), Wezareta Perwerde, Hewlêr 2005. r.319.

²⁰¹ Şukiriye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, r.125.

“Em serserî bazane kewa hemserî bûmin
Muşkîl, bigene sa’îdî şahêkî wekû min”²⁰²

Şîra klasîk a kurdî bê behir nebûye ji karîgeriya edebî folklor, bi du şeweyan vî edebî kartêkirin lêkiriye. Şaîran bi şewê rasterast mifa ji serhatî û çîrok û destan û beşên dî yên vî edebî wergirtiye û kirîne hêvênê şîrên xwe. Di hindêk şîran da bitinê amaje bi beşên vî edebî daye ji bo bihêzkirina naveroka şîrê û parastina vî edebî ji navçûnê.

2.3.1.2. Di Şîra Nû da

Ew şîr e ku ji layê naverokê ve babetên dildarî, siyasî, civakî û nîştîmanî ne, ji layê rûxsarê ve kêşên xwemalî bikar dihînin. Wate “nûkirineka bineretî ye bo form û naveroka şîrê.”²⁰³ Şîra nû ya kurdî “li destpêkê gorankarî di naveroka wê da hatinekirin û paşan van gorankariyan berebere karkire ser rûxsara şîrê û rûxsara wê jî hatiye nûkirin.”²⁰⁴ Anku li destpêkê nûkirin li naveroka şîra kurdî da hatekirin paşan di rûxsarêda.

Peywendiya di navbera şîra nû û edebî folklorî da peywendiyeka mukim û bihêz e. “Edebiyat û şîrî folklorî kurdî, behoy geşe û dewlemendiye zorekey keheyetî, tewanîweyê karîgerîyê zor bikate ser edebiyat û şîrî nûwêy kurdî le sedey bîstemda.”²⁰⁵ Herwesên dêrbareyê vê peywendiyê Rehber Mehmed Zade dibêjît: “şîrî kurdî le qonaxî yekemda be gerranew bo formî şîrî folklorî nûwê buwewe.”²⁰⁶ Bi vê çendê edebî folklorî bi jêdêrekê serekî yê şîra nû ya kurdî dihête hejmartin, çunkî edebiyata klasîkî ew karîgerî nebû li ser şîra nû ya kurdî. Lewra edebiyata klasîkî ji layê rûxsarêve kêşa eruzî û zimanekê mecazî bikar dihîna û di çarçovekî dînî û tesewîfî û xezelê da bû.

Şîra nû kariye gelek mifayî ji edebî folklorî bînît, Lewra “beriztirîn girove bo diyarkirina çakiya hozana nû û peyv û reseniya wê bikarînana folklorî di nav hozanê da.”²⁰⁷ Wate div ê qonaxa şîrî da şaîran hêmayên folklorî bi kar dihînan ji bo pitir

²⁰² Nalî, *Deqî Dîwanî Nalî*, Eyatullah Hewawî Neseb (amd.), Weşanên Antîşarat Kurdistan, Sine 1385. r.93.

²⁰³ Çinar Sedîq Xazî, *Arastên Teknîkî di Şîra nû ya Kurdî da-Devera Behdînan Bedîrxan Sindî weku Nimûne*, Weşanên Dezgay Spîrêz, Hewlêr 2008. r.49.

²⁰⁴ Cihan Ebdulwehab Ehmed, *Kamiran Bedîrxan û Nwêkirinewey Şîrî Kurdî*, Xanî, Dihok 2011. rr.72-73.

²⁰⁵ Elî Rezayî Hatemî, *Honrawey Folklorîy Kelhûrîy (Nawçey Kirmaşan)*, r.60.

²⁰⁶ Şerîf Felah, *Roçneyek bo Edebî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan*, r.318

²⁰⁷ Wesfî Hesên Ridênî, “Karînana Folklorî di nav Hozanê Mizûrî da”, Karwan, j.15, Hewlêr 1983. r.17.

dewlemend kirîna naveroka şîrê. Bo nimûne dema behsê xweragiriyê dikir da Kela Dim Dim mîna hêma bi kar bînît ku ev hêmaye dêrbirînê ji xweragiriyê dike.

Li vêrê dê hewil biden çend nimûneyan li ser rengvedana edebê folklorî li ser şîra nû ya kurdî da diyar biken, bi tinê dê amajê bi yek mînak biden.

Yek ji beşên edebê folklorî ku bi şeweyekê berbelav di şîra nû ya kurdî da hatiye bikaranîn efsane bû, bo nimûne herweku di vê şîra li xwarê hatî:

“Ke sîzîfî endêşey min
Lutkey 'umirî dabîn dekar
Taşberdêkî dî dênê
Bocî yetî û bo kwêy debat?”²⁰⁸

Yek ji wan şairên dî yên kurd ku rengvedana edebê folklorî bi şeweyekê berbelav di şîrên wîda diyar Cegerxwîn e. Ew wek folklorinasekê kurd dihête hejmartin, lewra edebê folklorî bûye kerestekê serekî bo şîrên wî, navhatî di şîreka xwe da amajê didete destana kurdî ya bi navê Şîrîn û Xusrewê û tîkelî mebesta şîra xwe diket û dibêjît:

“Çi cejne ku nebênim
Bi van çavan sîmen sayê?
Şîrîn û xu xusirwarin da
Nizanim ka çîman nayê?”²⁰⁹

Rûxsarê şîra nû rêxweşkerek bû ku edebê folklorî bi kar bînin, herweku di vê şîrê da diyar:

“Hebu .. Nebû
Li pala gundê me yê biçûk..
Çiyayekê bilind hebû.
Spêdeyekê rîya xezalekê vêket..
Îdê ji 'eşqa wê xezalê..
Çiya şîn bû..
Têkda bû gul!
Xezal di himbêza wî da ma.
Êvariyeke nêçîrvanek hat û

²⁰⁸ Hesîb Qeredaxî, *Ferhengî Xem (3)*, El-Rîsale, Bexda 1989. r.111.

²⁰⁹ Cegerxwîn, Hêvî(Dîwana 7an), Weşanên Avesta,Ç.4., Stanbol, 2008, r.14.

Xezal ji çiyayê me vebû”²¹⁰

Hebû.... Nebû ev destewaje ye, destpêka çîroka folklorî ya kurdî ye û dêrgehê çûna nava çîroka folklorî ye. Her çîrokeka folklorî bi vî destewajêyê dest pê dike. Şaîrî ev destewaje kiriye destpêk bo şîra xwe. Ev şîre bi şewazê çîrokekê nivîsiye.

Herwesan Ebdilrehman Mizîrî şîreke xwe li ser şewazê heyranokan nivîsiye, wate ji bo şîra xwe mifa ji şewazê heyranokê wergirtiye, ku cureyekê stranê yê berbelave. Herweku di vê şîrê da diyar, dibêjît:

“Kiçê dînê

Kezyêd te, Zê û Xabîrin

Çavêd te, dêriya urmê û ..

Wana kwîrin

Sala li duf salê dibezît

Helim û bêna teya pîruz..

Dem û gavê,

Min lebîrin

Kurko dîno

Bejna te, bejna memo ye

Tîra te, ji darê mikomê

Çiyakê metînw..

Bemoye

Ma tu nizanî dêrgehê

Dilkê min 'Ebdila xudê

Bu mêvankirina vîna te,

Herê vekirî û vebûye..?!”²¹¹

Yek ji şaîrên dî yên ku destekê bala di vehandina şîra nû ya kurdî da hebûye Ebdulrehîm Rehmî Hekarî ye ku kariye edebê folklorî di nav şîrên xwe da berceste biket. Herweku di vê şîra li xwarê dagotineka mezinan bi şeweyekê rasterast bi kar anîye, dema ku dibêjît:

“Destê tenê deng jê nayet

Ey milletê sahib nîfaq

Lazimbû ji bo te îttîfaq

²¹⁰ Mueyed Teyîb, *Stran û Befîr û Agir*, Weşanên Pirtûkxana Cizîrî, ç.3, Dihok 2009. r.119.

²¹¹ Ebdulrehman Muzîrî, *Li Xelkî Tehlê li Min Şîrînê*, el-Hewadis, Bexdad 1987. rr.8-9

Tesîs nekin em yek wîfaq
Mehuyete bîlittîfaq;
'Eqlê xwe berhev ken hemî!'”²¹²

Şaîrî gotineka mezinan kiriye navûnîşan bo şîra xwe, ew jî gotina “Destê tenê deng jê nayet”. Ev gotin bûye hêvênê babet û naveroka vê şîrî ku ew jî bangê yekgirtinê ye. Wate vê gotinê guncandineka baş digel naveroka vê şîrî heye.

Biwêj di şîra nû da bi şeweyekê berbelav hatiye bikaranîn, şaîran hewil dayîne ku bi rêya biwêjan şîra xwe bihêz biken, bo nimûne Bedirxan Sindî di şîreka xwe da pena biriye ber biwêjê ji bo pitir dewlemendkirina naveroka şîra xwe û dibêjît:

“Bajêr dibêjt
Rêvîng û hev rêka min
Dilên şikestî û evîndar
Û belaxeta bê dengiyê
Zaruyên di xewna da yariyên xuş dibînin
Zaruyên dxewna da bitinê di xewna da (Bajêrê Xewna)
Dibînin”²¹³

Di vî şîrî da (Dilên Şikestî) biwêj e, bi rêya vê biwêjê naverok û mebesta vê şîrî bihêztir bûye.

Metel mîna beşekê berbelavê edebê folklorî, girîngî û taybetmendiya xwe di şîra nû ya kurdî da heye. Yek ji wan şaîrên destekî bala di berhevkirina metelê da heyî Goran e ku mîfa ji şewazê dirustkirina metelê wergirtiye, bi şewazê şîrî amadekiriye bo nimûne dema dibêjît:

“Metelî bedikar le hewt pît pêk dê
Najî wek esp xwênî xelk nemjê

Yek û dû destê, pênc û şeş û hewt
Bawêş ekirê hawînan ke xewt

Pênc û şeş, sê û het le awrîşm edirê
Le xerman hewt, sê, yekî pê ebirrê

²¹² Ferhad Pîrbal, *Ebdulrehîm Rehmî Hekarî û Tazekirdinewey Şîrî Kurdî û Dahênan Şanoname le Edebiyatî Kurdî da*, Wezareta Perwerde, Hewlêr. r.16.

²¹³ Bedirxan Sindî, *Hozanê Min*, Weşanên Pirtûkxana Cizîrî, Dihok 2009. r.264.

Pênc û çwar usêy rinc eba wek ba
Wek pênc û dû sê û yek le ser eda

Eger helbênî metel nasaz
Nizanit bo ekem bibî serferaz”²¹⁴

Bersiva vê metelê dibîte “derebeg”²¹⁵

Yek ji çavkaniyên serekî yên şîîra nû ya kurdî bi hemî beşên xwe ve edebê folklorî ye. Ji layê naverokê ve hindêk beşên vî edebî mîna efsane, destan û çîrokê hwd. bûyîne hêma û cevenk bo şîîrê, ji layê rûxsarê ve ciwankariyek daye têkstê vê şîîrî.

2.3.2. Di Pexşana Hunerî da

Herçende babetê vekolîna me yê taybet e bi edebê folklorî di şîîrê da, belê pexşana hunerî ya kurdî wekî beşeke girîng û berbelav ê edebe nivîsî ye. Lewra me bi fer dît bi kurtî amêje bideyne rengvedana vî edebî di pexşana hunerî digel berçavkirina çendîn nimûneyan.

Pexşan ew alav e ku bi rêya wê mirov hizr û bîrên xwe der dibirît. Pexşan yek ji curên edebî ye ku li serdemên kevin peyda bûye û geşekiriye ta ku gehîştîye wê asta evro têda. Pexşana hunerî ya kurdî di nav edebê kurdî da direng peyda bûye li hemberî şîîrê, geşekirina wê digel dêrçûna yekem rojnameya kurdî bûye.²¹⁶ Pexşana hunerî çendîn pênase bo hatînekirin ji layê nivîser û rexnegiran ve, ji wan jî nivîser Ezîz Gerdî dêrbareyê pexşana hunerî dibêjît: “em cure pexşaneyê ke nûserekey bayexî be dêrbirînî hest û soz deda û hewil be şêwazêkî edebî berz ew hest û soze dêrbibirî. Em cure pexşane kesêti nûsereke pêşan deda.”²¹⁷ Pexşana hunerî, layenî hunerî û şêwazî edebî bi ser da dizalin. Ji layê rûxsarê ve pexşana hunerî çendîn dabeşkirin ji layê pispore û şarezayên edebî ve bo hatînekirin û dabeşî dû cura kiriye, pexşana serwadar ya ristên wê bi serwa dûmahîk dihên û pexşana asayî dibê serwane.²¹⁸

Rengvedana edebê folklorî li ser pexşana hunerî ya kurdî heye. Herwekî nivîser Selah Umer dan bi wê çendê didet û dibêjît: “min xwem gelê beşî hîkayetî beragirdanî

²¹⁴ Mihemed Mela Kerîm (amd.). *Dîwanî Goran*, Weşanên Panîz, ç.5. Tehran 1393. r.392.

²¹⁵ Mihemed Mela Kerîm (amd.). *h.b.*, r.397.

²¹⁶ Mistefa Salih Mistefa, *Hunerekanî Pexşan le Govarî Zarî Kirmancî da (1926- 1932)*, Roşenbîrî, Hewlêr 2011. r.84.

²¹⁷ Ezîz Gerdî, *Pexşanî Kurdî*, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr 1987. r.5.

²¹⁸ Ezîz Gerdî, *h.c.*

folklorîm le çîrok û romanekanim da bekarbirdûwe, belam beşeweyek wek xwey û aw têkel bikirên û bonî tazew tamî taze bibexşîn.”²¹⁹ Wesa dîyar e ku her nivîserekî li dûv pêdiviyatiya têksta xwe û şarezayî wî ji dewlemendiya vî edebî di têkstên xwe da ev edebe bi kar îname.

2.3.2.1. Di Çîroka Hunerî da

Çîrok yek ji cureyên edebî yên girîng û berbelav e, bi şewazê pexşanê dihête nivîsîn û vegêran. Çîrok bi ser çend curan da dabeş di be ew jî: kurteçîrok, kurtîle çîrok, çîroka gelek kurt.

Peywendiya di navbera çîroka hunerî û edebê folklorî da ji her cureyekê dîtir ê edebî kevintir û bihêztir bûye. Serûkaniya çîroka hunerî “le mindaldanî efsane û hîkayete mîlîyekanî wek: Hezar û Yek Şew, Dîkamîron, Odîsse, Elyaze û Enyade û hemû ew hîkayete mîlîyaney lay mîletan belawbotewe û le dayik bûwe.”²²⁰ Wate çîrok li destpêkê hîkayet û efsaneyên folklorî bûye, ev hîkayet bi şeweyekê berbelav di nav xelkî da bi şewazê çîrokê dihatine vegêran, paş borîna demî û guherîna barodûxa li cîhanê, pêşkeftin di van beşên edebê folklorî da peyda bû û bû hunereke edebî. Çîroka hunerî ya kurdî mîna hemî curên dî yên edebê nivîsî, keftiye jêr karîgeriya edebê folklorî, herweku nivîser Sabîr Reşîd amajê bi wê çendê didet dema ku dibêjît: “destanî mîlî û heqayet warîqat û serbirde û gelêk tomarîtir debîn be fantaziya û feza û babet û çîrokeke dexene qalibêkî îstatîkîtir û emaneş hemû behoy behre û hizir rowanînî felsefyane û agadarî le teknîkî niwê dêne berhem.”²²¹ Wate di vêrê da dê amajê bi çend çîrokên hunerî yên kurdî deyn ên ku edebê folklorî têda rengvedane. Rengvedana efsaneyê di nav çîroka hunerî da ji bo gelek mebestan dihête bikaranîn, bo nimûne di kurteçîroka “Pawan” da çendîn cara balindê efsanewî “Sîmerx” hatiye bikaranîn, herweku çîroknivîs dibêjît:

“Şivan siyar bo, sîmerx blind firî, ji deşt û dol û nihâl û çiya û rûbar û...

Bilindtir lê hat, ha nêzîk bo da bi nav ewran kevît, dunya ciwan dît, gelek ciwan dît, paş gote sîmerxî:

Sîmerx û.. Min bo cara dûmahiyê li hindavî waran û li ser serê çiya bigêre.

²¹⁹ Mihemed Se'îd Kurde, “Peywendî Nêwan Kelepûr û Edeb”, Asoy Folklor, j.12., Hewlêr 2005. r.77.

²²⁰ Seywan Mihemed Tahir Se'îd, *Binyatî Hunerî le Çîrokekanî Dîktor Kawş Qeştan da*, Nameya Master ya Çapnekirî, Zankoy Silêmanî, Fakeltî Ziman û Zanîste Mirovayetiyeke, Skolî Ziman Beşî Kurdî, Silêmanî 2013. r.12.

²²¹ Sabîr Reşîd, *Çîrokî Kurdî*, Weşanên Nawendî Awêr, Hewlêr 2016, r.111.

Sîmerxî xo nizim kir û bire hindavî wan berk û beten û çolên lê şivanî
dikir.”²²²

Di çîroka hunerî da girîngiyeka taybet bi destanê hatiye dan, bi çendîn şêweyan di
çîrokê da reng vedaye, mîna amajedan bi destanekê yan bi qehremanekê wê yan jî mifa
ji naveroka destanekê wergirtiye û çîrokek pê dariştiye. Bo nimûne di çîrokeka “Xewna
Xanê Lepzêrîn” da mifa ji destana “Kela Dim Dim” hatiye wergirtin, parçeyek ji têkstê
çîrokê wesa ye:

“Nîvroyeka germ bû, Xan- pêş bibite xanê Lepzêrîn- li ser kana piştê dibin
kûnê xove razabû, lêvên kûnî pîçekî helday bûn, da ku hinde bayê hîn
dêrbaskin... Her zû xewê çavên wî girtin, û di xeweka giran da çû, û xewn
dîtin...”²²³

Navûnîşanê çîrokê, navê qehremanê destana “Kela Dim Dim” ya kurdî ye, ew jî
Xanêlepzêrîn e. Rûdanên vê destanê bûyîne hêvên bo babetê vê çîrokê, wate çîroknivîsî
ji bo naverok û babetê çîroka xwe mifa ji vê destana folklorî wergirtiye.

Çîroknivîs ji bo bihêzkirina çîroka xwe bi çendîn şîweyan penayê dibete ber çîrok û
çîvanokên folklorî, her weku di vê çîroka li xwarê da:

“Li koçka te deng, her denge Reşoyî bû ... Pelewan jî her Çeto û Qasimê
Meyroyî û Emê Gozê û Şêxê zirav bûn. Te jî bes bo dene Reşoy tewî
vedidan û dîwana dişariya.”²²⁴

Stran û çîrokê peywendî û karîgeriyeka bihêz û kevnar bi hev ra heye, her di
serdemên destpêkê anku di çîrokên folklorî û şûn da heta ku ev karîgeriye hatiye
veguhaztin bo nav çîroka hunerî, mîna teknîkek di çîroka hunerî da dihête kirin û tam û
çêjeka taybet dete çîrokê, bo nimûne her weku di vê çîrokê da hatî û çîroknivîs dibêjît:

“Ew demt le hemû demê le dilda xoştir û şîrîntir bû, katêk xuda da be pêşî şaîyekeda
degera û dengî lê heldeprê, be to buwaye dest bernedey, bewîş buwaye zarî lêknênê.

Sincanê û sincanê

Sincanê herîre

Paw pûzî penîre

²²² Xalid Salih, *Cemserê Siyê*, Weşanên Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok 2005. r.73.

²²³ Segvan Xelîl Hîdayet, *Rojeka Germ*, Xanî, Dihok 2014. r.166.

²²⁴ Mihemed Selîm Sîyarî, *Babê Mino*, Weşanên Wezaretê Rewşenbîrî û Lawan, Herêma Kurdistan,
2010, r.51.

Qabîl be kure mîre
No mirdûm legor bê
Kîçeke tom lebîre.”²²⁵

Sincanê straneka folklorî ya kurdî ye, ev stran ji bo govend û dawetan dihête gotin, çîroknivîsî bi rêya vê stranê rûdanên çîrokê yên nexweş, zivirandîne bo rûdan û bîrhatinên berê yên xweşî û şahiyê.

Bikaranîna gotinên mezinan di çîroka hunerî da ji layê çîroknivîsan ve bi şêweyekê berçav di têkstên wan da diyar dibe, ji bo dewlemendkirina naveroka çîrokên xwe, çunkî gotinên mezinan di xwe da naverokên dewlemend in, çîroknivîs bi gelek şêwazan gotinên mezinan di çîrokên xwe da bi kar dihînin, herweku di vê çîroka li xwarê da hatî, belê çîroknivîsî cih guherîn bi hişyarî di astê peyvêda kiriye û kartêkirin li wateya gotina mezinan nekiriye, dema ku çîroknivîs dibêjît:

“Heçko bişkoja nêrgiza ji bin keviyên latên metînî serhildayî bêhin diket.
Çawa wê rojê dilê wî dîlîr bû, evro ‘heman war e, lê ne ew bihar e’ şikestin
û perosîya di çavan da, rengvedana axînk û keserên dilan e, piştî cejnê bû
...”²²⁶

Gotina mezinan ya di vê çîrokê da hatî, bi vî şêwey ya berbelave “ew ware, lê ne ew bihar” e.

Biwêj mîna beşekî edebê folklorî bi şêweyekê berbelav di nav têkstên çîrokên hunerî da ji bo mebestên cuda cuda ji layê çîroknivîsan ve hatiye bikaranîn, mîna di çîroka “Tabût” da hatî, demê çîroknivîs dibêjît:

“Eve çend sal li servê xêrê ra dêrbas bûn û çendîn cenaze bo goristanê pê hatîne veguhastin!
Dê bese dê? Ma xêra te hêka dîkilî ye, tabûteka dî ya baştir dirust bike, baştir di ber karê xwe ra here.”²²⁷

Biwêj di vê çîrokê da “hêka dîkilî” ye.

Rengvedan û mifawergirtina edebê folklorî di çîroka hunerî da, ne bitinê ji layê naverokêve, belku çîroknivîsan mifa ji şêwazê edebê folklorî jî wergirtiye. Herweku mifa ji pêkhata metelê hatiye wergirtin, di metelêda pêşekî, pirsîyar û bersiv hene.

²²⁵ Mihemed Ferîq Hesên, *Ku Çîrokî Sêberî Espeşî*, Kameranî, 1978. r.48.

²²⁶ Mihsin Ebdilrehman, *Baxwere*, Weşanên Yeketiya nivîserên Kurd, Dihok, 2009. r.112.

²²⁷ Ebdilrehman Bamernî, “Tabût”, *Evro*, j.1998, Dihok, 2016. r.10.

Çîroknivîs kariye mifayê ji çawaniya dirustkirina metelê werbigirît, herweku di vê çîroka li xwarê da hatî, dema çîroknivîs dibêjît:

“Bab difroşît û mêr ser berdayî biket û bira dikûjît û civak çepila bo lê didet, jin ... jin e.”²²⁸

Çîroknivîs kariye bi helwesteke rexneyî beramber diyardeyeka civakî di qalibê metelê da mebesta xwe bigehînit. Bersiv jî “jin” e.

Pêkenok jî di çîroka hunerî da têne bikaranîn. Eger lênêrînekê li çend çîrokan biden dê bînîn pêkenok jî mîna hemî beşên di yêr edebê folklorî cihê xwe di nav têkstê çîroka hunerî da kiriye, bo nimûne di çîroka bi navê “Kifnê Pîrê” da hatiye gotin:

“Rebena xudê gelek gotinên nivêjê berovajî digotin. Gelek di kenî gava digehiştê tehiyatê, ne dizanî bxwînit, tinê digot ‘hoy hoy nebiyo wey ez gorîwû.’ Tu ji keniya de şîn dibûyî.... Tu da bi kenî çî bêjiyê pîrê, tu ya demê Deqnenûsî û di bit bîra tebêt hêştê Xwedê çiya çenekirîn, di bit te Eskenderê Zulqirneyîn dîtibit, da kenî û bêjît hey kurê çêlê min Eskendêr nedîtibû bes yêr dîtîn behsê wî bo me dikirin.”²²⁹

Ji van mînakên li jorîn jî bi awayekî aşkira wesa diyar e ku çîroka hunerî mîna hemî cureyên dîtirên edebî nivîsî keftiye jêr karîgeriya edebê folklorî û piraniya beşên edebê folklorî têda rengvedayîne.

2.3.3. Di Romanê da

Roman yek ji wan cureyên edebe ye ku bi şewazê pexşanê dihête nivîsîn. Di ferhenga Oxford da, bi vî şewey hatiye pênasekirin “roman çîrokeka dirêja pexşankî ye, bi qebareyê pirtûkekêye, dêrbarey ruydaneka endêşeyî yan ya mêjûyî ye.”²³⁰ Di serdemê niha da roman bi cureyekê karîger û bihêzê edebî dihête hejmartin. Di romanê da wêneyê jiyana mirovî dihête kêşan, anku di şîyan da ye bêjîn ku roman rengvedana barûdoxên jiyana mirovî ye. Roman cureyekê edebî yê berifreh e, lewra ev çende hemî dibine rêxweşkerê ku romanivîs penayê ji bo bercestekirina edebê folklorî di nav romanên xwe da biben û mifayê ji edebê folklorî werbigirin. Çunkî romanivîsî “boy

²²⁸ Mihsin Ebdilrehman, *Mirin di Qeşeleya Padişahî da*, Weşanên Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok 2006. r.66.

²²⁹ Îsmâ'îl Silêman Hacı, *Kifnê Pîrê*, Weşanên Yekîtiya Nivîserên Kurd/Dihok, Dihok 2013. rr.6-8.

²³⁰ Oxford Advanced Dictionary of Current English, 3th Edition, Oxford University Press, Oxford, 1989, p.843.

heye, pena bo efsane û folklor û efsun berî -zorîş pêwîste- heta bîkate amirazî hunerekey, bew hîwayey, le riwangey xweyewe helyansengênî û ... lêkdaneweyekî serdemaneyan ‘esrî’ pê bibexşê be pêçwaneyîş, be tenya gêranewe û tomarkirdinî heqayet! Kem bir deka lewey mêtû zanêk yan twêjerêk yan nejad nasêk bîkat.”²³¹ Lewra romannivîsan ji bo dahênanên xwe yê edebî û hunerî hwd. mifayekê baş ji edebê folklorî wergirtine.

Her curekê edebî li dûv hez û arezû û pêdivîyatên xelkî di serdemên curbicur da peyda dibin, belê ji bo razîkirin, wergirtin û pesendikirina her janrekê nû yê edebî pêdivî bi ziman, zanyarî, xeyal û efsaneyê heye. Ev çende jî bi şîweyekê berbelav di nav edebê folklorî da berceste dibe, lewra edebê folklorî girîngî û taybetmendiya xwe heye bo janrê romanê, lewra “hunerî romannûsîn ke pêwîstî be wize û dahênan û ziman û zanyarî û hemû cure zanyariyekanî dîke heye. Pêwîstî be sîhir û feza û cîhanên firawan heye ... Diyar e em hemû serçawaneş le dinyay folklor da her le mirovî berayîda hebûwe, ew mîleteş ku em samane neteweyey xwey de kate serçawe le dinya da pesnid û nasrawe û twanîwyetî taybetmendî xweş be dinya binasênî.”²³² Wate roman jî mîna her cureyekê dîtir yê edebê, karîgeriya folklorî li ser hebûye û mifa jê wergirtiye, anku edebê folklorî binyatek bûye, ku roman li ser bihête avakirin. Rengvedana edebê folklorî di romanê da dibête hêzek bo têkstê romanê, bi rêya “mezrandinî babetekanî efsane û pend û babete folklorîyekanî dîke le botey deqî roman da, rolêkî girîng le dewlemend kirdinî edebî netewayetîyda degêrît bekarhênanî efsane mîna hêmayek û wêne û remzêk ke têkel be binyadî deqeke kirabêt, be yekêk le regeze serekîyekanî romanî nûwê dadenirêt.”²³³ Romana kurdî jî mifayekê baş ji edebê folklorî wergirtiye û pê karîger bûye, herweku romanivîsê kurd Ebdulla Serac dibêjît: “reh û rîşalên romana kurdî di gehîne ser efsane û hikayet û destanên folklorî.”²³⁴ Bi gotineke dî edebê folklorî rolekê serekî û girîng hebûye di peydabûna romana kurdî da.

Ji bo destnîşankirina çend nimûneyên bikaranîna edebê folklorî di romanên kurdî da, dê hewil biden ku amajê bi çend nimûneyekan biden. Herweku romanivîs Bextiyar Elî di romana xweya bi navê “Diwayîn Henarî Dunya” da, amajê bi balindeyê efsaneyî “sîmerx” didet û dibêjît:

²³¹ Ebdulla Serac, *Peyivistan*, Weşanên Komeley Ronakbîrî û Komelayetî Kerkuk, Kerkuk 2013. r.383.

²³² Sabîr Reşîd, “Mezrandinî Folklor le Romanî ‘Rêga’ ya Mihemed Mewlud Mem da”, r.4.

²³³ Ebdulla Rehman, “Teknîk le Romanî Dwanamey Diwerek”, Raman, j.147, Dihok 2009. r.76.

²³⁴ Ebdilrehman Başa, *El-Rîwaye el-Kirdiyye*, Weşanên Dar Aras li tibae w el-Neşr, Erbil 2010. r.43.

“Ew mindalane çote rohmewe û nayete dêrê wazî lêbihêne babirwat, ba swarî keştiyekî biken bîben, siwarî baldarêkî wek sîmirixî biken û bîben, to hîçt bo Akrê.”²³⁵

Romanivîsî mifayekê baş ji vê efsaneyê wergirtiye, kariye guncandineka baş di navbera vê efsaneye û naveroka têkstê romana xwe da biket.

Romanivîs Erebe Şemo di romana xweya binavê “Dim Dim” da mifayekê baş ji edebê folklorê kurdî wergirtiye, her ji navûnîşanî û naveroka wê amaje bi destaneka folklorî ya kurdî daye, ew jî destana qehremanya “Kela Dim Dim” e; nimûnek ji têkstê vê romanê navbirî dibêjî:

“Wê sibehê piltek ewr ji ser çiyê dêrket, li ser Kela Dim Dimê, hebekî baranê reşand, toz xûbar bi erdê de kuta û dîsa vekir. Tava xweş vê biharê dîsa pencê xwe da erdê. Vê baranê bêhin û buxwa hewayê hê pak kir. Ji baran û sare em kurd dibêjin: daweta gur û rovi yê.”²³⁶

Romanivîs ji bilî amajedan bi destana Kela Dim Dimê, biwêja “daweta gur û rovi” yê bikaranîye. Ev biwêj di nav civakê kurdî da gelek ya berbelav e, bi taybetî di nav xelkî gundnîşîn da. Ev biwêje li ewî demî dihête gotin, demê baran dibarî û dinya hetav be, dibêjine vê çendê daweta gurgane.

Roman û çîroka folklorî ji layê rûxsar û naverokê ve çendîn xalên hevpişk hene. Romanivîsan li dûv şarezayî, şîyan û pêdivîyatên berhemên xwe têhnatiya xwe dişkênin. Bo nimûne di romana “Janên Sînahî” da, romanivîs li ser zarê “Sofî Îsivî” vedigêrî:

“Hebû nebû kesek ji Xudê mezintir nebû, kesek ji benîya direwîntir nebû, dibêjn: li zemanekê du kiç û kur, piştî eşq û vîneka dirêj gehîştine mirada xu...”²³⁷

Di vî têkstî da romanivîs kariye mifayê ji destpêka çîroka folklorî “hebû nebû kesek ji xudê mezintir nebû” werbigirî, di cihekê guncayî da bi kar bihînt.

²³⁵ Bextiyar Elî, *Dwahemîn Henarî Dunya*, Renc, Silêmanî 2002. r.259.

²³⁶ Erebe Şemo, *Dim Dim*, Lîs, Amed 2007. r.15.

²³⁷ Tehsîn Navişkî, *Janên Sînahiyê*, Weşanên Yeketiya Nivîserin Kurd, Dihok 2005. r.95.

Romanivîsê navbirî penayê di beteber beşekê dîtir yê edebê folklorê, bi destewajeya “tiştê mino tiştê” ku ev destewajeye li behra pitir ya deverên kurdî da, li pêşekiya metelê da dihête bikaranîn li demê dibêjît:

“- Tişteke wesa min bote îneye; tu hizir nakey!

- Ez dizanim keşk û sewkên bin danî ne

(Lewendî) destên xu kirine di berîka çakîtkê reş beqemdar û careka dî dê li şûn pê n xu zivîrî û destê wî ma bi lêva qela kezwanê ve û pêve çu:

- Ez yêd bêjime te: tu hizir wî tiştî nakey!

Wêjî destî çepê havête lêva dî ya qulûlê û bigirinjî nîve got:

- Min zanî... Min zanî; we hilîreşkên hişk kirîne te înayn mane?

- Eve tekire suhbeta ‘tiştê mino tiştê’”²³⁸

Stranê jî mîna hemî beşên dî yê edebê folklorî di romanê da reng vedaye, bo nimûne di romana “Hawara Dicle” da romanivîsî strana folklorî ya kurdî “Çome Cizîrê” bikaranîye, romanivîsî kariye mifayekê baş ji vê strana folklorî werbigirît, dema ku dibêjît:

“Tarî ya kêleka malê ku tê de hertim mih û kavirine nesax ku nikarbûn bidana pey dengê bilûra Apê Xelef û biçûna çêre berx, bedîr, kahir û gîskin hebûn, diçû û dihat û strana bajarê Cizîrê bi hêdîka dinurand:

Çûme Cizîrê, Cizîra Botan

Şalûl û bilbil hev bûne cotan

Wele wê rindê dilê min sotan

Wele wê kewê dilê min sotan

Gotina evnê hev re digotan

Xizim wînda bûn, lê, lê, lê

Ez derme cem mîrê Botan.”²³⁹

Romanivîs Enwer Mihemed Tahir di romana “Kurê Safa Re'nayê” da gotineka mezinan bi şeweyekê rasterast di nav têkstê romana xwe da bikaranîye, dema ku dibêjît:

“Li hindav serê wan bi dîwarî ve hilawîst bû. Noke ma dêrfeta wê pirsîyarê ye? Heke te devê xo vekir û ew pirsîyarkir, sed dê bêjn:

²³⁸ Tehsîn Navişkî, *Janên Sînahiyê*, r.44.

²³⁹ Mehmed Uzun, *Hawara Dicleyê*, c.1, Veguhaztin bo ser elfabaya 'erebî Arif Zêrevan, Hewlêr 2004. r.33.

- Avê berên beraşa birin eve yê pirsîyara kengirpera diket.”²⁴⁰

Gotina mezinan di vê romanê da “avê berên ber aş birin eve yê pirsîyara kengirpera diket” hatiye bikaranîn.

Pêkenok mîna pêdiviyatiyeka rojane di seredêrîkirina xelkî da digel hevdu dihête bikaranîn, bi heman astê dêrbasî nava romanê bûye, çunkî roman herweku me amaje pêday rengvedana jiyana xelkê ye. Herwesan berfirehî û dirêjahîya têkstê rêyeka dîtir bû ji bo bikaranîna pêkenokê di têkstê wêda, bo nimûne di romana “Helkîşan Berew Lutke” da romanivîsî pêkenokek berhevkiyê, demê dibêjît:

“Kabirayek deçête lay kurtandirûyek, bo ewey çend kurtanêk be radan bidat bo giwêdirêjekanî şarwanî, kabira be wehîd kurtandirû delê: demewê ewende sift û qayîm bin, herwa bizane bo mamî xwetî dirust dekeyt.”²⁴¹

Bi giştî romanê mîfayekê baş ji edebê folklorî wergirtiye, ev edebe bûye şengistek bo romanê, romanivîsan nekarîne xwe ji vî edebî dûr biken, çunkî ev edebe xwedan gencîneyeka pire ji babetên curbicur û mîfadar, lewra romanivîsan bi çavekê girîng lê nêriye, herwesan romanên xwe pê dewlementir kirîne.

²⁴⁰ Enwer Mihemed Tahir, *Kurê Safa Re'nayê*, Hawar, Dihok 2012. r.130.

²⁴¹ Ebdulla Serac, *Helkîşan Berew Lûtke*, Weşanên Dar el-Hurriye lil-Tibae, Bexda 1989. r. 173. ; Salar Hemedemîn Hemze, “Rengdanewey Kelepûr le Romanî ‘Helkîşan Berew Lutke’ da”, r.74.

BEŞA SÊYEM

RENGVEDANA EDEBÊ FOLKLORÎ DI ŞÎÎRÊN MELA

XELÎL MIŞEXTÎ DA

3.1. Kurtetek li dor Jiyana Mela Xelîl Mişextî

Navê Mela Xelîl Mişextî wî yê dirust Xelîl Selman Xabûr e, ew ji hoza Baclan e, ev hoz beşek in ji Şebekan. Mela Xelîl li gundê Belawat ya ser bi parêzgeha Musilê ve, li sala 1902yan ji dayik bûye.²⁴² Wî çendîn nasnav hene, mîna Mela Xelîl, Mişextî û Mela Xelîl Mişextî.²⁴³

Xêzana Mişextî ji ber gorankariyên jiyane bi tinê bo demekê kurt li wî gundê jê ji dayik bûyî dimînin, paşan berev gundê Bazîwe diçin û li wî gundî bi cih dibin. Ew malbat li vî gundî tûşî çendîn astengan bûyîne, bi neçarî berev devera Navkûrê çûyîne û li gundê Dînaran bi cih bûyîne.²⁴⁴

Mişextî di jiyane da gelek nexweşî û azar dîtîne û çendîn rûdanên diltezin bi serê navhatî hatîne. Di jiyê zarokîniyê da babê wî diçîte ber dîlovaniya Xwedê, ji ber vî çendê ew ji bo rêverbirina xêzana xwe dest bi karî diket û dibîte golikvanê gundê Dînara. Her di vî demê da hez, viyan û arezûya xwendin û nivîsînê li def navhatî peyda dibe. Li demê êvarî li ser karî dizivirît, diçîte cem melayê vî gundî, Mela Ebdulqadirê

²⁴² Hevpeyvîn digel Newzad Mişextî, li mala wî, li komelgeka çirey, 7/8/2017, demjimêr 3-5 êvarî.

²⁴³ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yekê)*, Newzad Mela Xelîl Mişextî û Kameran Îbrahîm Mişextî (amd.), Weşanên Dezgay Spîrêz, Dihok 2012. r.16.

²⁴⁴ Hevpeyvîn digel Newzad Mişextî, h.h.

Akreyî û fêrî nivîsîn û xwendinê dibe. Herwesan li ser destê vî melayê navhatî Qur'an xitim kiriye û çendîn pirtûkên ayînî jî xwendîne.²⁴⁵

Li dema Mişextî Qur'an xitim kirî, hez û arezûya navhatî zêdetir dibe ji bo destveanîna zanist û zanînê, lewma ew dest bi xwendina feqyatiyê diket. Çunkî li wî serdem û nawçeya ew têda dijiya bi tinê xwendina feqyatiyê hebû. Di yekem pêngavê da çûye cem Mela 'Umerê Bêrkyatî li gundê Mêrsîda. Her ji bo heman mebestê çûye cem çendîn melayên dîtir, mîna Mela Şeref, Mela Nurfî, Mela Se'îdê Akreyî, Mela Mihemed û hindekên dîtir. Paşan li cem Mela Ehmedê Reşxwendina xwe bi dûmahîk dihînit û îcaza melatiyê li ser destê vî melayî werdigrît. Di maweyê 21 salan mijûlî xwendinê bûye û dema îcaza melatiyê wergirtî, jiyê wî 30 sal bûn.²⁴⁶ Herwesan li demê feqyatiyê li Şeqlawe navbirî bi rêka mamostayê xwe aşinayê şîrên Hacî Qadirê Koyî bûye.²⁴⁷

Piştî ku Mişextî îcaza melatiyê wergirtî, bo yekemîn car li gundê Zînava Kevin bûye mela, ev jî li salên 1930an bûye. Paşî her weku feqyatiyê, berev gund û bajêrên dî çûye hindek ji wan cihên ku melatî lêkirî ev in: Şkefthindiyan, Xurkê, Kizu, Baclur, Telwe, Koremarkê, Bamernê, Sarkê, Badê, Koxyê, Bîrê û Rikava û çendîn gundên dîtir. Li sala 1956an şaîrî karê melatiyê hêlaye û berev bajêrê Îsfînê çûye, ji bo pîdiviyatên jiyane dest bi karekê dîtir kiriye.²⁴⁸

Mişextî kesekê çalak û neteweperwer bû, lewra ji ber vê çendê çendîn caran ji layê desthelatên Îraqê hatiye nefîkirin û zîndankirin. Yekem car li “salî 1960 destigîr kraw le diwayî da dûr xirawe bo parêzgay nasriye le başurî Îraq û le diway şoreşî Eylûlî mezin le salî 1961 legel ‘Salih Îwsîfî û Elî 'Ebdulla’ azad kira... Û le salî 1965 û 1967 dû carî tir lelayan rejêmi Îraqê we zîndanî kirawe, carî yekem bo mawey şeş mang û carî duwem mawey salêk.”²⁴⁹

Li demê beyannameya 11ê Adara 1970yan ew guherîn û lihevkerinên di navbera hikumeta Îraqê û gelê Kurd hatiye encamdan bo egerê aramiyê li bakurê Îraqê, Mişextî vedigerête Êsfînê û bi cih dibe.

²⁴⁵ Hevpeyvîn digel Newzad Mişextî, li mala wî, li komelgeka çirey, 7/8/2017, demjimêr 3-5 êvarî.

²⁴⁶ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yekê)*, Newzad Mela Xelîl Mişextî û Kameran Îbrahîm Mişextî (amd.), r.18.

²⁴⁷ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.19.

²⁴⁸ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.21.

²⁴⁹ Ehmed Muşîr, “Jiyana Mela Xelîl Silêman”, Xazr, j.18. Bendereş 2017. r.18.

Piştî rêkeftnameya Cezayîr û neksa sala 1975an Mişextî bo cara çendê mal û xaniyê xwe li cih dihêlît û awareyî welatê Îranê dibît. Malbata wî li ordîgayê Kanî Spîyê têne bicihkirin û piştî maweyekî hatine veguhastin bo ordigayekî leşkerî bi navê Zêwe. Navhatî li wêrê jiyaneka pir nexosî û azar diborînît, piştî borîna şeş heyvan, ew careka dîtir hatine veguhastin û li bajêrê Yezda hatine bicihkirin. Navhatî li vî bajarî her çende di jiyê pîrîyê da bû, li kargeheka ristin û çînînê dest bi kirêkariyê diket ji bo peydakirina pêdiviyatiyên rojane yê xêzana xwe. Digel borîna demî, Mişextî li vî bajêrê aşînayê melayên şî'îyan dibe, şarezayî û pisporiya wî di zanistên ayînî û zimanê erebî da dibête egerê girîngîdana navhatî li def zanayên şî'îyan, bi çendîn şeweyan harîkariya wî diken û li ser milkê ewqafê xaniyekî didene û mûçeyekî taybet bo amade diken. Herwesan li vî bajêrê dibête Qur'anxwîn li ser miriyan. Weku nerêtekê şî'iyên vî bajêrê pîdivîye her heyvekê xitmek bo bihêtekirin, beramberî kujmekê parey. Paşan Mişextî her li vî bajêrê tevî Zerdeştîyan dibe, piştî borîna heft salan, digel xêzana xwe berev bajêrê Teheranê diçin û bicih dibin.²⁵⁰ Ya girîng ew e ku Mişextî di sextirîn rojên awareyê jî da dest ji nivîsînê bernedaye, dema mirov li şîrên navhatî dinêrîn nexweşiyên awareyê bi şeweyekî berbelav dihêne dîtin.

Mişextî piştî borîna bîst û yek salan ji jiyana awareyê, Teşrîna Yekê sala 1994an vegeriya Kurdistanê, li komelgeha Çirey bi cih dibe²⁵¹ her li vê komelgeha li Berwarî 1.7.2007an diçîte ber dîlovaniya Xwedê.

Berhemên Mişextî destekê bila di nivîsê da hebû, ji bilî nivîsîna şîrî jî, wî çendîn pirtûkên girêdayî warên cuda cuda jî nivîsîne.

Berhemên Mişextî:

Şîrên wî ji şeş defteran û jimareka berçav ji şîran li ser laperan pêkdihên; heta niha bitinê bergek hatiye çapkirin.

-Dîwana Mela Xelîl Mişextî; bergê yekê hatiye çapkirin.

-Ferhenga Merg û Jî; hatiye çapkirin.

-Ferhenga Şkeftan; nehatye çapkirin.

-Çarbendên Xeyamî, ji farsî hatiye wergêran; hatiye çapkirin.

-Çarbendên Fayzê Diştîşanî, ji farsî hatiye wergêran; nehatye çapkirin.

²⁵⁰ Hevpeyvîn digel Newzad Mişextî, li mala wî, li komelgeha çirey, 7/8/2017, demjimêr 3-5 êvarî.

²⁵¹ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yekê)*, r.30.

-Çarbendên Baba Tahîrê Hemedanî, ji dîyalêkta Lorî hatiye veguhaztin bo diyalêkta Kurmanciya jorî; hatiye çapkirin.

-Bihara Dila; hatiye çapkirin.

-Behs el-Ebis, Ebs el-Behs, şîr in, nehatine çapkirin.

-Tefsîra Qur'anê; nehatiye çapkirin.

-Fîqha Muhemmedî, ji farsî hatiye wergêran; nehatiye çapkirin.

-Al'wamil alminvume; nehatiye çapkirin.

-Rîsale alinfayyan (çaplusname), nehatiye çapkirin.

-Mewlûdname; hatiye latînîzekirin û bi her du rênivîsên latînî û erebî hatiye çapkirin.

-Mantiq el-Teyr, ji farsî hatiye wergêran; hatiye latînîzekirin û bi her du rênivîsên latînî û erebî hatiye çapkirin.

-Erebname, (kesekê nenyas ev berhemê şîrî biriye ji dev şairî, hata niha jî em nizanîn kî ye); nehatiye çapkirin.

-Çendîn berhemên dî yên lib lib.²⁵²

3.2.Karîgerî û Rengvedana Edebê Folklorî di Şîrên Mişextî da

Dewlemendiya gencîneya mêşk û aşopa Mişextî ji encamê serborên kesekî bûye ku ev çende jî ji encamê geriyan û mişextibûna navhatî bo zorbeya deverên Kurdistanê. Şair mela bûye, lewra ji bo zanist û zanînê li çendîn deveran geriyaye û melatî kiriye. Herwesan ji ber neteweperweriya xwe navhatî naçar bûye ku çendîn caran ji ber dijminî aware û penaber bibe, ev hemî hokar bûn ku Mişextî şarezayeka baş di edebê folklorî da hebe.

3.2.1. Efsane

Efsane cîhaneke berifireh e û gelek biyavan bi xwe ve digirît. Ew gencîneyeka dewlemend e ji hêmayên curbicur ve û her ev gencîne jî dibîte palpişteke bihêz ku şair xeyala xwe tîkelî efsaneyan biket û bi rêka wê xwe bigehînte mebestan. Di hindê caran da bikaranîna hêmayên efsaneyî ji bo wê çendê ye ku beşek ji asankarî û ronîya tîkstê veşêrît û mîjdariyekê peyda biket ku xwendevan li ramana veşartî bigerît ya di pişt hêmayê efsaneye da heyî.

²⁵² Mela Xelîl Mişextî, *Mewlidname*, Hêmin Umer Xweşnaw (amd.), Weşanên Destnûsxeyên Zankoya Soran, Hewlêr 2018. rr.11-12.

Efsane di şîrên Mişextî da, bi şêweyekî berbelav hatiye bikaranîn û ne bi tinê efsaneyên kurdî, belku ta efsaneyên fars û biyanî jî di şîrên wî da reng vedayîne. Navbirî ev efsane kirîne hêma û bo çend mebestan bikaranîne, ji wan jî mebestên dêrûnî û siyasî û hwd. têne hejmartin. Ev hêmayên efsaneyî zengîniyek daye naveroka têkstên şîrên wî. Herwesan ciwankariyek jî daye rûxsara şîrên navhatî.

Mişextî di çendîn şîrên xwe da peyva efsane bi xwe bikaranîye, bo nimûne di parçe şîreka xwe da dibêjît:

“Tu her efsane dêrtînî
Me dîn giş kiriye efsane
Hizar tayêt diro û xewnan
Ji dînî bûyîne bêgane.”²⁵³

Girîngitirîn regezên efsaneyî di şîrên Mişextî da, ev ên li xwarê ne:

3.2.1.1. Kesayetiye Efsaneyî

Yek ji wan regezên serekî yên efsaneyê xwedan hêz û rûxsariyên taybet in. Mebest pê ew kesayet in ku kar û kiryarên wan bûyîne eger û bibine kesayetiye efsaneyî. Ev kesayetiye dibine du cur, kesayetiye layengirên hêza başî û xêrê ku herdem harîkariya mirovî diken û wî rizgar diken. Kesayetiye layengirên şerxazî û xirabkariyê diken ku ev kesayetiye berdewam bizavê diken, ku zîyanê bigehînine mirovî û zordariyê lê biken. Şaîrî di şîrên xwe da amaje bi çendîn kesayetiye efsaneyî daye, ji girîngitirînên wan kesayetiyan jî, evên li xwarê ne:

Zehak

Zehak* di efsaneya kurdî û gelek jî gelên Arî da, bi hêza xirabiyê hatiye naskirin.²⁵⁴ Vî kesî hemî regekê zordariyê dikir, lewra di nav gelê Arî da bûye kesekê efsaneyî û di çîrok û çîvanokên efsaneyî da bi kesekê zalim û zordar û xwînmêj dihête nîşandan. Şaîrî di şîrên xwe da amajedaye Zehakî û kiriye hêmayek ji bo zordarî û zilim û dijminkariyê, bo nimûne:

²⁵³ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yekê)*, r.30.

*Hakimekî zalim û zordar bû. Bû pitir pêzanînan binêre: Selam Nawxêş, *Efsane û Aydolojiya û Ziman, Weşanên Nûşengey Tefsîr*, Hewlêr 2016. rr.40-41/69-71. ; Ebdilhimîd Yûnis, *Mû'cemû'l-Fûklûr Ma'a Mesredin Încilîziyyîn-Arabîyyîn*, el-Hey'etû'l-Misriyyetû'l-Amme Li'l-Kitâb, Qahîre 2009. r.98.

²⁵⁴ Şivan Circîs Ebdilrehman, *Erk û Regezên Efsaneyê di Çar Romanên Devera Behdînan da*, r.144.

“Gelek kiriye li gel me ji dewrê Sasan ji bîr nakeyn, were, tuley helîne
Were bêje ku: Zehakî ji kî bû? Nebêje: ev Mişextî ye har û dîne”²⁵⁵

Di vî şîrî da, şaîrî amaje daye dijminên gelê xwe, Zehak jî, mîna dijminekê serekî
yê gelê kurd daye zanîn, ku gelek zilm û zordarî li gelê kurd kiriye.

Kawa

Kawa di efsaneya newrozê da, bi kesekê çavnetiris û mêrxas û aza hatiye naskirin.
Di efsaneya kurdî û çendîn gelên Arî da bûye hêmaya başîyê û rizgarkerê xelkî ji
zordariya Zehakî û li dûmahiyê wî kariye zilm û zordariya vî hakimê xûnmêj nehêlît.²⁵⁶
Lewra ji ber zîrekî û mêrxasiya wî bûye kesekê efsaneyî di nav gelê kurd da û herdem
bi mêrxasî û çavnetirisî behsî wî dihêtekirin. Şaîrî di çendîn şîranda amaje daye navê
Kawayî di dîroka gelê kurd da, ew mîna kesayetiyeke zîrek û çav netiris daye diyarkirin,
bo nimûne:

“Behsê mêranî nekeyn carek li ber koç û tenûr
Ber kulîxweran me bazda, ew çi reng bêçarîye?
Navê Kawey me xirab kir, heş di navê kurdî da
Her revîn bo kurdê navdar bed ferî û bed karîye”²⁵⁷

Di vê parçe şîrê da, şaîr behsê şkestina gelê kurd dike û rexnê li wan kesan digirît,
yên ku welatî bicih dihêlin û dêrbedêr dibin, û dibêjîte ewan me navê Kawayî reşkir,
anku divêt em bergiriyê biken û welatê xwe berneden. Mîna Kawayî zîrek û aza û
qehreman bîn û dûmahiyê bi her zordariyekê bînîn.

Rustemê Zal

Kesayetiyeke efsaneyî û xwedan hêzeka mezin bûye, bi qehreman û mêrxaseke zîrek
û çalak dihête zanîn, xwedan gurzekê giran bû, ev gurze “366 batman bû û demê
diweşande dijminî agir ji vîgurzî derdikevit.”²⁵⁸ Kesayetiya Rustemê Zal di nav
efsaneyên farsî û kurdî da gelek rengvedaye û behs li mêrxasî û hêz û şîyanên wî hatiye
kirin.

²⁵⁵ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.49.

²⁵⁶ Şivan Cîrcîs Ebdilrehman, *(Erk û Regezên Efsaneyê di Çar Romanên Devera Behdînan da)*, r.141.

²⁵⁷ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.35.

²⁵⁸ Ebdulrehman Mizurî, “el-Esatîr fî Mem we Zîn” Micile: Laliş, j. 8, Dihok, 1997. rr.21-22.

Şaîrî di şîrên xwe da amaje daye Rustemê Zal û mifa ji saloxetên wî wergirtiye, mîna hêmayek bo azadî û mêrxasî û qehremaniyê bi kar anîye û naveroka şîra xwe pê zengîn kiriye, bo nimûne demê dibêjît:

“Nabît her kes bêjît: Pêşewame kes nîye
Yan bibêjît ez emîr im, ez wezîr im, ceneral
Yan wîcaxdar im serokim, mam û pismamim heye
Qewm qîlim, şîbetî fil im, ser leqim bo mam û xal
Yan Mizûrîme çeleng im, eve Doskî û Êzdî
Badînan e, eve Soran, ya ezim Barzanî al
Yanî xweşnav im, Herîrî, yanî Herkî, navkurî
Bacelan û Rojbiyanî, her ezim Rustemî Zal”²⁵⁹

Di vê parçe şîrê da, navhatî rexnê li serok û mezinên hozên kurd digirît, dibêjîte wan, nabe her yek ji hewe xwe bi Rustemê Zal bizanît û beramberî hev du û xwe bi hevdu neden, belku divêt beramberî dijminî yekgirtî bin û xebat û têkoşanê bo gelê xwe biken.

Luqmanê Hekîm

Bi kesayetiyeke efsaneyi dihête zanîn û dibêjin vî kesayetî jiyekê dirêj hebû, kar û erkê wî ew bû ku nexweşan çareser bike, anku di serdemê xwe da mîna pizîşkekî gelek bi navûdeng bû, dihête gotin ku nexweş li ser destê wî çareser û sax dibûn. Ev kesayetiye di efsaneya kurdî da jî dihête bikaranîn.²⁶⁰ Şaîrî amaje daye vî kesayetî, bo nimûne di şîreka xwe da dibêjît:

“Mişextî evro ji bo te dûr e derman
Çi noşdare, bi zehmet tu bibînî

Bi xwe diktorê xweyî, ey qelendêr
Tu êşa xwe dizanî û dibînî

Te êş nîne belê derdê welate
Ji êşek di gazînî, tu dînî

Hizar Luqman li te xir bin ji xweye

²⁵⁹ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.390.

²⁶⁰ Tofîq Kerîm, *Karîgerîy Îslam le ser Keltûrî Kurd (efsane)*, bergî dûyem, RojheLat, Hewlêr 2015. rr.95-97.

Tena naken li te jan û birînî”²⁶¹

Şaîrî di vê parçe şîrê da, behs li nexweşî û dêrdê xwe yê bê dêrman dike, wesan didete diyarkirin ku çi nojdar û dêrman nînin, nexweşiya wî çareser biken, heta ku hizar Luqman bihên jî bê mifaye ji ber ku ew bi xwe dêrdê xwe dizanît, ew jî mişext û dûr e ji welatê xwe, anku welatê wî bitinê bo dêrdê wî nojdar û dêrmane. Di vêrê da şaîrî, Luqman mîna hêmayek bo çareserkirin û saxkirina nexweşan bikaranîye.

Efrasiyab

Kesayetiyeke bi navûdenge di nav gelê Îranê da û bi kesekê xwedan hêz û şîyan û bi qehremanekê çavnetiris û mêrxas dihête hejmartin.²⁶² Ji ber vê çendê ev kesayetiye dêrbasî di nav efsaneyan da bûye û bi taybet jî di efsaneyên farsî da. Şaîrî di şîrên xwe da amaje bi qehremanî û mêrxasiya evî kesayetî daye û dibêjît:

“Saqîyan cam didestin çep û rast
Sot reqîban dilî me her wek kibab
Xelkî ser me xwe kire Efrasiyab
Pêdivît em desthelînîn bo: cuwab
Rastûçep tîn ceger û sînim kurdî ye”²⁶³

Şaîrî Efrasiyab kiriye hêmayek ji bo mêrxasî û qehremaniyê, wesan daye diyarkirin ku dijminî li ser me xwe kiriye Efrasiyab anku xwe bi qehremanî û mêrxas nişan daye, lewra divêt em hemî berevaniyê ji xwebikeyn û bersiva dijminê tirsinek bideyn.

Qarûn

Kesekê xwedan mal û samanekê mezin bû û çendîn gencîne hebûn û bi zengîntirîn kes dihate zanîn di serdemê xwe da, hevçerxê Musa (a.s.) bû. Di efsaneyan da dêrbarey çawaniya komkirina pare û malê wî dihête gotin, ji ber “şarezaya wî di biyavê kîmyayî da ev pareye xirvekirîne.”²⁶⁴ Herwesan dêrbareyê zêrevanên wî di efsaneyê da dihête gotin ku “mara zêrevanî li gencîneyên wî dîkir.”²⁶⁵ Zengîniya vî kesî hind kartêkirin lêkir ku bibîte kesekê zordar û zalim û zordariyê li xelkî biket. Lewra kesayetiya Qarûnî

²⁶¹ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.38.

²⁶² Mihemed Rîça Mahmudzade, *Afrasiyab Der Asgore û Hemase û Zîxm Mîq Ristim*, Antîşarat Karwan, Tehran 1384. r.33.

²⁶³ Destnivîs.

²⁶⁴ Ebdulrehman Mizurî, *el-Esatîr fî Mem we Zîn*, r.23.

²⁶⁵ Ebdulrehman Mizurî, *h.c.*

di nav efsaneyên gelên rojhelatê da reng vedaye û di efsaneya kurdî da jî hatiye behiskirin. Şaîrî di şîreka xwe da amajê didete Qarûnî û dibêjît:

“Ger te gencê şîbetî Qarûnî hebin
Koroycax bî yanî mam û kur hebin
'Emirê te ew nadirêjken katekê
Kes ji wan bo te nemalin, jan çî ye?”²⁶⁶

Di vê parçe şîrê da şaîrî Qarûnî kiriye hêmayek bo zengînî û dewlemendiyê, wesana didete diyarkirin, ku eger mirovî çendîn gencên zengîn mîna Qarûnî hebin û çend xwedan mirov jî be bo çî ye û bê mifaye bo dinyayê û axîretê, çunkî ew hemî neşên yek roj li jiyê mirovî zêde biken, wate dûmahiya mirovî her mirin û hêlane, lewra çî bo mirovî ne mifa ye.

3.2.1.2. Giyandarên Efsaneyî

Piraniya van giyandaran di pirtûkên ayînan da hatîne behskirin, lê ev giyandar dêrbasî di nav efsaneyan da jî bûyîne. Herwesan piraniya wan ziyarbexş û xirabkarin bo mirovî. Girîngtirîn giyandarên efsaneyî yên Mişextî di şîrên xwe da bikaranîn ev ên li xwarê ne:

Ehrîmen û Ahuramazda

Du hêmayên aynî ne li dev Zerdeştîyan.²⁶⁷ Ehrîmen hêmaye ji bo xirabî û şêrxwazî û tariyatîyê. Ahuramazda jî hêmaye ji bo başî û xêrxwazî û ronahiyê, Di efsaneyan da ev herdu hêma dihêne dîtin û berdewam di milmilanêdane beramberî hevdu.²⁶⁸ Mişextî çendîn caran di şîrên xwe da amaje bi Ehrîmenî daye û kiriye hêmayek bo dijminî û şêrxwazîyê. Ji ber ku şaîr kesekî netewe perwer bû, bi rêka amajedana bi Ehrîmen behs li zilm û zordariya dijminê gelê xwe kiriye. Wate şaîr ji ber sansora dijminî nekarîne rasterast behs li wî biket, lewra herdem lêkçiwandin di navbera Ehrîmen û dijminên gelê xwe da kiriye, anku dijmin mîna Ehrîmenî hejmartîne. Bo nimûne:

“Firoke li asman wekî Ehrîmen
Dibarîte serman qenabil de ten

²⁶⁶ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.493.

²⁶⁷ Îzeddîn Mustefa Resûl, *El-waqiye fi el-adab el-kirdî*, r.28.

²⁶⁸ Şîrîn Hemedemîn Hesên, “Çawpêdaxşanêk be Efsane û Destanî Kurdî-Beşî Duwem”, r. 93.

Ne bax û ne xanî, ne war û ne da
Ne av û ne kanî, ne gund û ne şar”²⁶⁹

Şaîrî Ahuramazda (Mezda) û Ehrîmen mîna milimilaneyekê di navbera xêr û başiyê û şer û xirabiyê di şîrên xwe da bi kar anîne, bo nimûne di şîreka xwe da pesna Ahuramazda dide û mîna hêmayek ji bo başî û xêr û ronahiyê bi kar dihînt û Ehrîmenê jî dike hêmayek ji bo xirabî û şêrxwazî û tariyatiyê û wesa dibêjt:

“Mezdane dizanî agir û ronak
Remiz ji nûrit efrendeyê pak
Dê çawa înnî, wî Ehrîmanî
Ew zîşt û bedkar wek qetîranî
Têkeye dojî û agirî reş ket
Navê me jî wek navê xwe bed ket?!”²⁷⁰

Şeytan

Di hemî ayînên asmanî da behis li xirabî û fêlbaziya şeytanî û serdabirina mirovî ji layê wî ve hatiye kirin. Di ayinê Îslamê da “şeytan hêmayê şer û xirabiyê ye, piştîwanî kesanî bed dekat û dijî çakekarane.”²⁷¹ Anku şeytan wekî wêneyekê xirab di ayinan da heye, mîna hêzeka xirab û şerkere beramberî hêza başiyê û xêrê. Şeytan di çîrok û çîvanokên efsaneyan da heman hêza xirab û şerker û serdabirinêye. Mişextî di şîrên xwe da amaje bi şeytanî daye, mîna wêne û hêmayekî xirab û dijminkar û fêlbaz nişan daye, bo nimûne:

“Çipka heşêye, wek qale qîre
Nav me nehêlin, şeytanê pîre
Bedkariyê wî şeytan nezanî
Yê eşkirayî, ji bil nîhanî”²⁷²

²⁶⁹ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.219.

²⁷⁰ Mela Xelîl Mişextî; *h.b.*, r.134.

²⁷¹ Tofîq Kerîm, *Karîgeriy Îslam le ser Keltûrî Kurd (efsane)*, bergê duyem, r.109.

²⁷² Mela Xelîl Mişextî, *h.c.*

Decal

Giyandarekê efsaneyî yê tirsak û xirabkar e, dihête gotin ku li dûmahiya cîhanê dihêt û hukmî li cîhanê hemiyê dike, paşan li ser destê Mesîhî û Mehdî dihête jinavbirin.²⁷³ Di bîrûbawerên gelan da çendîn bîrûboçûn li ser hene, bo nimûne di baweriya gelê kurd da dibêjin, decal yê “sax e li pişt çiyayê Qefqas dijît”²⁷⁴ Di efsaneya kurdî da Decal bi şeweyekî berbelav dihête dîtin. Mişextî di şîrên xwe da amaje daye Decelî û kiriye wêne û hêmayek ji bo fêlbazî û serdabirinê, herweku şairî di vê parçe şîrê da dibêjît:

“Ketîne nav qirr û cengî
Cîdal û kîn û yên tengî
Nepirse pîsî û jengî
Heta fêl bûyne decelî”²⁷⁵

Efrît

Giyandirekî bitirs û sehm û bihêz e; di efsaneyên gelan da bi giyandarekê xirabkar û nebaş û dijmin dihête nasîn. Herweser bi çendîn wêneyên curbicur diyar dibe mîna (şeytan, çadûger hwd.). Ev wêneye hemî ji bo layengîrên xirabiyê dihêne nasîn, lewra “zor carîş lerûy lêk çiwandinewe, şeytan û efrît û îblîs weku naznaw şiwênî yek degirinewe.”²⁷⁶ Wate ev giyandar jî layengirê hêza şerî û nebaşiyê ye beramberî hêza xêr û başiyê. Navhatî di şîrên xwe da amajê didete Efrîtî, mîna wêne û hêmayekê dirinde û dijminîkar bikaranîye. Navbirî dijminên gelê xwe bi Efrîtî şibhandîne ku mîna Efrîtî dirinde û xirabkar û zordar in, bo nimûne:

“Ewe çi çare ehrîmanin, te li me yê rast înay
Ew çi liboz in, çi dêw in, ew çi 'efrît in, dewal?
Ew çi pêxas û pelîdin, ew çi bê dêrpêne reş?
Xarina wan mişke, cerbû, ew çi marin, çi 'egal?”²⁷⁷

Ezraîl

²⁷³ Ebdulhemid Yunis, *Mu'cem el-Folklor me Serd Îngilizî-Erebî*, el- Heye el-Misiriye el-Ame lil Kîtab, Qahîre, 2009. rr. 285-286.

²⁷⁴ Elî el-Cizîrî, *el-Edeb el-Şefahî el-Kurdî*, el- Ci'z el-Saniye, Metbea Xanî, Dihok, 2008.

²⁷⁵ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.121.

²⁷⁶ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexeskênî*, r.264.

²⁷⁷ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.170.

Yek ji firîşteyên Xwedêye, karê wî ewe, ku giyanê her kesekî dikêşît. Ev giyandar dêrbazî nava efsaneyê bûye, “lenêw efsane da debîndirê û qisey legel dekirê û wek kesêkî nêw efsane hels û kewt dekat.”²⁷⁸ Navhatî di şîrekê da behsî li çaverêbûna Ezraîlî dike û dibêjît:

“Li ser nivîniya mirinê me, bêçar
Car car di nêrm zam û birîna

Çava digêrim, li dor nivîna
çavek li dêrge, Ezraîlê sext

Çavek li mal û mindalê bedibext
Mişext û jarin, rût û rewal in

Keser di dil da maye, hizar bar
Hindek li medlimme, hindek tîfal in”²⁷⁹

Şaîri demê pîr dibe û binav salve diçît, êdî bêçare û nexweş dibe, lewra êdî bîra mirinê dike, çaverêyî tîrsa hatina Ezraîl e, ku bihêt rihê ji giyanê wî helkêşît, lewra navbirî Ezraîlî bi sext û dijwar nav dike.

Perî

Giyandireke ciwan û rihsivik e û bi ciwanî û nazikiyê dihête nasîn. Di Qur’ana pîroz da ji vî giyandarî hatiye behiskirin. Perî di nav efsaneyên cîhanî da bi şêweyekê berbelav dihête dîtin. Ji bo nimûne di efsaneyên Grekî da “ew giyandare yê li ser rûbar û kanî û dêriyan dijît.”²⁸⁰ Di efsaneyên kurdî da perî “hêmayê ciwanî û bê gerdî û xêr û berekete ye.”²⁸¹ Periyê şîyanên firînê hene û li cihên xweş digerît. Mişextî perî di şîrên xwe da kiriye hêmayek bo ciwanî û nazikiyê, mîna di van dêrên li xwarê da dibêjît:

“Sor û spî bim
Dê zor ciwan bim

Wekî perî bim
Dê xan û man bim”²⁸²

²⁷⁸ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexşkênî*, r.33.

²⁷⁹ Mela Xelîl Mişextî; *h.b.*, r.141.

²⁸⁰ Telal Herib, *Mu’cem E’lam Esatîr we el-Xirafat fi el-Mi’teqîdat el-Qedîme*, Dar el-Kutub el-İlmîye, Beyrut, Lubnan, 1999. r. 160

²⁸¹ Tofîq Kerîm, *Karîgerîy Îslam le ser Keltûrî Kurd (efsane), bergî dîyem*, r.104.

²⁸² Mela Xelîlê Mişextî, *Bihara Dîla*, Weşanên Dezgay Spîrêz, Dihok 2006. r.48.

Pîrhevî

Giyandareka efsaneyî ya bitiris û sehme, wênekê xirabê dijminkariyê heye, karê wê ewe ku xelkî serda bibet û bixapînît û zîyanê bigehînîtê. Dibêjin ku ev giyandare goştê mirovan dixwet.* Şaîrî pîrhevî mîna hêmayeke dirinde û hovane di şîra xwe da bikaranîye, bo nimûne:

“Gild û gacil kom bi kom in, kevne amanê rizî
Muxil û bêjîng û taşî, bê jîmarin bivir û das
Serke milhêban bibîte wek didanê pîrhevî
Qîç diken hincar di xanî, ser mijan û hem misas”²⁸³

3.2.1.3. Giyanewerên Efsaneyî

Ew giyanewer in ku kar û kiriyar û livînên wan di siruştî nînin û bilindtir in ji ketwarî, piraniya van giyaneweran zîyanbexş in û xirabkar in, lê hindek ji wan harîkar û rizgarkerin ji bo mirovî, mîna balindeyê sîmerx.

Çendîn giyanewerên efsaneyî di şîrên Mişextî da rengvedayîne û ji wan yê herî girîng ev in:

Dêw

Giyanewerekî efsaneyî ye û xwedan kelexekî mezin e. Ew dirinde û bitirse û “detwanê bifirê û şewey xwey bigurê. Goştî însan dexwat û lekêw û eşkewt û tarîkayî yanda dejî.”²⁸⁴ Di efsaneya kurdî da jî dêw dihête dîtin.* Şaîrî di şîrên xwe da amaje daye dêwî û mîna wêne û hêmayekê dirinde û xirab û mirovxûr nîşandaye, bo nimûne di şîreka xwe da dibêjît:

“Hêz ne erş û ferîş û evraz û zemîn
Ne behîşt û heyv û rêjêt dilrevîn
Ne firîşt û dêw û dozex, însûcan

* Ji bo pitir pêzanîn binere: Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexşkênî*, rr.32-33. ; Hecî Cehfer, *Hindek Vekolîn li dor Folklorê Kurdî*, r.397.

²⁸³ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.243.

²⁸⁴ Mewlud Îbrahîm Hesên, *h.b.* r.27.

Her nebû navê çiya û deryayê pan”²⁸⁵

Mar

Yek ji giyanewerên xweşik e, vî giyanewerî rolekî girîng di efsaneyên biyanî û kurdî da heye. Dikarî herdu karên şerxwazî û xêrxwazî biket.²⁸⁶ Şaîrî di çendîn şîrên xwe da mar mîna hêmayekî xirab û dijminkar nişan daye, bo nimûne:

“Ew çi pêxas, û pelid in, ew çi bê dêrpênereş?
Xarina wan mişke, cerbû, ew çi marin, çi çegal?
Ew çi marin, çi neyarî, dijmînê arî nejad?
Ne nihoye û par û pêdar, pêşî me çend sal û sal”²⁸⁷

Şaîrî piraniya caran di şîrên xwe da, mar mîna dijmîn nîşandaye, lê hindek caran wesfa yara xwe bi ciwaniya marî kiriye, dema ku dibêjît:

“Ew çi bala û kezîne, ew çi biskin cûte mar?!
Ew çi gulzara rezîne, ew çi miske, reş û tar?”²⁸⁸

Di vê şîrî da şaîrî wesfa keziyên yara xwe di ciwaniyê de kirîne mîna maran, wate şaîrî lêkçiwandinek di navbera keziyên yara xwe û marê reş kiriye.

Sîmerx

Balindekê efsaneyî ye, cihekê girîng di nav efsaneyên gelan da heye. Wate sîmerx “balindeyekî gewre, wek hindê le efsanekan bas deken her ew balindeye, palwan le bin dinya bête ser dunya.”²⁸⁹ Di efsaneya kurdî da vî balindeyî rolekê baş heye û dihête zanîn ku “giyanewerekê mezine li ser bilindiya çiya dijît bi şeweyekê ku di şiyânên wî daye mirov û giyaneweran li ser piştê xwe didanît û bo cihên dûr difirînît. Wate rêbarekî dirêj bibirît bêy ku rawestît.”²⁹⁰ Ev balinde harîkariya mirovî dike bi taybetî demê mirov

*Ji bo pitir pêzanînan binêre: Şîrîn Hemedemîn Hesên, “Çawpêdaxşanêk be efsane û destanî kurdî, beşî duwem”, rr.87-88.

²⁸⁵ Mela Xelîl Mişextî, *Mewlidname*, Hêmin Umer Xweşnaw (amd.), rr.39-40.

²⁸⁶ Hisên Sabîr Elî, *Rengdanewey Realîzmî Şî'rî le Romenekani Mem Botanî da*, Leriye, Silêmanî, 2012, rr.140-144.

²⁸⁷ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.170.

²⁸⁸ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.*, r.57.

²⁸⁹ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Pêkhatay Efsaney Kurdî*, r.166.

²⁹⁰ Ebdulrehman Mizurî, *el-Esatîr fî Mem we Zîn*, r.20.

dikevîte di nav tengaviyan da. Şaîrî di şîrên xwe da amaje daye sîmerxî û ew kiriye hêmayek ji bo rizgarkirinê, herweku di vê parçe şîra di xwarê da dibêjît:

“Yan pîrklozek klozik bida min
Yan bayê dijwar heba li ba min
Ser perrê sîmerx yan ez siwar bim
Blanê ez ho pest û hejar bam”²⁹¹

Di vê şîrê da daxwaziya şaîrî ew e ku li ser perên sîmerxî siwar be û careka dî bi welatî xwe şa bibe, ji ber ku şaîr î penaber û mişext e, evca bîra welatê xwe diket lê neşet ji ber dijminî bizivirîte welatê xwe, lewra hawara xwe digehînîte sîmerxî da ku bihêt rizgar biket û bi welatê wî şad biket.

Huma

Yek ji balindeyên efsaneyî ye û yê ciwan û bi kelex e. Di efsaneyan da dêrbarey humayî hatiye gotin “eger li welatekê viyaban şahekê bo xwe hilbijêrin, da vê balindeyî helavêjin bi mebesta wê çendê ka li ser serê kê dadaba da ew kes bîte şah yan desthilatdarê wî miletî.”²⁹² Wate ev balinde, balindekê şadî û bexteweriyêye, “lenaw efsane rojhelatî û Îranyekan da û le nêw kurdîş da be balindeyekî xuşbetî nasrawe.”²⁹³ Şaîrî di şîrên xwe da balindeyê huma kiriye hêmayek bo bextewerîy û asudeyê. Ji bo nimûne demê dibêjît:

“Peristgahî ji bo, li şîrxwerî û ciwanî
Li pîr zêdetir bû evîna te buhayî
Raste mirov pîrdibin, dil herê genc û lawe
Dildarî nakevin bet, dilbere wek humayî”²⁹⁴

Şaîrî di vê parçe şîrê da wesana daye diyarkirin ku her çend mirovê evîndar bi nav sal ve jî biçît, dilê wî dê her genc û vîndar û bextewer mînît, mîna humayî.

Neheng

²⁹¹ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.56.

²⁹² Mes'ud Xalîd Gulî, *Ferhenga Klasîkî Kurd*, Weşanên Yekîtiya Nivîserên Kurd/Dihok, ç.2, Dihok 2009, r.105.

²⁹³ Soran Mamend Ebdulla, *Nostaljiya Şîrî Hevçerx Kurdî da*, r.353.

²⁹⁴ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.41.

Neheng giyanewerekê dêriyayî ye, ev giyanewer bi mezintirîn giyanewerê dêriyayî dihête hejmartin û xwedan hêzeka mezine, lewra ev giyanewere bûye giyanewerekê efsaneyî û di nav efsaneyên gelan da gelek hatiye bikaranîn. Herweku “di nav çîrok û serhatên Sindbadî wek giyanewerekê efsaneyî seredêrî li gel dihête kirin.”²⁹⁵ Ew bi giyanewerekê dirinde û metirisîdar hatiye nîşandan û gelek caran qehremanê efsaneyê “qût dedaw maweyek palwan lenêw zgî da demênêtewe.”²⁹⁶ Şaîrî di şîrên xwe da amaje daye Nehengî, mîna wêne û hêmayek bo hêz û mezinî û direndeyî û hovaneyî bikaranîye, bo nimûne:

“Tu ruh vegêrî? Xerman û xêrî
Piling û şêrî, ser neçemandî

Tu şox û şengî? Naz û qeşengî
Yan tu nehengî, dêriya hejandî?”²⁹⁷

3.2.1.4. Kerestên Efsaneyî

Çend kereste ne ku bi rêka wan kar û kiryarên efsaneyî dihêne kirin. Şîrên Mişextî ji van keresteyên efsaneyî di vala nebûn. Girîngitirîn kerestên efsaneyî yên navhatî bikaranîn ev in:

Camî Cem

Kerestekî efsaneyî ye, bi taybetî jî di efsaneya farsî da hatiye bikaranîn, ev keresteye “ke be camî Cemşîd nasrawe, pêşî degotirê camî Eskendêr û camî cîhan nimaw camî cîhan araw camî gîtî nima. Em cameye ke dinyay têda dedîtirê.”²⁹⁸ Di efsaneyan da dema kesek berze dibe yan xwe vedişêrît, bi rêka vî keresteyî dihête aşkirakirin û dîtin. Şaîrî ev keresteye ji bo heman mebest bikaranîye, demê dibêjît:

“Min hemî ilmek jî zanî, bi yek îşaret kir bi dest
Paşî me firrda û blind bûyn ta bi ser 'ewra ketîn
Min cîhan wek camê cem dî, ez şyam bûm şêx nivist
Çakirê pîrê muxanim, bendeyê wan mobdan”²⁹⁹

²⁹⁵ Şivan Circîs Ebdilrehman, *Erk û Regezên Efsaneyê di Çwar Romanên Devera Behdînan da (Vekolîneka Wesfî-Şirovekarî)*, r.161.

²⁹⁶ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexşkênî*, r.51.

²⁹⁷ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.144.

²⁹⁸ Ezîz Gerdî, *Ferhengî Mem û Zînî Xanî*, Narîn, Hewlêr 2016. r.87.

²⁹⁹ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.294.

Şaîrî di vê parçe şîrê da “Camî Cem” kiriye hêmayek bo dîtina hemî cîhanê, anku dema bilin dibe û bi ser 'ewran dikevît, hemî cîhanê dibînît herweku bi camî cemî temaşey cîhanê kirî.

Gopalê Musayî (a.s)

Ev kereste xwedan hêzeka mezine, hebûna xwe ya rasteqîneyî heye, di ayînên asmanî da behs li vî keresteyî hatiye kirin. Ev gopale yek ji “çendîn mu'cîzey pêxemberayetî le ser destî Musa rû deden.”³⁰⁰ Ev gopale xwedan hêzeka çadûyî ye di efsaneyên rojhelat da.³⁰¹ Ev keresteye ji berwê hêza mezina heyî ji hebûna xwe ya rasteqîneyî dêrbasî nava bîrûbawerên folklorî û efsaneyî bûye. Şaîrî ev keresteye bi “darê musayî (a.s)” mîna ew hebûna rasteqîneyîya. Ewa ku hêzeka çadûyî hey di nav şîra xwe da bi kar anîye, dema dibêjît:

“Wekî Musayî li kevrê req
Bi yek dar dazde kanî bîn
Ji esman men û selwa xweş
Li gel goştê bebê hestî”³⁰²

Ava Heyatê

Ava heyatê dibêjin aveke her “kesêk bîxwatewe nemir debê û heta hetayê namirê.”³⁰³ Çawaniya dirustbûna ava heyatê di efsaneyê da mîna peydabûna “ava zim zim” e.³⁰⁴ Di efsaneyan da kesekî bi navê “Xidirê Zindî”*, “geyiştuwete (awî jiyan) û nemirî bo xwey bedesti hênawe û bûwe be nimûney çakew firiyadirrisî bo hejarû damawan.”³⁰⁵ Ava heyatê di efsaneyan da cihekê girîng heye, çunkî eger qehremanê efsaneyê ji vê avê vexwet, dê nemir be û herdem yê sax be. Belê şaîrî di şîreka xwe da wesana daye diyarkirin, ku çi rastî û hebûn bo vê avê nînin, belku efsaneyê û dûre ji rastiye û dibêjît:

³⁰⁰ Tofîq Kerîm, *Karîgerîy Îslam le ser Keltûrî Kurd (efsane)*, bergî duyem, r.134.

³⁰¹ Şewqî Ebdulhekîm, *Medxel lil Dirasat Folklor we el-Esatîr el-Erebîye*, Dar İbn Xeldun, Beyrut, 1978. r.488.

³⁰² Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.91.

³⁰³ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexşkênî*, r.70.

³⁰⁴ Tofîq Kerîm, *h.b.* rr.141-143.

*Bo pitir pêzanînan binêre: Pîrdawid Mexmûrî, “Ferhengî Efsane Cîhanîyekan”, rr. 45-47. ; Mewlud Îbrahîm Hesên, *h.b.* r.31.

³⁰⁵ Mewlud Îbrahîm Hesên, *h.c.*

“Ava heyatê ye
 Ava heyate Li nav çîrok û
 Avek mecaze Hemî dirone
 Ne kanî ave Jiyan bibexşît
 Ne ya nehîne Waq’î nîne
 Çendan ku zor Tê efsane şîn
 Ne ew rûbare Yan ser bora
 Ne ew diyare Nîne çi avek
 Ser dev yan Ser û çavek”³⁰⁶

Wate şaîrî viyaye di vê şîrî da ronkirinekê li ser vê efsaneyê bidet û rastiya hebûna wê bo xwendevanî bidete diyarkirin ku ew jî çi rastî û hebûn bo vê avê nînin.

Şaîrî çendîn kerestên efsaneyî di nav şîrên xwe da berceste kirîne, hindêk ji wan keresteyan, mîna ew efsûnkariya heyî bikaranîne û hindêkên di mîna “ava heyatê” bi neweyî û pîrûpûç dayîne diyarkirin.

3.2.1.5. Jimareyên Efsaneyî

Jimareyên efsaneyî ew jimare ne ku cihekî girîng û taybet di nav bîrûbawerên gelan da heyîn û berdewam dihêne dubarekirin, lewra di efsaneyên gelan da ev jimare di rûdan û naveroka da rolekê baş dibînin. Mişextî di şîrên xwe da çendîn jimare bi kar anîne û girîngitirîn jimarên efsaneyî di şîrên navhatî da, bi vî rengê li xwarê ne:

Jimare Yek (1)

Jimareka kit e, ev jimare “yek ji wan jimarên e ku gelek caran di nav dabûnerîtên milî û civakî û bîrûbawerên xelkî û kitêbên asmanî da bi kar hatiye.”³⁰⁷ Lewra ev jimare dêrbasî efsaneyê bûye, bo nimûne mîna yek Xweda û yek qehreman û yek paşa. Navhatî di şîrên xwe da çendîn caran ev jimare dubare kirine û vê jimarê naveroka şîra wî zengîn kiriye. Herwesan wê jimarê cext kirine li ser wateya şîrê û di heman demî da ciwaniyek daye şîrê, herweku di van dêran da dibêjît:

“Çend hizar şêx û melan, wê kirîne har û dîn
 Ew hemû çûne fenayê, ma didil da sed birîn

³⁰⁶ Mela Xelîlê Mişextî, *Bihara Dila*, r.23.

³⁰⁷ Şivan Circîs Ebdilrehman, *Erk û Regezên Efsaneyê di Çar Romanên Devera Behdînan da*, r.154.

Wan evîn lê bû, perastin, êke îman û vîn

Bê dila xwe bixwe li navbir, wan ku noşîn jehrê tal”³⁰⁸

Nimûneka dîtir bo heman jimareyê.

“Hemî (mursil) mişext bûne

Ejî êkim wekî hemyan

Wekî zerdeşt wekî 'Îsa

Wekî Musayê umran e”³⁰⁹

Jimare Du (2)

Jimareka cot e, ev jimareye gelek caran di nav bîrûbawer û dabûnerîtên civakî da bikarhatiye. Di efsaneyan da bi van şeweyan xuya dibin; mîna “xêr û şer, ronakî û tarîkî, jiyan û mirdin... Emane hemûyan û zorî tir lem ringdanewey dû hêzî xêr û şerr in.”³¹⁰ Ev jimare di şîrên Mişextî da çendîn caran dubare bûye, ev dubarebûn cext kirine li ser girîngî û wateya vê jimare di şîrên navhatî da, bo nimûne:

“Ez giley nakem ji cara, bargiran bim yan sivik

Dar û lêdan serserê min, şakirim rojî du car”³¹¹

Nimûneka dîtir bo heman jimareyê:

“Dar û ber her ma belav û hem me du şeqe û helaş

Ne ser û ne bin diyar e, rehnimayî û rêberî”³¹²

Jimare Sê (3)

Jimareka kit e û di nav bîrûbawerên gelan da cihekî girîng û pîroz heye û “xelk hemî bi çavekî xêrê û xweşiyê berê xwe didete vê jimarê. Hêzeka sihrî di vê jimarê da heye.”³¹³ Lewra ev jimare bûye jimareka efsaneyî, mîna sê bira û sê xwîşk û sê şev û sê roj hwd. Di efsaneya kurdî da ev jimare çendîn caran dubare bûye, bo nimûne “sê car baz heldedirêt ke carî sêhem beser her keêkewe nîştewe dekirêt paşa.”³¹⁴ Navhatî çendîn

³⁰⁸ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.58.

³⁰⁹ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.225.

³¹⁰ Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexşkênî*, r.311.

³¹¹ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.391.

³¹² Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.298.

³¹³ Hecî Cehfer, *Çend Vekolîn li dor Mem û Zîna Xanî*, r.74.

³¹⁴ Tofîq Kerîm, *Karîgerîy Îslam le ser Keltûrî Kurd (efsane), bergê duyem*, r.189.

caran jimare sê (3) di şîrên xwe da bikaranîye, wate vê jimarê girîngî û pîroziya xwe li def şairî hebûye, demê dibêjît:

“Çiku kariyan dirist û bê kelem bû
Te mêr boçî dikuştin çar û sê sê
Neyar çawyan li maf û berhemim bû
Nivêj boçî te neynacê ku ferze?”³¹⁵

Herwesan di şîreka dîtîr da heman jimare bikaranîye, demê dibêjît:

“Qutibzade yê heyasiz, benî herbê çilkawxwer
Sê sîxurin, çar pasdar, sê jî kerê li garanî
Peşîman in Îranî, Xumeynî ew xapandin
Bi destê xwe gorrê xwe bi tevir û bêl helqanî”³¹⁶

Jimare Heft (7)

Jimareka kit e, vê jimarê pitir ji hemî jimarên dîtîr li def gelan girîngî û pîroziya xwe heye, heta ku di pirtûkên ayîniyên asmanî da ev jimare gelek hatîne bikaranîn.* Herwesan ev jimareye “jimareka pîroze li nik pitirîya xelkê cîhanê.”³¹⁷ Vê jimarê “nihênî taybetî xwey heye her lewkatey dunya û mirov dirust bûwe jimare hewt karî xuy kirduwew çote hemû kayekanî jiyanewe.”³¹⁸ Di efsaneyan da ev jimare gelek hatiye bikaranîn û girîngî pê hatiyedan, mîna “heft roj û heft tebeqên asmanî, heft sal hwd.” Di efsaneya kurdî da ev jimare bi şêweyekê berbelav hatiye bikaranîn. Şairî çendîn caran jimare heft (7) di şîrên xwe da dubare kiriye. Bi vê çendê girîngî û pîroziya vê jimarê li def şairî bo me diyar dibe, herweku di van şîrên li xwarê da, dema şairî dibêjît:

“Maweyê zordar nedeyn em helekê
War û yarê xwe pejan keyn demekê
Evê heft sal ez xerîbim ji melekê
Herdu destê xwe hemayîl şevêkê”³¹⁹

³¹⁵ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.262.

³¹⁶ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.264.

*Bo pitir pêzanînan binêre: Şukiriye Resul, *Nihînî Jimare Hewt le Bîr û Bawerî Gelan û Kurd da*, Zankoy Selahedîn, Hewlêr 2012.

³¹⁷ Hecî Cehfer, *Çend Vekolîn li dor Mem û Zîna Xanî*, r.77.

³¹⁸ Şukiriye Resul, *Nihînî Jimare Hewt le Bîr û Bawerî Gelan û Kurd da*, r.118.

³¹⁹ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.481.

Di şîreka dîtîr da navhatî ji bo heman jimare dibêjît:

“Lê vîn bê bax û bîstan bê mey û bade heye?
Yan li nav tarî şevareş, bê bihar û ber rûbar?!
Ew bita ku tu diperêş ey Mişextî dûrî teye
Tu li pişt heft kêwî xwelî, ew di nava kevir û dar”³²⁰

Jimare Çil (40)

Jimareka cot e, vê jimarê “peywendî digel pîroziyê heye.”³²¹ Bi jimareka efsaneyî hatiye diyarkirin, çunkî “be zîndûyî lenêw efsane da le kare, her em jimareye le efsaneyî hemû dinyaw lenêw pendu folklorîş şiwênî taybetî xuy heye.”³²² Ev jimare di çîrok û çîvanokên efsaneyî da rolekê girîng digêrît û bi şêwê “çil roj, çil kezî, çil kur, çil kiç hwd.” diyar dibe. Di efsaneya kurdî da ev jimareye mîna hemî jimarên dîtîr ên efsaneyî dihête dîtîn.* Şaîrî jimare çil (40) di şîrên xwe da bikaranîye û girîngî bi vê jimarê daye û mîfa ji vê jimarê dîtiye ji bo ciwankariya şîrê û watedarkirina naveroka wê. Herweku di evan dêrên li xwarê da demê dibêjît:

“Ey bejin busto ridînit çil geze ey serteşî
Te ji boMoskoy dîlan kir, gel me kurdan nameşî
Ne xudan ala û toxî, ne xudanê erteşî
Bextê xwe ez na xirabkem, zor dibêjî û dev beşî”³²³

Di şîreka dîtîr da şaîrî dibêjît:

“Ew çi bejna heyzeran e
Çil kezîne ser milî

Yanî qîbla 'aşqane
Yan spîndarî gelî

Ew çi dulvin çi 'enab
Dêw wekî baxî gulî

³²⁰ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.138.

³²¹ Hecî Cehfer, *Çend Vekolîn li dor Mem û Zîna Xanî*, r.81.

³²² Mewlud Îbrahîm Hesên, *Qedexeskênî*, r.314.

*Bo pitir pêzanîn binêre: Mewlud Îbrahîm Hesên, *h.c.* ; Hecî Cehfer, *h.b.*, r.358.

³²³ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.451.

Ew çi mujganin çi tîrin
Tîne armancî dilî³²⁴

Herweku aşkira ev jimareyên efsaneyî di nav dabûnerî û bîrûbawerên gelan da bi kar hatîne, şaîrî bi jimareyên pîroz zanîn û mifa ji van jimaran wergirtîne û naveroka şîrên xwe pê ciwantir kirîne, ev çende jî dizivirî bo şarezayî û zîrekiya şaîrî.

3.2.2. Destan

Mişextî di şîrên xwe da çendîn destan berceste kirîne, lê bitinê amaje dayîne navên destan û qehremanên wan û hindek caran jî xwe mîna qehremanekî wan destanan daye diyarkirin. Anku destan bi xwe nehatîne vegêran, ew jî ji ber dirêjîya qebareyên wan. Ev destane mîna wêne û hêma hatîne bi kar anîn, şaîrî ji bo pitir dewlemendkirina naveroka têkstên şîrên xwe, ev destane bi kar anîne. Herwesan navhatî dixwazît careka dî van destanan zîndî biket û bînîte bîra xwendevanan, herweku di vê şîra li xwarê da hatî û dibêjît:

“Te vêtin wek Memê Ala, bikey armanc û tîr baran
Me pê xweşe ku xelk bêjin, şehîdê zen dikêt Zîn im”³²⁵

Navhatî di vê dêrê da amajê bi kesayetiyên destaneka dildariya folkloriya kurdî didet, ew jî destana “Memê Alan” e. Ew wesan didete diyarkirin ku di eşqê da mîna Memê lê hatiye bo dilbera xwe. Sererayî mandîbûna Mişextî di eşqê da, dest ji eşqa xwe bernadet û yê berheve mîna Memê Alan xwe gorî eşq û viyana dilber û yara xwe biket. Wate şaîrî viyaye bi rêyavê destanê, radeyê eşqa xwe bo dilbera xwe bidete diyarkirin.

Yek ji destanên dîtir ku Mişextî di şîrên xwe da amaje pê dayî destana “Şîrîn û Ferhad” e, ku hindek caran bi destana “Şîrîn û Xusrew” jî dihête nasîn. Ew destaneka kevina dildariyê ye, heta niha jî ser zarê xelkî dihête gotin. Dêrbareyî xwemaliyetî û cihê rûdanê em dikarin bêjin “le rûy beserhatewe bîkeyn be kurdî, çunkî ta êsta kêwî (bêstûn) le xakî kurda mawew ew westayî û berd taşîyeş ke elên kirdarî rengînî Ferhad her mawe.”³²⁶ Vê destanê mîna çendîn destanên dî yên folklorî sinorê çendîn gelên rojhelat bezandiye û mîna du aşiqan navên xwe diyarkirîne. Li cem Mişextî ev aşiqe

³²⁴ Destnivîs.

³²⁵ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.321.

³²⁶ Îzedîn Mistefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, r.61.

bûyîne hêvênê eşqeka paqij û di nav şîrê da çendîn caran ev destane dubarekirîye. Sererayî hemî nexweşî û azarên têda, xwe mîna Ferhadê jar dibînît û penayê bo Şîrînê dibet, herweku di vê dêra li xwarê da, dibêjît:

“Keftîme çol û beyaban, her wekî Ferhadê jar
Ey Şîrînê kanê dêrman? Dêrd û jara min bese”³²⁷

Şaîrî di şîreka dîtîr da vedigerête van herdu destanan û dibêjît:

“Were ey rîşeyê cergim, te bo birdim ji bîra xwe?
Dixum sûndê bi bejna te, hizar cara te vebîr tînim
Dinê pîrekemo û binbad, dikêşim dadê wek Ferhad
Mixabin dame ber tîran, spêre canê Şîrînîm
Bi pîta agirê vînê disojim lew wekî qeqnez
Were ey bayê şevtavê, tîmarkî dîlkê xemgîn im
Cîhanê fanî û baqî, heçî hey meyxur û saqî
Şehenşahê cîhanê tem fîdayin bo Mem û Zîn im
Dlê dêrd û keser têda bi hizar defter nivîs nabin
Wuşe nîne bi hîç zarek, wuşey nazik ji kû bînim?”³²⁸

Di vê parçe şîrê da Mişextî azarên eşq û vîna xwe mîna Ferhadî daye diyarkirin. Ew wesfa barê xwe mîna yê Ferhadî diket, dilber û yara xwe jî mîna Şîrînê dihejmêrît ku ciwaniya wê kartêkirin lêkiriye da ew jî mîna Ferhadî bikevîte davên 'eşq û viyana dilbera xwe. Di temametiya vê şîrê da şaîrî amaje bi destaneka dî ya dildarî daye, ew jî destana “Mem û Zîn”e ku têda pesna vîna wan ya paqij û rasteqîn dike û şahên cîhanê qurban û gorî eşqa wan dike. Ev herdu destan hêmayên vîneka rasteqîn û paqij in, lewra şaîrî hewildaye bi rêka van kesayetiyên destanên dildarî, wate û hêzekê bidete naveroka şîra xwe ya dildarî.

Şaîrî di şîreka dîtîr da amajê bi destaneka dî didet, ew jî destana Zembîlfiroş e. Destana Zembîlfiroş yek ji destanên kurdî yên berbelav e û têkstên wî di zorbeza diyalêktên kurdî da hene. Zembîlfiroş “mirovekê kurde û navê wî yê dirust Mîr Seîd kurê Mîr Hesên Paşayê Diyarbekirê ye, serhatiya wî li sala 944 z. li serdemê Dewleta

³²⁷ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.44.

³²⁸ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* rr.463-464.

Merwanî, li bajêrê Farqînê ya li ser li wîlayeta Diyarbekirê rûdaye.”³²⁹ Ev destan ji layê naverokê ve ya pir ji babetên curbicur, mîna babetên ayînî, mêrxasî, evîndarî hwd). pêk dihêt. Serhatiya vêdestanê bi dirêjahiya sal û çerxa ji berebabekî bo yekê dîtir bi rêka zaravî hatiye veguhaztin. Ev destan mîna çendîn destanên di ji pênusê Mişextî bê behir nebûye û xemla xwe di şîrên navhatî da kiriye, demê dibêjît:

“Şev direnge û zorê tarî, ey Mişextê pîr û jar
Çend dikem xewka me nahê, her wekî Zembîlfiroş
Carî ne jiyar û omêdin, xwezîye tovê mehal
Carî jî pest û na omêdim, dil birîndarim, peroş”³³⁰

Di van herdu dêran da, şairî bi rêka amajedan bi destana Zembîlfiroşî, rewş û barê xweyê dêrûnî mîna rewş û barê dêrûniyê qehreman vê destanê diyar kiriye ku ew dikevîte di rewşeka ne aram û şepirzeyî da. Şairî ev destan kiriye hêmayek da ku dêrbirînê ji barê xwe yê jiyanê û dêrûnî biket.

Mişextî destan di şîrên xwe da bi şêweyekî berbelav bikar nehînane, bi tinê amaje bi çend destanekan kiriye, belê wî kariye guncandineka baş di navbera destan û babet û naveroka şîran da biket û şîrên xwe pê watedar biket.

3.2.3. Çîroka Folklorî

Çîroka folklorî çîrokeka xwedan armanc e, kartêkirinên wê bi şêweyekî rasterast li ser civakê diyar dibin. Mişextî jî wek take kesek ji civakî keftiye jêr karîgeriya vê çîrokê, navhatî şarezayeka baş di çîrokên folklorî da hebûye, lewra di şîrên navhatî da çendîn çîrokên folklorî dihêne dîtîn. Navbirî ji bo zengînkirina naveroka şîra xwe, mifa ji evan çîrokan wergirtiye.

Çîrokên folklorî di şîrên Mişextî da bi çend şêweyan hatîne bercestekirin. Bo nimûne navhatî di çendîn şîran da çîrokeka temam ya folklorî bi şêwazê şîrê nivîsiye, anku şîra wî hemî vegêrana çîrokeka folklorî ye bi şêwazê şîrê. Herweku di van nimûne şîrên li xwarê da, şairî dibêjît:

“Mar û sîab
Şivan çi renc dikêştî rencekê tal û dijwar

³²⁹ Wesfî Hesên Ridênî, *Beyta Zembîlfiroş*, Hewlêr 2008. r.16.

³³⁰ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.152.

Xudan 'eyale dest teng şevu roj l'aqar
Hero pezê xwedibet ji bo bask û beyara
Car lipnenalu be roj telanu ber nizara
Eger pezê wî çeriya şivan jî xweşhal dibe
Li ser kevire helanek ew dî rûnît gelek vîn
Şimşalekey dirîjî dîdete kar û lêdet
Bilûl bêjek binave awazê xuş çîket

-

Mar gotî ew zemançu çend kilkim bibînim
Dilim hîç na dirist bît hewdideyn birînim
Maçî tu çend bibînî ciwane mergit dixak
Dilt gelmin çi cara ne rast bît û ne pak”³³¹

Nimûneyeka dîtir li ser heman şêwazî bikaranîna çîroka folklorî.

“Gurg û berxe sava
Ev berxe cane her wekî hercar
Dête seravî berçem û rûbar
Gurgijî di gerît wek 'adetê xwe
Bîv û delîve bînîte destxwe
Bexik li sercoy avê di noşît
Gurgijî bibîte nexşey di kêşît
Gazkire berxê nîfd û fêlî
Av boçî ser min tekire şêlî

-

-

Berx gotê renga xuşku birat bin
Newî 'yalbu hem kor û îcaxbû
Gurg gotê ew berx her wekî xwet bu
Av şêlî kiribû dilê me sotibû”³³²

³³¹ Destnivîs.

³³² Destnivîs

Şêwazekê dîtir ê bikaranîna çîroka folklorî li dev Mişextî ew e, dema gotineka mezinan dihînît û çîroka wê bi şîweyê şîrê dinivîst. Herweku me di beşa yeke da amaje pêday, her gotineka mezinan çîrokeka xwe heye, ji bo ser bor wergirtin ji rûdanên çîrokê ev gotine dihêne vegêran û dirustkirin. Şaîrî di çendîn şîran da gotineka mezinan kiriye navûnîşan bo şîra xwe û paşan çîroka vê gotinê bi şêwazê şîrê nivîsiye. Anku mebest di vêrê da ew e ku şaîrî amaje bi çîroka folklorî daye û bi şîrî nivîsiye û ji bo ronkirina vêgotinê, mifa ji vê çîrokê wergirtiye, bo nimûne:

“Rehme li kifindizî

Rehme li kifin dizî	Rehme li kifin dizî
Ew mir, me dîtin	Gêre û dîngiz
Kurê wî rabû	Zêtir ji wî kir
Kifin wî dizî	Mirî jî dêr kir
Ji qebirî dêrîna	Ji Xudê netirse
Karek wereng kir	Bêje û nepirse
Mirî qazox kir	Kesek we naket
Lewa dinêrin	Bo babî rehmet” ³³³

Ew çîroka şaîrî di vê şîrê da bikaranîy ya berbelav e bi çîroka “Rehme li Babê Kifindizî”³³⁴ Yek ji çîrokên folkloriyên kurdî, bi çendîn şêwazan li ser zarê xelkî dihête gotin. Navhatî kariye mifayê ji vî çîrokê bînît û di heşt dêran da bi rêkûpêkî kurteya vê çîrokê bidete diyarkirin.

Şaîrî mifa ji huner û rûxsarê çîroka folklorî bi çendîn destewajeyên diyarkirî û taybet wergirtiye û veguhaztîne nava şîrê û tam û çêjeka taybet daye şîrê. Bo nimûne di şîra “Qel û Gund” da şaîrî mîna çîrokê, dest bi şîra xwe diket û dibêjît:

“Hatiye gotin li dewrî pîr û kal

Qel helistan bo xwedanin yek qeral

Kom vebûn û guftûgo kir destedest

Mîr û begzade hemî bo ew mebest”³³⁵

³³³ Mela Xelîlê Mişextî, *Bihara Dila*, rr.108-109.

³³⁴ Sadiq Ebdilxaliq Şuşî, *Serhatiyên Folklorî*, Rojhelat, Hewlêr 2010.

³³⁵ Destnivîs.

“Hatiye gotin li dewrî pîr û kala” destewajeyeka çîroka folklorî ye li demê çîrokbêj dest bi vegêrana çîrokê dike, vê destewajey li destpêka vegêrana çîrokê dibêjît, bi çendîn şeweyên dîtir jî dibêjin mîna “bab û bapîrên me digot”.

Di şîreka dîtir da Mişextî mifa ji destewajeya dûmahîkanîna çîroka folklorî wergirtiye, anku wî mîna çîrokê dûmahîk bi şîra xwe hînaye, demê dibêjît:

“Rehmet li babê guşdar
Her êku fathedane kar
Bo te Mişextî pîr û jar”³³⁶

Di vê şîrê da “rehmet li babê guşdar” destewajekê çîroka folklorî ye, bi çend şeweyên dîtir jî dihête gotin mîna “ez hatimeve û rehmet li deyiş û babên guhdaran”.

Mişextî hindek caran di şîrên xwe da bitinê amaje bi navê çîroka folklorî daye, bo nimûne di çendîn şîrên xwe da amajê didete çîroka “Xan û Man” ku çîrokeka folklorî ya berbelav e³³⁷, demê dibêjît:

“Sor spî bim Dê zor ciwan bim
Wekî perî bim Dê Xan û Man bim”³³⁸

Bîrtîjiya şairî ji encamê çirkirina babet û rûdan û bûyerên çîrokê di dêrekê yan çend dêrekanda dibête destpêk bo vegêrana sercem rûdanên çîrokê, bo nimûne:

“Me dî stemkarek bed, feqîrek da ber dara
Rast û çep kir bi pêna bin zik û ber zhara
Pên weşande tenîşt, her wî digot: ax piştîm
Behsê 'erdek dî nekir, ji wan zerb û azara
Xelk û 'alem sersorman, nabêjît: ax serê min
Yan jî zik û zharm yan dest û îbinig û para
Stemkarî jî pirsî: bo her te got ax piştîm?!
Me li pişt te nedaye, bi gopal û berd û dara
Gote wî te hind lêdam, ez bê pişt û bê yarm

³³⁶ Destnivîs.

³³⁷ Hevpeyvîn digel Cemîl Şêlazî, Pirtûkxana Bedirxaniya, Dihok, 7/11/2017, demjimêr 10-11 spêdê.

³³⁸ Mela Xelîlê Mişextî, *Bihara Dila*, r.48.

Ger min pişt pena ba da hêne te bi xara”³³⁹

Di vê şîrê da, dêrbirîn bi şêwê çîrokê û rûdanên wê bi hev ra peywendî bi yek ve hene, bi şêwê vegêranê behis li bê piştiya gelê xwedike, ku çî kes harîkariya wan naken û berdewam zulm û stemkarî lê dihêtekirin. Ji layê babetê ve, çîrokên folklorî dipir in ji babetên wekî bê piştî û zulm û sitemkariyê hwd. Lewma navhatî kariye mifayê ji van babetan werbigirît û şîra xwe pê dewlemendtir biket.

3.2.4. Stran

Stran pitir ji her cureyekê dîtir yê edebê folklorî girêdayî hest û sozên mirovî ye, lewra kartêkirina xwe heye li ser edebê nivîsî. Di şîrên Mişextî da amaje bi çendîn stranên folklorî hatiye dan; ev strane bi çend şêweyan di şîrên navhatî da berceste bûyîne. Bo nimûne şairî hindek şîrên xwe li ser şêwazê strana folklorî nivîsîne, mîna di şîra “Layê layê” da ku li ser şêwazê strana folklorî “Layê Layê” hatiye vehandin. Ev strane ya taybet e bi zarokan ve.³⁴⁰ Deyik vê cureyê stranê bo zarokên xwe dibêjin û taybet li demê nivandina wan. Çend dêrek ji şîra navhatî wesa ne:

“De layê layê korpeyê sava

Cerg û henavim nûrê du çava

De layê layê korpey delalim

Dê binive gorî ayê bir û malim

-

Az bibime gorî wan devûlêva

Rûmet sorê wek şekire sêva

Bibim bigorît çend kes û karim

Gel day û babim lane û warim

-

Ay layê layê da zû mezin bî

Cê ser bulindî û fexr û pesin bî”³⁴¹

³³⁹ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.358.

³⁴⁰ Mîzefer Mistefa Îsmail, “Curekanî Goranî le Folklorî Kurdî da”, *Asoy Folklor*, j.29, Hewlêr 2007. r.11.

³⁴¹ Destnivîs.

Ev şîrê her heman naveroka strana folklorî ya gelê kurd e, ew şîre a pire ji wesf û du'a û peyv û destewajeyên folklorî, yên mîna “de layê layê, korpeyê sava, nûrê du çava, binive delalim, Xudê hizar caran mala te avan, ez bibime gorê wan devûlêvan hwd.” Bi hevra ji karlêka dewlemenda folklorî wergirtiye şîra xwe pê vehandiye.

Di şîreka dîtîr da navhatî ji xerîbya dayika xwe vedigerîte bîrhatinên zarokîniya xwe û amajê bi heman strana folkloriya kurdî “layê layê” didet û dibêjît:

“Tu kanî ey dayîkî mîhrebanim
Ji ber dêrdê cudayît dil fixanim
Te çend melî serê min destê nazik
Bi destê nerm û yên xweş û mibarek
Li belînim tu çend şewgar renşîtî
Ku êş darbum te çend rondik verşîtî
Qewî xweş bû bi min lay layê dengit
Ser û sîmay firîşte xulk û rengit”³⁴²

Şaîrî ev şîre bi mîhrebanî û dilsoziya dayika xwe gotiye, bi rêka vê stranê navhatî viyan û dilsozî û xerîbûna xwe, bo dayika xwe diyar dike.

Navhatî şîreka dîtîr li ser şewazê heyranokê nivîsiye, ya bi navûnîşanê “evîndarî” û dibêjît:

“Law- Sondim be Musa û Zerdeşt û 'Îsa
Narî vînatê nav cergim aysa
Te dil bestîm birist û werîsa
Kurdê aslîm xawend biriyare

Kiç- Evroke lawo sond û peymanê
Subyanê vêkira çeple rêzane
Bo kurdî çejn û keyf û xindane
Me soz û peyman çastî bizimare”³⁴³

³⁴² Destnivîs.

³⁴³ Destnivîs.

Heyranok cureyekê strana folklorî ya kurdî ye ku “hestdare bi şêwazekê ciwan û bi wateyeka pir biha û peyvên resen û bi şêwêzarekê hatîye gotin, ev cure strane pitir bo layenê evîndariyê ve diçît.”³⁴⁴ Wate vegêraneke di navbera kur û kiçanda, ku têda viyan û hezjêkirina xwe boyek û du didene diyarkirin. Şaîrî mifa ji vê cure yê strana folklorî wergirtiye, belê di vê şîrê da guhertin di naveroka heyranokê da kiriye û ew ji naverokeka dildarî û evîndarî bo naverokeka siyasî vekêşandiye.

Di hindek şîran da, navhatî hindek destewajeyên strana folkloriya kurdî bi kar anîne, bo nimûne demê şaîrî dibêjît:

Ev çi kovanin, çi dêrdin

Rebeno, jaro, dilo

Te henase boçî serdin?

Rebeno, jaro, dilo

Ew çi axîne dikêşî

Te nefes kurt û siwar

Tu ji çi dêrdan dêşî?

Rebeno, jaro, dilo”³⁴⁵

Di vê şîrê da “rebeno jaro dilo” destewajekê strana folkloriya kurdi ye, ev destewaje di stranên folkloriyên kurdî da gelek bi kar dihêt, şaîrî bi rêka vê destewajeyî pitir dêrbirîn ji dêrûnê xwe kiriye.

Mîşextî di hindek şîrên xwe da amaje bi navên hindek stranên folklorî yên kurdî daye, herweku di van dêre şîrên li xwarê da dibêjît:

“Şorejin û kiç bi revde revde

Biçine giya û gul, qol û kivaran

Narînkê bêjin, bi dengê nazik

Dawud ji şerma bibîte heyran”³⁴⁶

³⁴⁴ Cotyar Îsmail Nebî, *Naveroka Heyranoka Kurdî*, r.40.

³⁴⁵ Mela Xelîl Mîşextî, *Dîwana Mîşextî (bergê yek)*, r.176.

³⁴⁶ Mela Xelîl Mîşextî, *h.b.* r.107.

“Bi şev semaye û lawje car beblekan û şênî
Nik xwe te bextiyarî wek kes û nakesê nî”³⁴⁷

“Wek du firîşe car me semakir
Lawej û periste bi dengê hezînê
Car jî me firda bo ser şikêran
Me çav digêra li asmane şînî”³⁴⁸

Her yek ji “narînkê, lawje, peste” stranên folklorî yên kurdî ne, her yek ji wan bi şêwazekî û bûnêka taybet dihêne gotin.³⁴⁹ Şaîrî mifa ji stranên folklorî wergirtiye û ji bo dewlemendkirina naveroka babetên şîrên xwe bi kar anîne. Herwesan parastina vî beşê edebê folklorî ji wînda bûnê.

3.2.5. Gotinên Mezinan

Gotinên mezinan verêja hizr û bîrên kesianên şareza ye, ev çende dibête egerekî bihêz bo bi kar anîna wan di nav şîrê da, gotinên mezinan cihekî berifreh di şîrên Mişetexî da girtiye. Navbirî kariye mifayekê baş ji vî cureyê edebê folklorî werbigirît û şîra xwe pê dewlemend biket û guncandineka baş di navbera gotinên mezinan û naveroka şîrên xwe da dirust biket. Ji ber ku zimanê van gotinan herweku me amaje pê dayî, nêzîkî zimanê xelkê ye û cure kêş û serwayek têda heye û bi kurtirîn axiftinê ve wateyeka bihêz û karîger pêşkêş diken. Ev hemî dibine eger ku peywendiyeka bihêz di navbera gotinên mezinan û şîrê da dirust bibe.

Şaîrê navbirî gotinên mezinan bi şêwazên curbicur di şîrên xwe da berceste kirîne, bi girîngî li vî cureyê edebê folklorî dinêrît, di çend şîran da pesna van gotinan dide û wan berz dinirxînît. Bo nimûne di şîra “Axiftina mezina, nexşê li bera ne” da dibêjt:

“Axiftinên xwe	Pîr darêjin
Nexşin li kevira	Wekî dibêjin
Serve diyar in	Wek durr û mercan
Nexş in û nîgar in	Wek tacê sultan
Binive hizaran	Ji dêrs û şîret

³⁴⁷ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.432.

³⁴⁸ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.115.

³⁴⁹ Hevpeyvîn digel Cemîl Şêlazi, Pirtûkxana Bedirxaniya, Dihok, 7/11/2017, demjimêr 10-11 spêdê.

Nav da hizaran	Ji pend û hîkmet
Ev pend û şîret	Çend bazvirek hat
Wek nûrekê me	Dîtin keramat” ³⁵⁰

Şaîrî her ji navûnîşanê vê şîrê dest bi gotina mezinan kiriye “axiftina mezina, nexşê li bera ne”, di naveroka şîrê da ev gotine bi nemirî li qelemdayîne, ku hilgirên wateyên kûr û berifreh in, herwesan xwedan serborên curbicur in. Ev gotina mezinan bi şêwazê curbicur dihête gotin, mîna “gotinên mezinan nexşet ser kevira ne”³⁵¹

Di şîreka dîtir da, navhatî bi sersamî û hêbetî ve, evan gotinan didanît û dibêjît:

“Mirov dê mînin ji gotina pîran
 'Ecêb û sersam ji van xebîran
 Gul û rihan û zêr jî dibarin
 Bo xelkê tînî wek ava sazin”³⁵²

Şaîrî gelek caran bi şêweyekê rasterast gotinên mezinan wergirtîne û têhilkêşî şîra xwe kirîne, bo nimûne:

“Ava zelal nehêla, me kire kor û şêlav
 Fermanrewayê gêla eve bi serê me anî
 Bivrî eger ku destik ji darê bixwe nebîtin
 Darê dê çawa birrît devê asine panî
 Dîsanê kirmê darê eger ji darê nebît
 Çi cara zewalî nîne bi sed dewr û zemanî”³⁵³

Di vê şîrê da, şaîrî du gotinên mezinan bi şêweyekê rasterast têhilkêşî şîra xwe kirîne, ew jî yek: “Eger deskê bivrî ji darê nebe zewala darê nîne”³⁵⁴, ya duyê: “Heke kirmê darê ji darê nebe, çi cara zewala darê nîne.”³⁵⁵ Mirov dikarît van gotinan ji bo çendîn mebestan bi kar bînît, yek ji wan mebestan siyasî ye, şaîrî jî ji bo heman mebestê bi kar anîne, wate eger mirov bixwe dijminê xwe nebe, çi caran tûşî şkestinan nabe.

³⁵⁰ Mela Xelîlê Mişextî, *Bihara Dîla*, r.19.

³⁵¹ Ebdulla Elî Şingalî, *Gotinên Mezinan û Îdyom li Çiyayê Şingalê*, r.148.

³⁵² Mela Xelîlê Mişextî, *h.b.* r.76.

³⁵³ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.97.

³⁵⁴ Şewket Avdel û Mes'ud Serinî. *Gulwaz, Weşanên Spîrêz*, ç.2., Hewlêr 2005. r.50

³⁵⁵ Hecî Cehfer, *Hindek Vekolîn li dor Folklorê Kurdî*, r.186.

Şaîrî viyaye bi rêka evan gotinan bêjîte gelê xwe, eger hûn yekgirtî bin hemberî dijminî, çî caran şkestin û zewal bo hewe nabe.

Herwesan di şîreka dîtir da her bi şêwê rasterast gotineka mezinan werdigirî û têhilkêşî şîra xwe dike, mîna di vê dêra li xwarê da dibêjît:

“Karê spêdî nehêle êvar
Riswî dimînî hejar û ew gar”³⁵⁶

Naverok û babetê vê gotinê “Karê îro, nehêle sibê”³⁵⁷ girêdayî karî ye, ku têda girîngî û pîroziya karî û demî bo me diyar dibe, Wesan dihête diyarkirin ku divêt her karek li demê xwe yê diyarkirî da bihête encamdan. Anku nabe karê evro bihête paşxistin bo sibehî yan bo demekê dîtir. Lewra ev gotine pêgîrbûn û rêkxistinekê di jiyana mirovî da dirust dike.

Şaîrî hindek caran pêş û paşî xistiye gotineka mezinan û di şîra xwe da berceste kiriye, bo nimûne:

“Deha bîrsî û zîkek tîr bûbin
Belê nav cengî wek şêr bûyîn
Ribadê kop û eşkêr bûyîn
Bi ta mezro, bi nexrînî”³⁵⁸

Her çend ev gotine bi şêweyekê rasterast hatiye bikaranîn, lê pêş û paşîxistin têda hatiye kirin, da ku ciwankariyeka zimanî bidete tîkstê şîra xwe, bêtî ku kartêkirinê li wateya vê gotinê biket, ya dirust bi vî şêweye “Zîkek tîr û deha bîrsî”³⁵⁹ ji bo jîneka nexweş dihête gotin.

Şaîrî hindek caran amaje bi gotinên mezinan daye, anku bi şêweyekê rasterast gotin bikar neanîye. Di dêrekê yan jî nîvedêrekê da amajê didete gotineka mezinan yan jî naveroka şîra wî amaje bo gotinekê yan çend gotinên mezinan dide, bo nimûne demê dibêjît:

“Qebîrek e evro daxwaze bo min

³⁵⁶ Destnivîs.

³⁵⁷ Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl. *Ji Zargotina Kurda-Gotinê Mezina*, r.89.

³⁵⁸ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.387.

³⁵⁹ Wehbiya Mihemed Seîd Yasîn, *Gotinê Pêşîya li Devera Badînan*, Hawar, Dihok 2006. r.116

Nav zikê axa wilatekey min

Ne qesrekê li cê biyanî
Bila cê xum bikem şivanî”³⁶⁰

Şaîrî di vê parçe şîrê da amaje daye çend gotinên mezinan, anku şîra wî amaje ye bo van gotinan “Mala min konê gur e, li hemû ciha xweştir e”³⁶¹, yan “Şam şekir e welat şirîntir e”³⁶². Şaîrî tam kiriye jiyana dêrbedêriyê û mişextiyê, lewra her dem xerîbiya welatê xwe kiriye û welatê xwe ji welatên biyanî pêroztir û xweştir û ciwantir zaniye. Herwesan di şîreka dîtir da dibêjît:

“Reşo rabe bi destê xwe kerê
Kerê te kefte li mê da
Ji bo te kes dêrî naket”³⁶³

Ev parçe şîre amaje ye bo gotina mezinan “Reşo bi destên xwe eger av dê te bet”³⁶⁴. Ev gotin cextê li ser ewê çendê dike, ku divêt mirov di erk û karên xwe da pişt bestinê li ser zatê xwe biket, anku divêt mirov karê xwe nehêlîte bi hêviya xelkî ve, çunkî kes mîna mirovî bixwe, karê xwe bi dirustî naket, li hêviya xelkî karên mirovî bi rê ve naçin.

Taybetmendiyeke dîtir ya şîrên Mişextî ew e ku ji bilî bikaranîn û bercestekirina gotinên mezinan di şîrê da, ew şêweyekî rasterast ev gotin kirîne navûnîşan bo şîrên xwe û paşan di naveroka têkstên van şîran da şîrovekirina van gotinan kiriye, Wate naveroka têkstên her şîrekê ji wan, li ser babetê wê gotinê ye, ya ku bûye navûnîşan bo wê şîrê, bi vî rengî li xwarê.

“Dikenît zikê têr, nakenît ser bi zêr
Divêt bizanî Pîrêr hunerdar
Bo çîye gotin Ev pend û goftar
Ser zêrî xemgîr Dilteng û bêmar
Ew nakenîtin Bi zêr û dînar
Zik têr û bê xem Qanih û saxlem

³⁶⁰ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.142.

³⁶¹ Hevpeyvîn digel Rêkêş Amêdî, Qutabxana Perleman, Dihok, 3/1/2018, demjimêr 9-10 spêdî.

³⁶² Mela Mehmudê Dêrşewî, *Mîstaxa Çiya ji Gotinên Pêşiya*, Weşanên Zankoy Selahedîn, ç.2., Hewlêr 2000. r.234.

³⁶³ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.* r.91.

³⁶⁴ Hecî Cehfer, *Gotinên Mezinan li Devera Behdînan*, Ela el-Wezîriyye, 1986. r. 56.

Ew dê kenîtin Her gav û her dem
Serê wî kêle Wek nêre şîr e”³⁶⁵

Gotina mezinan a bûye navûnîşanê şîrê “Dikenît zikê têr, nakenît ser bi zêr”³⁶⁶ e. Çendîn şêweyên dîtir jî dihîte gotin.

Şêwazekê dîtir yê bikaranîna gotinên mezinan di şîrên Mişextî da, di şîra “gulçînek ji gotinên mezinan” e. Her ji navûnîşanê diyar e ku şîr ji gotinên mezinan hatiye dirustkirin û bi temamî ji 70 dêran pêkdihêt. Ango madde û kerestê vê şîrê, ji gotinên mezinan û hindek zêdehiyên biçûk ên mîna hînanana hindek peyvên pêdivî pêk dihêt da ku digel kêş û rîtim û serwaya şîrê biguncît, merem ji vê şîrê ew e ku nîfş û berebabên nû haydarî gotinên mezinan bibin û ew gotin bi asanî bihêne jiberkirin.

Ji layê bikaranînê ve gelek caran di vê şîrê da gotinên mezinan bi şêweyekê rasterast bi kar tîne û gotin mîna xwe bê zêdehî hatine bikaranîn, li hindek cihan jî bi şêweyekê ne rasterast gotin hatine bikaranîn. Dîsan eger em di vê şîrê da mîna dêrên şîrê wergirîn, hindek caran li nîve dêra yekê gotin bi kar anîye û di nîve dêra duyê da bi heza xwe zêdehî li ser kiriye, bo nimûne:

“Destê tinê bît çî deng nîne
li kar û şûl û çeple rêzan”³⁶⁷

Ev gotina di dêra şîra serî da hatî, bi vê şêweyî jî dihîte gotin “destê tinê deng jê nayê”³⁶⁸

Di yek dêrê da, yek gotina mezinan bi kar anîye bo nimûne.

“Mêvan ji mêvan dil teng û têr
Malxwê malê ji her du mêvan”³⁶⁹

Bi vî şêweyî jî ev gotine, li dev xelkî ya berbelav e “mêvan ji mêhvan nexuşe, mazûban ji her duyan”³⁷⁰

³⁶⁵ Mela Xelîlê Mişextî, *Bihara Dîla*, r.95.

³⁶⁶ Wehbiya Mihemed Se'îd Yasîn, *Gotinê Pêşîya li Devera Badînan*, r.34.

³⁶⁷ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.339.

³⁶⁸ Mela Mehmudê Dêrşewî, *Mîstaxa Çiya ji Gotinên Pêşîya*, r.135.

³⁶⁹ Mela Xelîl Mişextî, *h.c.*

³⁷⁰ Çiya Mazî, *Ferhenga Gotinên Pêşîyan*, r.514.

Di yek dêrda du gotinên mezinan bi kar anîne, bo nimûne.

“Her destê mandî ser zikê têr e
Tembel û razan xalîyê himban”³⁷¹

Ew gotina di nîve dêra yekê da hatî, bi vî şêweyî jî dihête gotin “Destê mandû Leser zikê têr e”³⁷². Di nîve dêra duyê da ew gotina mezinan “Tembel û razan xalîyê himban”³⁷³ bi kar anîye, ewa li ser zarê xelkî dihête gotin.

Yek gotina mezinan bi şêwê amajê di yek dêr da berhev kiriye, bo nimûne.

“Leşê te xuriya kes wekî desta
Nizanît cêge û herêmê xuriyan”³⁷⁴

Ev gotina di dêra serî da hatî, mîna hemî gotinên mezinan bi çendîn şêwên dîtir, dihête gotin mîna “dest dizanît kîrê dixuriyê”³⁷⁵

Ev teknîke bi şarezayî şairî bi kar anîye, da ku hemî beşên şîrê bi şêweyekî ciwan û rêkûpêk digel yek biguncin û şîr, rîtim û kêşa xwe ji dest nedet, ev çende jî dibête eger ku wergir pitir tam û çêjê ji vê teknîkê wergirît.

Belê bi şêweyekî giştî, li seranserî avahiyê şîrê, gotin li ser herdu nîve dêrên şîrê hatiye parvekirin, ku zêdehî li dûv pêwîstiya şîrê hatiyekirin, da ku têkstê şîrê girêdan û cure guncandinek digel yek hebe. Ev teknîka, navhatî bi şêweyekî rehwan bi kar anîye û kariye bi serkeftiyane seredêriyê digel şîrê biket.

Piştî me geştek di nav şîrên Mişextî da kirî, bo me diyar bû ku gotinên mezinan meyardaneka berfireh ji têksta şîrî û dahênanên wî vegirtiye, Herwesan ta radeyekê baş rolê xwe dileyîze ji bo bihêzkirin û dewlemendkirina bîra şairî û asankarî bo mebestan kiriye, wî ta radeyeke baş gotinên mezinan bi babetên curbicur di nav şîrên xwe da bi şêweyê rasterast û nerasterast, bi hişyarî û şarezayî bi kar anîne.

³⁷¹ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.338.

³⁷² Şêrko Ehmed Hewêz, “Gulbijêrêk le pendî pêşinanî nawçey Şengal” *Asoy Folklor*, j.33, Hewlêr 2008. r.90

³⁷³ Hevpeyvîn digel Rêkêş Amêdî, h.h.

³⁷⁴ Mela Xelîl Mişextî, h.c.

³⁷⁵ Nizar Mihemed Se’îd, *Çend Gotin û Pejnenê Kurdan ji Devera Badînan*, Weşanên Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok 2011. r.73.

Mişextî di piraniya şîrên pirtûkeka xwe ya bi navê “Bihara Dila” da gotinên mezinan kirîne navûnîşan û bi şarezayî û hostayî ev gotine bi şîrî şîrove kirîne da ku xwendevan bi wan gotinan bi sanahîtir ji ber biket û têbigehin, herwesan ew bûye rêkek ji bo parastina wî beşê edebê folklorî.

3.2.6. Biwêj

Biwêj şeweyeki dêrbirîna zimani ye. Ev çende dibîte xaleka bihêz ku di nav edebiyatan da, reng vedet û bi taybetî di nav şîrê da. Biwêj mîna beşeki edebê folklorî di şîrên Mişextî da bi şeweyeki berbelav hatîne bikaranîn, navbirî gelek mifa ji biwêjê wergirtiye hem ji layê rûxsarê ve, ku ciwanîyek daye şîrê û hem jî ji layê naverokê ve ku hêzek daye babetên têkstên şîrên wî û ew watedar kirîne.

Şaîrî biwêj bi pêkhatên curbicur di şîrên xwe da berceste kirîne, dê hewildeyn çendekan ji wan biwêjên ku ji yek peyvê pêk dihên û şaîrî di nav şîrê da berceste kirîne, diyar û şîrove biken, mîna di vê şîra li xwarê da dêrbas dibe, demê şaîrî dibêjît:

“Ew çi axîne di kêşî
Tenefis kurt û siwar
Tu ji çi dêrdan diêşî?
Rebeno, jaro, dilo”³⁷⁶

Biwêja “êş”³⁷⁷ ji peyveka sade pêk hatiye, ev biwêje dêrbirîne ji wê çendê dike, demê nexweşiyek yan dêrd û belayek bi serê mirovî dihêt, ku li wî demî mirov hest bi êşanê dike. Şaîrî ji bo heman mebest ev biwêje di vê şîrê da berceste kiriye.

Her li dor bikaranîna biwêjên yek peyv, şaîrî çendîn şîrên dîtir pê xemilandîne, mîna di evan dêrên li xwarê da.

“Babê bêwe û sêviyan bûm, hem bira bo keftiyan
Her kesê bar lê xwar barast dikir bo wî me bar
Lê felek pîlan dirust kir, ez nivistî wtari şev
Hindek min di ser dêrînan mişke kor û koremar”³⁷⁸

³⁷⁶ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.176.

³⁷⁷ Hevpeyvîn digel Xalid Salih, Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok, 6/2/2018, demjimêr 5-6 êvarî.

³⁷⁸ Mela Xelîl Mişextî, *h.b.*, rr.231-232.

Peyva “felek”³⁷⁹ biwêj e ku ji peyveka sade pêk hatiye, dêrbirînê ji pîlangêrî û xiyanetkîrî û ne gehîştina bi armancan û bêhêvî bûn û xirabbûn û têkdana rewşa jiyanê dike. Şaîrî ev îdyome ji bo heman mebestê di vê şîrê da bercestekiriye.

Mîşextî ji bilî bikaranîna biwêjên ku ji yek peyvê pêk dihên, biwêjên lêkdayî jî bi kar anîne, ku ji du peyvan pêk dihên, herweku di vê parçe şîra xwarê da, dema ku dibêjît:

“Wey li halê renceroî
Min nedît mîhrek li wêrê

Keftiye destê şinoyî
Xwelê pêwer, ey penaber

Ey Mîşextîyê xwelîpêwer
Dilreş e, ey qêr bixwe ye

Xu Şino nîne, Şinoye
Bext wekî sator û kêrê”³⁸⁰

Biwêj di vê şîrê da “xwelîpêwer”³⁸¹ e. Ev biwêje li wî demî dihête gotin, demê kesek tiştêkî ji dest bidet, yan demê dilkevtiye di rewşeka xirab da yan jî arîşeyek û belayek bi serê wî bihêt. Şaîrî di vê şîrê da behsê rewşa xwe ya penaberiye li bajêrê Şinoyê dike, ku rewşeka xirab û nebaş bûye, navhatî bi rêkavê biwêjê hewil daye pitir dêrbirînê ji rewşa xwe ya xirab û nebaş biket û bidete diyarkirin.

Her di astê pêkhateya îdyomên lêkdayî da şaîrî di şîreka dîtir da dibêjît:

“Pate xwer jî na xilas bin nav hemî qewm welat
Çopê bo wan her dikêşin rojê tengav û nehat
Miletê xo dê firoşin, bes bixwen sifre û simat
Pate xwerî xwe xweşe cem wan, dîn û xêre û şev berat”³⁸²

Biwêjê “patexur”³⁸³ wateya rezîl û dinyanedîtî û qels digehînît, ev biwêje bo wî kesî dihête gotin, yê ku taybetmendiyên me amaje pêdayîn li def wî hebin, şaîrî di vê şîrê da

³⁷⁹ Hevpeyvîn digel Xalid Salih, h.h.

³⁸⁰ Mela Xelîl Mîşextî, *Dîwana Mîşextî (bergê yek)*, r.176.

³⁸¹ Xalid Salih, *Gulolik Helçînîn*, Weşanên Dezgay Spîrêz, Dihok 2007. r.226.

³⁸² Mela Xelîl Mîşextî, h.b., rr.452-453.

³⁸³ Nizar Mihemed Seîd, *Çend Gotin û Pejnen Kurdan ji Devera Badînan*, r.37.

bi rêka vê biwêjê rexne li wan kesan digirît yê ku li dûv rêbaza gelê xwe naçin û xizmeta dijminê dikan.

Navhatî çendîn biwêjên dîtir her di heman astê pêkhateyê ve di şîrên xwe da berceste kirîne, herweku di evan dêrên li xwarê da diyar e, ew dibêjît:

“Bibine wek hebletiraşan, her li ber samanê te
Wan gilîz bi layek dev da tête xarê wek şurk”³⁸⁴

Biwêja “hebletiraş”³⁸⁵ bi şêweyekî berbelav di navcivakê kurdî da û bi taybet li devera Behdînan dihête gotin. Ev biwêje bo wan kesên xwe gél yan gemje û nezan û şepilî dikan, dihête gotin. Navhatî di vê şîrê da wesana diyar kiriye ku dijminên gelî wî bo saman û serwetê welatî mîna hebletiraşan lêhatîne.

Mişextî şarezayeka baş di biwêjan da hebû, herweku berî niha me biwêj di astê peyvê da di nav çendîn şîrên navhatî da dayne diyarkirin, niha jî dê hewil biden çendîn biwêjan di astê ristêda, di navşîrên navhatî da berçav bikeyn, bo nimûne demê dibêjît:

“Ne ew asmane em bin da, ne ew ware, ne ew geşte
Ne ew lana plingane, ne ew deşte, ne ew 'erde
Neme keyfe û nexweşîne, wekî noka li berî dayî
Çep û rast jêk ve bijiyane, neme kare û ne destkirde”³⁸⁶

Biwêjê “Noka li berî day”³⁸⁷ Ev îdyome bi vî şêweyî jî “noka vi berî ketî”³⁸⁸ jî dihête gotin û dêrbirînê ji bijyan û jêk veqetiyên û belavbûnê dike. Şaîrî bi rêka vê biwêjê behsê rewşa gelê xwe dike, ku gelê wî dêrbedêr û mişext bûye, ku her hindek berev welatekî û deverekê çûyîne, navhatî di şîreka dîtir da her di heman astê da biwêjeka dîtir li cihekê guncayî bikar anîye, dema ku dibêjît:

“Çi dêre kavi, eve çi tişte
Wek nanê sêlê yê per û pişte
Zi raviya zanîn kesek ne zanî

³⁸⁴ Mela Xelîl Mişextî, *Dîwana Mişextî (bergê yek)*, r.477.

³⁸⁵ Xalid Salih, *Gulolik Helçînîn*, h.b., r.563.

³⁸⁶ Mela Xelîl Mişextî, h.b. r.119.

³⁸⁷ Xalid Salih, *Gulolik Helçînîn*, h.b., r.225.

³⁸⁸ Xalid Salih, h.b., r.552.

Çûn û nivistin bi dêrd û janî”³⁸⁹

Îdyomê di vê parçe şîra li serî da “nanê sêlê bê per û pişt e” bi şêwê “Nanê sêlê ye, ne ber e ne pişt e”³⁹⁰ jî dihête gotin. Wateya durûyê digehînît, bo wî kesî dihête gotin ku bo mirovî car heval û dost e û car jî neyar û dijimin e. Şaîrî ev biwêje bo heman mebest di şîra xwe da berceste kiriye.

Piranî di şîrên Mişextî da, îdyomên girêdayî endamên laşê mirovî û bi taybetî jî yên girêday “dilî” hatîne bikaranîn, ku ev biwêj dêrbirîne ji hest û barê dêrûniya şaîrî diken. Di vêrê da dê çend nimûnekan li ser bikaranîna biwêjên girêdayî peyva delîve di şîrên navbirî da deyîne diyarkirin, bi vî rengî li xwarê.

“Kurdê jar û dil şikestî
